PEYAMA
kurd

Hejmar 41 | 17.06.2005

Kurdish weekly newspaper



# Serokê Kurdistanê: MESÛD MISTEFA BARZANÎ

Rûpel 4

**Parêzerên Baroya Diyarbekirê dixwazin derkevin pêşberî Saddam** Rûpel 3

**Li Omerya namûsek 15 salî hat pakkirin!** Rûpel 3

İsmail Beşikçi
**Bîreweriya Iraqa Federal - Demokratîk û Parlamentoya Kurd** Rûpel 6

**Hilbijartina Serokkomarê Îranê û hêviyên ku tên kirin** Rûpel 7

**Kurdên Sûriyê doza mafên xwe li ba Rêxistina Neteweyên Yekbûyî (UNO) parastin** Rûpel 8

**Mistefa Hicrî: Vîcnayişî serek komriyê îran boykot bikeni** Rûpel 15

**Peşmergê Barzanî bi serekî kurdistana** Rûpel 16

# GAV BI GAV BER BI KURDISTANA SERBIXWE

Rûpel 4



D 1.50 EUR, A 1.70 EUR, B 1.70 EUR, NL 1.70 EUR, CH 2.60 SFR
LUX 1.70 EUR, I 1.70 EUR, S 19.00 SKR, DK 14.00 DKR,
N 16.00 NOK, GB 1.10 £, GR 1,70 EUR

4 196577 401503 41

## Ji Edîtor

*Xwendevanên hêja,*

*Nêzîkî du meh û nîvan min li navenda Peyama Kurd karê edîtoriyê bi awayekî nefermî bi cîh ani. Ji vê hejmarê û şûnde êdî ezê karê edîtoriyê bi awayekî fermî hilgirim ser milên xwe.*

*Mercên ku ez di serîde difikirim (ev ji bo rojnameyekê pêdiviyên bingehîn in) hê jî sedî nod bi cîh nehatine.*

*Mixabin ji xeynî serîdanîna li hemberî mercan û pêve tu rê liber min tûne ye. Heya ku ji destê min bê ezê liberxwe bidim.*

*Weki ku hûn dibînin di çend hejmarên dawi yên Peyama Kurd de gelek guhertin hatin çêkirin. Di vê hejmarê de ligel hinek guhertinên din, me logoya rojnamê jî guhert. Hêvî dikim ev guhertin jî aliyê we ve bê ecibandin.*

*Heke îmkanên rojnamê yên aborî dest bide me emê guhertinên din jî bikin.*

*

*Li gorî min ji rewşa ku Kurd têde ne, ji herkesî bêtir Kurd bixwe berpirsiyar in. Min carek din ev rastiya Kurdan di dezgeha Peyama Kurd de dît. Ez hêvî dikim em bi hev re van kêmasiyan li pey xwe bihêlin.*

*Heke em bisernekevin wê ev jî kêmasiya me be.*

*

*Yek ji mezintirin astengiyên li hemberî me ji, frotina rojnamê ye.*

*Hejmara piştî vê emê li ser vê mijarê bisekinin.*

*Heya hejmarek din bimînin di xweşiyê de.*

*Ahmet Zeki Okçuoglu*



# Liser nefsê xwe nexin hepsê

**Gülsüm Işik**

Hat ragihandin ku heta niha nêzîkî 40 raporên korbûnê gihane ber destê Dezgeha Derman a Amerîkayê (FDA). Ev rapor di derbarê mirovên ku dermanê qiwetê „VIAGRA" bikaranîne, dene. Li gor van raporan, heta niha li dora 40 kesî jiber bikaranîna Vîagrayê li beramberî korbûnê ne. Ji ber vê sedemê, rayedar bi karsaziya Pfîzerê re ketine nîqaşê. Şîrketa Pfîzer liser kartona hebên Vîagrayê hinek balkişandiye ser "serêşê, gêjbûnê, zikêşiyê" lê behsa korbûnê nekiriye. Jiber vê, berdevkê şîrketa Pfîzerê Danîel Watts dibêje „ em niha bi FDAyê re nîqaşê dikin ku em dixwazin liser kartona hebên Vîagrayê balê bikşînin ser tehlûka korbûnê jî".

Vîagra di sala 1998an de wek hebên qiwetê (yên mêraniyê) derket piyasa bazirganiyê û sala çûyî bi 1,68 milyar dolarî hat firotin. Berê jî hinek gazind jiber tehlûka korbûnê hatibûn kirin lê tu delîlek derneketibû holê. Ji aliyê din berdevkê şîrketa Pfîzerê dibêje „tu delîlek ku van raporan bi hebên Vîagra ve girêde tuneye". Li gor şîrketê, Vîagra, heta niha li dinyayê di nava heft salan de ji aliyê 23 milyon zilaman ve hatiye bikaranîn. FDA ev rapor liberçav girtine, lê berdevka FDAyê Susan Cruzan dibêje „me ev rapor liberçav girtine, lê me nikarîbû em girêdanekê di navbera korbûnê û Vîagra de piştrast bikin".

Ji aliyê din hat ragihandin ku çar raporên korbûnê jiber hebên „CÎALÎS" û raporek jî jiber hebên „LEVÎTRA"yê gihane ber destê FDA yê.

Eman eman lixwe haydar bin, hûn kor nebin!

# Neh halên evînê

**Li gorî zanyarên Brîtanî evîn ne bi cûrekî ye.**



Li gel ku hunermend, wêjekar û filozof bi sedsalan hewl dan ku gîzema (sira, nepenî) evînê îzah bikin jî lê qet mirov pê têr nebû. Zanyarên Brîtanî îdia dikin ku bersîva vêya dîtin. Li gora zanyarên Zaningeha Nottingham û London College ku bi 60 malbatê re hevdîtin kirîn, li gorî dem, çand û şêweya jiyanê 9 halên evînê hene.

Psîkolog Simon Watts radigihîne ku di pêvajoya dîrokê de herkes li wateya evîna ku bawerdikirin ku xwedî yek maneye, geriyan û dibêje ku evîn jibo herkesî xwedî maneyek taybet e. Pisporên ku îdia dikin evîn hêvî ye, neh halên evînê wiha bi rêz dikin:

**Evîna Kemilî:** Liser bingeha bawerî û piştgiriya berambere.

Evîna Erosê: Şêweya evîna Romeo û Juliet. Bi dîtinekê dilê jin û mêran dikeve hevdû.

**Evîna Hedonîstîk:** Liser bingeha zewq û şahiyên ferdî hatiye ava kirin.

**Evîna Mîtolojîk:** Jin û mêr jibo ku bigihêjin hev dikevin nav berxwedanek mezin. Jibo berdewamiya vê evînê jî her ewqas hewldanek mezin pêdivê. Wek di mîtolojiya Yewnanî de evîna Helen a ji Trûva û Parîs ku bû sedemê şer.

**Evîna Civakî:** Piştî evînek bi îhtiras li gora hêviyên civatê şiklê xwe diguherîne.

**Evîna Maceraperest:** Evîna wek pêlên bahrê, geh li jêr dixe geh li jor.

**Evîna Ewle:** Jin û mêr dibin çêtirîn hevalên hevdû û bi hevre xwe di ewlekariyê de his dikin.

**Evîna Hevbeş:** Evîna ku teref şexsiyetên xwe winda dikin û kesayetiyek hevbeş lidardixin. Bi gotinek din hevokên hevdû temam dikin.



# Zewaca nebextewar dilê jinan nexweş dike

Lêkolînek ku li ser jinên navser hat kirin eşkere kir ku rîska nexweşiya dil li gel jinên ku zewaca nebextewar kirine bilind e. Li gorî lêkolîna ku ji aliyê Zaningeha Eyaleta San Diego û Zanîngeha Pittsburg ve bi hevbeşî û berfirehî hatiye kirin, li gel ku zewac tesîrek erênî li ser mêran dike, stresa ku ji ber zewaca nebextewar li jinan pêde dibe rê li ber sendroma metabolîk vedike û ev sendrom jî dil dixe telûkê. Lêkolîna ku bi 400 jinên ku temenê wan di navbera 42 û 50 de çêbûye, diyar dike ku ev rewşa neyênî bêtir jî bandorê li ser jinên ku bi mêrê xwe re dev ji hevdû berdane dike.

Xwedî Rojnamê: Peyam Kurd Verlag | Editor: Ahmet Zeki Okçuoglu | Cihê Editor: Nizar Câf | Navnîşan: Peyama Kurd, Thomas-Mann-Str. 22, 53111 Bonn / Almanya | Fax: +49 (0228) 18 00 634, +49 (0228) 18 00 635 | Peyv: +49 (0228) 18 00 656 | www.peyama-kurd.com | info@peyama-kurd.com | Weşanê Peyama Kurd ji sala 1998an ve bi awayekî serbixwe û bêalî li ser jiyana kurdî û cîhanê radiweste. Em ji aliyê rêxistinan û raştiyekê de di serastkirina weşanên xwe de azad in. Berpirsên ku ji bo Peyama Kurdê tên xwestin heke li cîyekî din hatibin weşandin, naven çapkirin.

# Serokê Dadgeha Bilind ya Tirkiyê: Eren Keskin heqeret heq kiriye




**PK** - Dadgeha Bilind ya Tirkiyê (Dadgeha Temyîzê) cezayê nivîskarê rojnameya Hürriyetê û midûrê nûçeyên televîzyona Kanal D Fatih Altayli testîq kir. Fatih Altayli di bernameyek xwe ya di televîzyonê de, jiber axaftinekê heqaret li Cîgirê Serokê Giştî yê Komela Mafê Mirovan (KMM) Eren Keskin kiribû û ji aliyê mehkemê ve bi 500 milyon lîreyê Tirk ceza xwaribû. Ji pênc endamên Dadgeha Bilind sê kesan dengên xwe jibo pejirandina cezayê bikaranîn, lê serokê dadgehê Ülkü Aydin û Mehmet Uyumaz bi îtiraza ku, „Di bernameyê de rexne li dozdar hatiye kirin. Her çiqas rexne giran be jî dozdar divê tehemûl bike. Ji ber ku qisûra mezin ya dozdar bûye sedemê vê axaftinê. Weşan ne li dijî hiqûqê ye." li dij derketin.

Eren Keskin li Almanya di civînek bi mijara "Li himber jinan şideta cinsî" de axaftinek kiribû û bi zanîn û tecrubeyên xwe yên salan gotibû ku eskerên Tirk li Kurdistanê tecawizî jinên Kurd dikin û zorê li wan dikin. Jiber vê yekê rojnamevan Altayli wek "Mehmetçîk" di bernameya xwe de gotibû ku, "Li cihê ku ez Eren Keskin bibînim, ger taciz nekim, namerd im."

Doza ku parêzger Eren Keskin di meha Adara sala 2004an de li navçeya bajarê Istanbûlê, Şîşli, di Dadgeha 4. ya Cezaya Giran de vekiribû bi mehkûmiyeta tazmînatek 500 milyonî bi dawî hatibû.

# AKP ji gotina "mafên mirovên Kurd" aciz e




Şandeya Ingilîz, çû serdana Serokê AKP yê bajarê Amedê Abdurrahman Kurt û li ser ziyana ku ji ber Tekoşîna li dijî Terorê çêbûye gotûbêj kirin. Di dema hevdîtinê de, endamên Komîsyona Mafên Mirovan ya Perlamana Tirkiyê Cavit Torun û Ihsan Arslan jî hatin. Van herdû mirovên ku qaşo endamê Komîsyona Mafên Mirovan e, hêrsa xwe bi ser şandeya Ingilîz de rijandin. Endamê Komîsyona Mafên Mirovan û parlamenterê AKPê Ihsan Arslan berê xwe da şandeya Ingilîz û wiha axivî "tekoşîna mafên mirovan gerdûnî ye û sînorên wê tune ne. Ma gelo mafên mirovên Kurd û mafên mirovên Ereb cuda ne?. Mafên mirovan hevpar in. Hûn bi tenê tên li Amedê çend kesan dibînin û diçin, ev adeta we şaş e". Li gora Cavît Torun jî, pêwîst bû şandeya Ingilîz serdana "Komeleya Malbatên Şehîdên Tirk" jî bikira. Torun di berdewamiya axaftina xwe de pirsgirêka xanimên ku serê xwe girê didin jî anî bîra şandeyê.

# Li Omerya namûsek 15 salî hat pakkirin!

Me navê Remziye Sevdan (15) berî salekê di çapemeniyê de jiber doza ku weke "doza şermezariyê" dihat bi navkirin bihîst. Remziye di temenekî ne kamil de ji aliyê 16 kesan ve hatiye tecawiz kirin. Li gora hinek çavkaniyan Remziye Sevdan bi dil û daxwaza xwe têkilî li gel wan mirovan daniye.

Lê bi çi awahî dibe bela bibe, ji bo armanceke cinsî bikaranîna bedena keçeke 15 salî, tecawiz e.

28 tometbarên ku jiber vê tawanê dihatin mehkeme kirin, yek bi yek hatin berdan. Roja 12ê Hezîranê hinekan cenazeyê Remziye Sevdan bi mirîtî gihandin Nexweşxaneya Mêrdînê. Xwedêgiravî ew bi nexweşiya "zatorê" miriye. Bêyî ku lêkolîn werin kirin û raporên otopsiyê werin çêkirin, ew hat binaxkirin.

Li welatekî weke Tirkiyê, tu Kurd bî, jin bî û bi ser de jî hatibî tecawiz kirin, yasa û zagon jî parastina te nakin. Jixwe sedemeke zêdebûna cînayetên namûsê jî, sistiya zagona ye. Ger tu "mêr" bî



**Hêvîdar Zana**

tu dikarî rojê tecawizî 10 keçikên 10 salî bikî û qet xeman jî nexwî, wê di aliyê zagonî de ilehî çareyekê ji bo berdana te bibînin.

Lê Xwedê neke tu jin bî.

Wê demê felata ji zagonan jî ji bo te nabe xelasî. Jixwe di pirsgirêkên wiha de kesek guh nade zagonên fermî. Wê te têxin nava diranên çerxa civakeke zingargirtî û bicûn. Ne temenê te yê biçûk û ne jî bêtawaniya te dikarin te bifilitînin.

Benekî ku tu bikaribî destê xwe bavêjiyê namîne. Ne ol, ne zagon, ne bext û ne jî wîjdan...

Berî herkesî ew dayika ku te şîrê wê mêtiye dibe dijminê te û lingên xwe li kursiya dardakirina te dixe. Yan jî tu yê weke Remziye Sevdan bi "zatorê" bimrî û raporên otopsiya te jî nayên derxistin. Ma wê jibo çi mesrefê li te bikin, jixwe te mirin ji zû de heq kiriye! Li welatekî mestîmezin, du mirov bi tenê jî li pey tabûta te nameşin. Cihê wê bedena te ya "bi gemar" di nava miriyên civakê de jî tune ye.

Wê çend karmendên şaredariyê, li quncikeke nenas koncalekê bikolin û cendekê te bavêjin wir. Lê ne xem e, wê "mêrên" malbata te êdî bi "serbilindî" derkevin nava civatê.

Ya girîng ew e! Bê lome be.

# Parêzerên Baroya Amedê, dixwazin derkevin pêşberî Saddam

## Li beramberî 1400 parêzerên Ereb bi dehan parêzerên Kurd jibo beşdabûna mehkema Saddam Hisên serî li Sendîkaya Parêzerên Kurdistanê xistin

Bi dehan parêzerên Kurd yên girêdayî baroyên Mêrdîn, Şirnex, Batman, Wan û deverên din, bi pêşengiya Baroya Amedê daxwaznameya beşdarbûna mehkemeya Seddam Hisên pêşkêşî Sendîqaya Parêzerên Kurdistanê kirin.

Li beramberî 1400 parêzerên Ereb yên ku jibo parastina Seddam Hisên serî li dadgehê dane, parêzerên Kurd jî ketin nava hewldana destekkirina parastina mafên Kurdan. Bi dehan parêzerên Kurd yên ji Bakurê Kurdistanê, wê bi armanca destekkirina hevkarên xwe yên Kurd, berê xwe bidin Başûrê Kurdistanê. Baroya Amedê, serkêşiya vê xebatê dike û dixwaze di demek nêzîk de daxwaznameyên bi dehan parêzerên Kurd, bigihîne ber destê Sendîkaya Parêzerên Kurdistanê li Hewlêrê. Parêzer, di serlêdana xwe de didin zanîn ku ew dixwazin, li kêleka hevkarên xwe yên ku parêzeriya mexdûran dikin cî bigrin. Di derbarê vê xebatê de, Endamê Saziya Birêvebir ya Baroya Amedê Av. Fahri Karakoyun daxuyaniyek da rojnameya me û da zanîn ku ew jibo vê xebatê çûne Başûrê Kurdistanê û liser şert û mercên beşdarbûna mehkemeya Seddam Hisên lêkolîn çêkirine. Av. Karakoyun wiha berdewam kir „jibo ku em rasterast têkevin mehkemê, pêwîstiya me bi zanîna ziman, hiqûqa navnetewî ya cezekirinê û hiqûqa Îraqê ya cezekirinê heye. Dibe ku em nikaribin bi serê xwe beşdarî mehkemê bibin, lê emê alîkariya xwe bi her awayî pêşkêşî hevkarên xwe yên li wir bikin. Jibo ku ev daxwaza me bê pejirandin, pêwîste em bi awayekî fermî serî li Sendîkaya Parêzvanên Kurdistanê bidin. Em niha daxwaznameyên xwe amade dikin. Biryara dawî wê ji aliyê Sendîkaya Parêzvanên Kurdistanê ve bê dayîn". Li gora Karakoyun, eger ew nikaribin rasterast beşdarî mehkemê jî bibin, hebûna wan ya li wir wê gelekî watedar be û ew dixwazin ku hejmara wan ne kêmî ya parêzvanên Seddam Hisên be.



## Serokê Kurdistanê: MESÛD MISTEFA BARZANÎ

Mesûd Barzanî di roja 16ê Tebaxa 1946an de li Mehabadê ji dayika xwe bû. Ev roj wek roja damezirandina PDK jî tê nasîn. Gava Mesûd Barzanî ji dayika xwe bû, bavê wî Mistefa Barzanî Generalê hêzên çekdarên Komara Mehabadê bû. Piştî hilweşandina Komara Mehabadê û çûna Mistefa Barzanî jibo Sovyetê, Mesûd Barzanî bi dayika xwe re li Iraqê ma.

Mesûd Barzanî 12 salan li Mûsilê ma û liwir dest bi xwendina xwe kir. Piştî vegera Mistefa Barzanî û nelihevkirina Kurd û hikûmeta Iraqê, Kurd bêgav (mecbûr) man ku dîsa dest bi şer bikin. Mesûd Barzanî wî çaxî 15-16 salî bû û bêgav ma dev ji xwendina xwe berde û bi bavê xwe re bibe şervanê azadiyê.Mesûd Barzaniyê 15-16 salî,ji wê rojê û virde jibo azadiya millet û welatê xwe têkoşiya û dev ji gelê xwe berneda. Mesûd Barzanî di nav şer û xebatê de pijiya û hîn di xortaniya xwe de berpirsiyariyên mezin hilgirtin. Bû endamê komîta navendî ya PDK û serokatiya paraztinê(îstîxbarata partiyê) kir. Di delegasyona lihevhatina 11ê Adara 1970î de cîh girt û di lihevhatinê de rolek mezin lîzt. Piştî bêbextiyên hikûmeta Iraqê û pêkneanîna peymanan,Mesûd Barzanî wek yek ji rêberên şoreşê dîsa rahişt tifinga xwe û bi fedekarî doza milletê xwe ajot. Piştî têkçûna şoreşa 1975an bi salekê, di 1976an de PDK ji nuh ve avabû û bi navê qiyada miweqqet şerê çekdarî dîsa destpêkir. Mesûd barzanî dîsa wek tekoşerekî şoreşê xwe avêt meydana şer û ji Kurdan re bû hêvî.Di 1978an de gava dixwest ji Wiyanayê vegere Kurdistanê rejîma Iraqê kemîna kujtinê liber wî danî lê bi selametî ji kemîna wan rizgar bû.Piştî vegera Kurdistanê, wî û brayê xwe Idrîs Barzanî di nav refên PDK de rolek mezin lîztin. Piştî mirina Mistefa Barzanî, di kongra 9.de wek Serokê PDK hat hilbijartin. Ji wê rojê û virde Mesûd Barzanî wek Serokê PDK hatiye hilbijartin û hîna jî vê erka pîroz dimeşîne.

Mesûd Barzanî jiyana xwe qurbanî doza Kurd û Kurdistanê kiriye. Bi helwestên xweyên welatperwerî û Kurdewarî, ewî di nav dil û cergên Kurdan de ciyekî qewîn girtiye, ji temamê Kurdên dinyayê re bûye sembola hêvî û pêşeroja Kurdistanê. Mesûd Barzanî zewiciye û bavê heşt zarokane. Ew ne tenê Serokê Herêma Başûrê Kurdistanêye, gelê Kurd bi tevayî wî wek Serokê xwe dipejirîne.






### Mesûd Barzanî weke Serokê Herêmê sûnda yasayî xwar

# Gav bi gav ber bi Kurdistana serbixwe

Yekemîn Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Mistefa Barzanî, roja sêşemaborî 14.06.2005, li pêşiya Parlemana Kurdistanê, sûnda yasayî xwar. Bi vî awahî cara yekemîn di dîrokê de du kesayetên Kurd bi awayekî fermî birêvebiriya Îraqê û Herêma Kurdistanê dikin. Hemwelatiyên Kurdistanê, piştî xwarina sûnda yasayî daketin kolanan û şahiyên pîrozbahiyê lidar xistin.

Salona Parlamenê berî merasîma sûndxwarinê bi alayên Kurdistanê hatibû xemilandin. Alaya Îraqê ya ku di bin siya wê de xwîna gelê Kurd hatiye rijandin, nehat hildan. Lê belê berî ku civîn dest pê bike bi kurtedemekê, ala Îraqê ya serdema Evdilkerîm Qasim li piştê kursiya axaftinê hat daliqandin. Mêvanên ku hatibûn vexwendin û endamên perlamanê ji seet 9ê sibehê ve hêdî hêdî kom bûn. Merasîma taybetî ya ji bo sûndxwarina Mesûd Barzanî li gora dema Kurdistanê, seet yekê piştî nîvro bi xwendina ayeteke Quranê dest pê kir.

Piştre tevayê amadekaran deqeyekê ji bo giyanê pakê Şehîdan rawestiyan.

Duvre serokê Parlemana Kurdistan Ednan Miftî bi axaftineke kurt rûniştin vekir û wî Mesûd Barzanî ji bo xwarina sûnda yasayî vexwend ser kursî. Mesûd Barzanî, di bin siya wêneyê mezin yê Mele Mistefayê nemir de, destê xwe danî ser Qurana Şerîf û sûnda yasayî xwar.

"Bi navê Xwedayê dilovan û mihrîvan. Ez Mesûd Mistefa Barzanî, sûnd bi Yezdanê Mezin ku maf û destketî û yekîtî û berjewendiyên hemwelatiyên herêma Kurdistanê biparêzim û bi rasgotinî û bidilsozî erkên li ser milên xwe bi cîh bînim."

Di dawiya sûndê de, mêvanên amade û endamên parlemanê demeke dirêj li çepikan xistin. Hejmareke mezin ji mêvanên Ereb, Kurd û biyanî ji bo vê merasîmê hatibûn vexwendin. Di nava mêvanan de serok û rêber û nûnerên partiyên ji her beşên Kurdistanê, rêber û nûnerên partiyên Îraqî, nûnerên Balyozxaneyên Amerîka, Brîtanya û çend welatên din jî amade bûn. Herwiha Serokkomarê Îraqê Celal Talabanî, Serokê Parlemana Îraqê Haçim el Hesenî, Cîgirê serokkomarê Îraqê Adil Ebdulmehdî, Cîgirê serokwezîrê Îraqê Ehmed Çelebî û nûnerê Sekreterê Giştî yê Neteweyên Yekbûyî Eşref Qazî jî di dema sûndxwarinê de amade bûn.

Ji Kurdistana navend jî gelek kes ji bo merasîma sûndxwerinê beşdarî civîna parlamanê bûn. Di nava beşdaran de keseyatên weke Şerefeddin Elçî, Rojhat Amedî, Dr. Memed Emin Sever, Haşim Haşimî, Mahmut Sönmez, Derwêşê Sado, Ibrahim Aksoy, Dagistan Toprak û Dr. Felat Dilgeş hebûn.

Piraniya nûnerên fermî yên sazî û dewletan di axaftinên xwe de pîrozbahiya Mesûd Barzanî kirin. Di encama rûniştinê de Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî spasiya mêvanan kir.

### Pîrozbahiyên Kesayet û Partiyên Kurdistanî

Bi munasebeta hilbijartina Mesûd Barzanî weke Serokê Herêma Kurdistanê, ji aliyê gelek serokên partiyên Kurd û kesayetên navdar ve peyamên pîrozbahiyê hatin weşandin.

Serokê Emerîkayê George Bush bi riya telefonê xwe gihand Serokkomarê Iraqa Federal Celal Talabanî û bi boneya serkeftinên li Kurdistanê di şexsê wî de gelê Kurd pîroz kir.

Piştî hilbijartina Mesûd Barzanî wekî Serokê Kurdistana federal û li hevkirina hêzên Kurdistanî ji bo hikûmeteke hevbeş, Serokê Emerîkayê George Bush bi telefonê di şexsê Serokkomarê Iraqa Federal Celal Talabanî de gelê Kurd pîroz kir.

Berdevkê Qesra spî Scot McClan ragihand ku Serokê Emerîkayê di axaftina xwe de bal kişandiye ser girîngiya hevkariya Kurdan û herweha ew li ser amedekariyên destûra Iraqê ya nû û tedbîrên ewlekariyê jî rawestiya ye.

Serokê berê yê Partiya Sosyalîsta Kurdistanê Kemal Bûrkay di peyama xwe de wiha dibêje:

„Avabûna Herêma Kurdistanê weke herêmeke federe û hilbijartina we weke serokê pêşîn ji bo vê herêmê, di dîroka Kurdistanê û ya Iraqê de gaveke teze û tarîxî ye. Em bi vê yekê dilşa û serbilind in."

Serokê Giştî yê DEHAPê Tuncer Bakirhan jî Serokê Giştî ye PDK ê Mesût Barzanî pîroz kir.

Serokê Giştî yê DEHAPê Tuncer Bakirhan got: „Kurdan li Iraqê, piştî têkoşîneke demdirêj xwe bi rê xistine. Ev maf, di nava pergala federatîf û demokratîk de bidest xistine û ev statûya wan ya sîyasî û hiqûqî ji aliyê hêzên navneteweyî ve tê pejirandin. Ev yek jî ji bo dîroka wan tê wateya pêvajoyeke nû."

www.arsiv.org

# Pêsmerge Serok e, Serok jî her Pêsmerge ye

**Nizar Caf**

Heger ev tiştê ku niha li Kurdistanê çêdibe, ango bûyera hilbijartina Serokê Herêmê, li devereke din bûya wê weke rûdaneke pir asayî bihata dîtin. Lê dema ku cihê bûyerê Kurdistan be û ew serokê ku hatiye hilbijartin jî kesayetiyek weke Mesûd Barzanî be, rûdan watedar dibe.

Mesûd Barzanî ew kese ku di jiyana xwe de seetekê jî dest ji rêbaza Kurdaye- tiyê bernedaye, ku di heman demê de rêbaza Barzaniyê nemir e. Roja yekşema borî, ji bo Kurdan û cîhanê hat ragihandin ku ew weke Serokê Herêma Kurdistanê hat hilbijartin. Lê di rastiya xwe de ew bi awayekî fermî weke serokekî netewî jibo hemû neteweya Kurd ya bindest tê nasîn. Sedema vê yekê jî kesayetiya taybetî ya Mesûd Barzanî ye. Kesayetiya wî bûye xwediyê gotarek taybetî ku dikare bandorê li hemû beşên Kurdistanê bike.

Barzanî herdem licem xelkê Kurd xwediyê payeyeke bilind bû. Lê bi awaye- kî zagonî û demokratîk hilbijartina wî weke Serokê Herêma Kurdistanê, bûyerek dîrokiye û cihekî girîng di dîroka rizgarîxwaziya Kurdistanê de girtiye.

Dijmin jî baş dizane navê Barzanî çi tîne bîra her Kurdekî. Mesûd Barzanî, weke xebatkar û pêşmergeyekî, herdemê li meydana tekoşîna jibo Kurdistanê bû û ew her girêdayî prensîbên Kurdayetiyê maye. Barzanî di rewşa herî kambax de jî serî li ber dijminan netewandiye. Jiber vê yekê ew herdemê di qada siyasî de û ji aliyê medyaya cîhanî ve wekî çavdêrekî hişyar yê berjewendiyên netewa Kurd hatiye nasîn. Ev taybetmendiya wî di pirsgirêka Kerkûkê de jî derket holê. Wî bi helwesta xwe ragihand ku Kerkûk jibo Kurdan xeta sor e. Ev helwest bû sedem ku Kurdên Kerkûkî vegerin ser axa xwe. Herwiha wî li ser sîstemeke federal jibo Îraqê îsrar kir û dike.

Mesûd Barzanî, ji paytextê Kurdistanê, Hikûmeta Îraqê neçar kir ku careke din sûnda yasayî bixwin, ji ber ku wan gotina federaliyê jê derxistibûn. Vê yekê rewan (îspat) kir ku dawî li serdema xapandina Kurdan hatiye.

Mesûd Barzanî, diyartirîn kesayetiye ku ji dibistana Barzaniyê nemir derketiye û ew hilgirê rasteqîn yê alaya xebata Kurdayetiyê ye. Ew, di bin alaya Komara Kurdistan ya Mehabadê de, sala 1946an ji dayik bûye. Bi awayekî demokratîk hilbijartina wî ji bo serokatiya Herêma Kurdistanê, hêvî û daxwaza netewa Kurd ya ji bo serxwebûnê zindî dike.

Hemû hêzên herêmê û yên cîhanê jî dizanin ku Mesûd Barzanî doza Kurdan nake mijara bazarê. Ew xwediyê gotina xwe ye û çi bibêje wê dike.

Hemû aliyên siyasî hesabê gotin û helwesta wî dikin. Heta bi diyarkirina namzeta serokkomariya Îraqê jî bi gotina wî bû.

Hêjayî gotinê ye ku Barzanî berî bibe Serokê Herêma Kurdistanê jî, ji aliyê siyasetmedarên cîhanê ve li her derê weke serokekî hatiye pêşwazîkirin.

Em dikarin bibêjin ku Pêşmerge Serok e û Serok jî her Pêşmerge ye.



## Dewleta Tirk rola sê meymûnan dileyize



Bi minasebeta hilbijartina Mesûd Barzanî berdevkê Wezareta Derve ya Tirkiyê Namik Tan daxuyaniyek da. Tan got ku jibo serokatiya herêma Kurdistanê hilbijartina Mesûd Barzanî jibo wan tiştekî zêde îfade nake.

Di civîna xweya çapameniyê ya hefteyî de Tan berevajî heta niha, wek ku guherandinên li Kurdistanê û li Iraqê Tirkiyê eleqedar nake got û weha dom kir: "Destûra Iraqê federalîzmek ne li ser bingehê etnîkî, lê li ser bingehê coxrafî û îdarî raber dike."

Eşkere ye ku di vê demê de "Xwedê" ji dewleta Tirk stendiye, jiber ku wek berê tiştekî din ji destê wê nayê, mijaran ne wek heye, lê wek ku dixwaze şîrove dike.

## Serokatiya Barzanî li Amedê hat pîrozkirin



Hilbijartina Mesûd Barzanî ji bo serokatiya Kurdistanê li Amedê bi def û zirne hat pîrozkirin. Komeleya Kurd (Kom-Kurd) li parka Koşuyolu şahiyeke pîrozbahî li darxist û Amediyan bi govend cejna gelê Kurd pîroz kir. Berî şahiyê serokê Kom-Kurdê Îbrahim Güçlü daxuyaniyek çapamenî da û got, "Serokatiya Mesûd Barzanî jibo gelê Kurd serkeftinek gelekî girîng e û wê jibo çareserkirina pirsgirêkên herêmê rê veke. Îbrahîm Güçlü ji Peyama Kurd re ragihand ku bi vê bûyerê gelê Kurd jibo çareserkirina pirsa Kurdistanê gavek mezin avêtiye. Di şahiyê de welatperwerên Kurd dilgeşiya xwe bi dûrişmeyên, "Bijî Kurdistan" û "Bijî Barzanî" anî ser zimên.

www.kurdish.org



**hiravetî**

**Bayram Ayaz**

# Di qonaxek mêjuyî de hilbijartina Serwerê Kurdistanê

Ev çend mehên dawî gotina mêjuyî ji devê me qet kêm nabe.

Bi rastî em di demek zehf giring re derbas dibin û bûyerên dîrokî diqewimin. Em dixwazin çend ji van rûdanan bibîrbînin û bikurtî behsa serweriya Kurdistanê bikin.

Bûyera yekemîn lihevhatina sala buhorî ye di nabeyna PDK, Yekîtî û hêzên dî de. Bi vê biryarê yekîtiya navxweyî ya netewî pêkhat. Hêzên Kurdistanî bi listeyên hevbeş tevli hilbijartinan bûn. Di hilbijartinan de Kurdistaniyan hêz û qudreta xwe îspat kir û bûn şirîkek bihêz yê Bexdayê. Herwisa piştî sêzdeh salan Parlamena Netewî ya Kurdistanê ji nûve hat hilbijartin.

Bûyera duyemîn hilbijartina birêz Celal Talebanî jibo Serokê Iraqa federal e. Di dîrokê de cara yekemîne ku Kurdekî bi nasnameya Kurd dibe Serokê dewletekê. Ev bûyer di asta navnetewî de meşrûiyeta doza Kurd û Kurdistanê xurt kir. Rola Kurdan di prosesa demokratîzekirina Iraqê û Rojhilata navîn de îspat bû.

Bûyera sêyemîn roja 4ê Hezîranê kombûna Parlamena Netewî ya Kurdistanê ye. Parlamen îradeya miletê me temsîl dike. Di hiqûq û siyaseta navnetewî de, maneya Parlamenê berz e. Parlamen dezgeha netewiya hilbijartî ya herî bilind e. Herwisa sembûl û nûneriya îradeya azad ya gel e. Netewek bê Parlamen, di qada navnetewî de ti şansê wê nîne ku muhatab bê girtin. Parlamen liser navê gel yasayan derdixe, desthilatdariyê diyar dike, dezgehê hikûmraniyê ye. Rejîmek demokrat bê Parlamen nabe. Dewleta Kurdistanê dixwaze bibe dewletek hiqûqê û yasayan. Û bi îdareyek dêmokrat welat bête birêvebirin. Parlamen sitûna rejîmek demokrate, û saziya demokrasiyê ye.

Bûyera çaremîn, hilbijartina Serokê Kurdistanê ye. Bi vê gavê di dîroka Kurd û Kurdistanê de qonaxeke nû destpêdike. Di dîroka me de ti demê serwerekî me bi destûrî yasayî çênebûye. Cara yekem rêzdar Kek Mesûd Barzanî ji terefê îradeya miletê me (Parlamenê) ve bi riyek yasayî hat hilbijartin.

Vê bûyera mêjuyî em dikarin ji gelek aliyan ve şîrove bikin. Aspektekî jibo min zêde zêde giring e. Bi hilbijartina Serokê Dewleta Kurdistanê şert û mercên jibo damezirandina dewletekê temam bû. Yanî prosesa dewletbûnê gîha qonaxa dawî. Helbet qonaxa herî hessas... Tevgera Kurdistanê wê di vê qonaxa dawî de helwestekê çawa diyar bike, girêdayî konjonktura siyasî ye. Daxwaza dewletek serbixwe di nav Kurdan de her diçe xurt dibe.

Hilbijartina rêzdar Kak Mesûd Barzanî jibo vê qonaxa hesas û mêjuyî jibo Kurdan demaneke.

Heta roja îro çi bela û xerabî biser gelê me de hatiye, hemî jiber tunebûna dewleta me, jiber bê al û bê serweriya me bûye. Belê alayek me hebû, ev pênc û neh salin ku mixabin wek emanetekî pîroz di sendûqan de veşartî bû. Îro ev al li asmanê welat pêl dide. Ev sêzdeh salin me dewletek jî heye. Bi hilbijartina rêzdar Kak Mesûd Barzanî nuha serwerekî me jî çêbû. Gelê Kurd û hemî Kurdistanî pê şanazin ku yekî wek cenabê Kak Mesûd Barzanî bû Serokê Kurdistanê.

Serwerê Fransizan De Gaulle hêza Serokekî dişibîne dolaba ji mirinê xilaskirinê (life belt). Ew dibêje çawa ev dolab di rewşên awarte de baweriyê dide rêvingê keştiyekê, rola serokekî jî wisaye, insan dixwazin di rewşên metirsî de baweriya xwe pê bînin û li dora wî bigîhin hevdu. Dîrokê û rastiya jiyanê ev rol daye rêzdar Mesûd Barzanî. Kurd û Kurdistanî pê bawerin ku ewê me bigîhîne armanca me ya sereke!

Bila çavên Kurdperwerên demokrat û dilsoz ronîbe û Serweriî li Kurd û Kurdistanê pîroz be!

# Bîreweriya Iraqa Federal - Demokratîk û Parlamentoya Kurd



**Îsmaîl Beşîkçî**

Projeya Iraqa Federal û Demokratîk ji aliyê Partî Demokratî Kurdistan û Yekîtî Nistimanî Kurdistan ve bi biryar û israr tê paraztin. Ev, ji sê xalan yeke û tê maneya ku wê Kurd tawîzê nedin, hertim biparêzin û hewl bidin ku wê jîndar bikin. Herdu xalên din bi pêsmerge û Kerkûkê ve girêdayîne. Kurd, li Kurdistana basûr, gava van bîrewerî û pêshaziriyên xwe bi hikûmeta niha ya Iraqê bidin pejirandin, ango gava makzagon, di cercewa Iraqek Federal û Demokratîk de bê sererast kirin, wê kar û qezenca Kurdan pir be. Ev wê ne tenê qezenca Kurdên başûr be, lê herweha qezenca hemî Kurdan be. Dewletek Federala Kurd û xwediyê sînorek nas, di dîroka Kurdan de xalek ji xalên herî girîng e. Demokratîkbûna Iraqê, ligor min, bi awayekî mezin, bi jîndarkirina Iraqek Federal ve girêdayiye.

Li Iraqê, di hilbijartinên 30ê Cileyê Paşîn de jibo herêma Kurdistanê jî hilbijartinek xweser çêbûye. Parlamentoya Kurd, di 4ê Hezîrana 2005an de civiyaye. Di berdewamiyê de parlamentoya Kurd di derbarê Serokatiya Herêma Kurdistanê û Hikûmeta Federala Kurd de zagon derxistin. Parlamentoya Kurd, di 12ê Hezîranê de, Serokê Partiya Demokrata Kurdistanê Mesûd Barzanî wek Serokê Herêma Kurdistanê hilbijart û di 14ê Hezîranê de jî Mesûd Barzanî sûnd xwar û dest bi wezîfeya xwe kir. Di merasîma sûndxwarinê de, Serokkomarê Iraqê Celal Talabanî û rayedarên hikûmeta Bexdadê jî beşdar bûn. Di merasîmê de ligel Amerîka û Ingîltere, nûnerên gellek welatên din jî beşdar bûn. Tê xuyakirin ku wê Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî jibo avakirina hikûmeta Federala Kurd erkê bide Nêçîrvan Barzanî. Iraqa Federal û Demokratîk dikeve jiyanê. Bîreweriya Iraqek Federal û Demokratîk a ku ji aliyê desthilatdarên Iraqê ve tê naskirin, wê ji aliyê dewletên wek Îran, Tirkiyê û Sûriyê ve jî bê naskirin. Ger ev dewlet nexwazin hikûmeta Kurd nasbikin jî lê wê di dawiyê de li beramberî naskirina wê bimînin. Di vir de gotina „naskirinê" ji xeynî maneya Hiqûqa Gelemperiya Navnetewî di warê sosyolojîk de xwediyê maneyekê ye.

Di 1920an de, goreya ku hêzên emperyalîstên wê demê û hevkarên wan yên Rojhilata navîn li serê Kurdan gerandibûn, dicire û li beramberî avêtinê ye. Statukoya ku di 1920an de pêkhatibû brînek mezin stendiye. Ev statuko li himber belabûnê ye. Di vê xalê de pirsek heye ku felsefa dîrokê pir eleqedar dike. Hêzên emperyalîst ü hevkarên wanên Rojhilata navîn ên ku di 1920an de nîzam didan dinyayê, Kurd û Kurdistan belav û parcekirine. Vê statukoya ku Kurd bê statu histiye, zêdeyî 80 salin tê paraztin. Lê di sala 2000î de, dîsa bi destê hêzek emperyal mudaxelekirina Iraqê, ev statukoya "fîraz – miqeddes) qelişand. Bêguman armanca mudaxeleya Amerîkayê petrole, bidestxistina kaniyên enerjiyê ne. Vê mudaxelê hiştiye ku Kurd bêhna xwe bistînin. Hilwesandina rejîma Saddam Husên, belavkirina Partiya Baas, belavkirina artêşê, belavkirina serwîsa neyînî, jiholêrabûna tehdîda çekên kîmyawî...Van tevan hiştiye ku rê liber Kurdan vebe. Hiştiye ku Kurd azadiyê bijîn. Bêguman gotinên Kurdan, ango xwedî li dûrişmeyên xwe derketin û helwestên wan ên xwedî biryar di bidestxistina van encaman de girîngiyek mezin e.

1920, 2000...bi Kurdan re têkiliyên du hêzên emperyal...Ev têkilî, ev encam di warê felsefa dîrokî de pêvajoyên ku meriv liser bifikire. Ev pêvajo ne tenê Kurd û Kurdistanê, bi awayekî xurt seranserê Rojhilata navîn eleqeder dike.

# Tirkan çewalên Amerîka ji bîr nekirine



Cîgirê Serokê Gîştî yê CHP Onur Oymen, serdana Recep Tayyib Erdogan ya Amerîkayê şîrove kir û li ser gotina "hevkariya stratejik" wiha got "hevkarên Amerîka yên stratejîk Ingîltere, Israîl û Kanada ne. Mirov çewalan naxe serê leşkerên hevkarê stratejîk". Oymen di derbarê helwesta Amerîka ya li hemberî PKK de jî da zanîn ku, tu nîşanên vê yekê tunene ku Amerîka li beramberî PKK derkeve û wiha berdewam kir "me peyama xwe di mijara Sûriyê de baş nedaye". Onur Oymen careke din gotin anî ser bûyera çewalan û wiha got "gelo Tirkiyê hevkarê stratejîk yê Amerîkaye an na?. Mirov çewalan naxe serê leşkerên hevkarê stratejîk û mirov piştgiriya doza milî ya hevkarê stratejîk dike".

Rayedarên Tirk ji helwesta Amerîka ya li hemberî Tirkiyê ne razî ne û xuyaye ku bûyera çewalan bandoreke mezin li wan kiriye, lê heta ku Tirk aqlê xwe neguherin wê gelek çewal têkevin serê wan.

# Serokê şaredariya Karliova Muzaffer Golen: "me zanîbû wê erdhej çêbibe, lê me negot"

Li navçeya Karliova ya girêdayî Bîngolê, haya rayedaran ji çêbûna erdhejê hebû lê wan ev yek ji şêniyê bajêr veşart. Li gora ku hatiye ragihandin, di encama wê erdhejê de ziyan gihiştiye 305 avahiyan û 54 kes jî birîndar bûne. Bi salane ku rayedarên navçeyê ji dewletê dixwazin ku herêma wan weke "herêma karesatê" were dîtîn û ji bo kêmkirina ziyana erdhejên pêşerojê xebata pêwîst were kirin, lê belê heta niha ev daxwaza wan bi cî nehatiye. Li gora Komeleya Erdhejzadeyên Bîngolê û Komeleya Mafên Mirovan jî lazime rayedarên Dewleta Tirk rojekê berî ya din nexşeyên karesatên xwezayî derxînin, deverên ku dikevin nava sînorên karesatan diyar bikin û li gora vê yekê, tedbîrên ku tênе xwestin bi cî bînin.

# Hilbijartina Serokkomarê Îranê û hêviyên ku tên kirin



**Mansûr Sitqî**

Roja 17.06.2005an, nehemîn Serokkomarê Îranê di nava aloziya rewşa welat ya hundirîn û derve de bi rêve diçe.

## Aloziyên derve:

Kêşe û dijayetiya kevnar ya di navbera desthilata Îslamî û siyaseta Welatên Yekgirtî yên Amerîka de her dewam dike. Ev hilbijartin, vê pirsgirêkê dixe qonaxeke nû. Piştî hxana rejîmên dîktator yên wekî Talîban li Afxanistan û Seddam Hisên li Îraqê, sînorên serbazî û siyasî yên Amerîka, nêzîkayî li rojava û rojhilatê Îranê kirine. Piştî guhertinên ku li Libnanê çêbûn, bandora desthilata Îslamî liwir jî lawaz bû û valabûnek di pirsgirêka Îsraîl û Filîstîn de derket holê. Li aliyekî din, sûrbûna (israr) desthilata Îranê ya liser bidestxistina teknîka atomî, û piştgiriya veşartî û eşkere jibo terorîzma îslamî û binpêkirina mafên mirovan, hiştiye ku pirsgirêkên ligel Amerîka bigihijin radeya dawî. Rewşeke wiha hatiye pêş ku hêzên navnetewî zextê li Îranê bikin û dawiyê li desthilata Îslamî bînin. Piştî ku Amerîka, Ewrûpa jî kişand nava vê siyasetê, alîgirên rûxandina rejîma Îranê li derve û hundir zêde bûne. Li Îraqê pêkhatina desthilateke federal û demokrat û bi taybetî jî beşdarbûna Kurdan weke hêzeke sereke jibo vê pêvajoyê, bandoreke mezin li neteweyên Îranê yên bindest û stemxwar kiriye. Di tevayê dîrokê de, neteweyên Îranê mecbûrî siyaseta cudaxwaziyê bûne. Ne bi tenê mafên wan yên netewî hatine binpêkirin, lê her wiha beşdariya wan ya di birêvebiriya dewletê û siyasetê de jî hatiye astengkirin. Ev netewe dikarin di pêşeroja Îranê de, bi tenê di nava sîstemeke federal de rola xwe bilîzin.

## Aloziyên hundirîn:

Yek ji taybetmendiyên sereke yên desthilata Komara Îslamiya Îranê ewe ku sînorên desthilatiyê teng bike û nehêle ku xelk tê de beşdar bin. Sîstema birêvebirinê, sîstemeke olî ye û kêmtirîn mafan dide hemwelatiyan. Li jorînên desthilatiyê, navendên nehilbijartî yên weke "rêber" xwediyê tevayê desthilatê ne û gotûbêj liser karûbarên wan nabe. Rojnamevanekî Rojavayî gotiye "eger çarşefa îslamî jiser Komara Îslamî ya Îranê rakin, wê melîkî derkeve holê". Hêzeke teokrat û dîktator desthilatî xistiye destê xwe û rê li ber hemû rengên guherandinên siyasî, civakî û nûjen digre. Ji bo serkutkirina opozîsyonê, navê îslamê bikar tînin û sûdê jiher rê û rêbazên nerewa werdigrin. Rê li ber çalakiyên siyasî, civakî û kûltûrî girtiye. Azadiya gotin û çapemeniyê binpê dibe. Mafên siyasî û civakî yê jinan binpê dibin û tu rûmeta mafên mirovan nîne. Xwediyê nerînên cuda êşkence û îdam dikin.

Li Îranê petrol weke sermiyanekî netewî ye, lê ew di destê rejîmê de bûye amûrekî mezin jibo domandina siyaseta serkutkirin û xapandinê. Rejîma Îslamiya Îranê, bi domandina van siyasetan roj bi roj nêzîkî rewşa Seddam Hisên ya dema dawî dibe. Roj bi roj hêviya xelkê li hemberî hêzên hundirîn kêm dibe ku ew bikaribin guhertinên siyasî bikin. Çavê herkesî li hêviya hatina hêzên derve ye. Hêviya rizgarbûnê bi wan ve hatiye girêdan.

Civata Çavdêriya Yasaya Bingehîn, ku di heman demê de berpirsa hilbijartinên serokkomariyê ye, ji nava 1010 kesan bi tenê 6 kes weke berendamên hilbijartinê ragihandin û her 6 kesên berendam jî alîgirê Rêberê nehilbijartî yê desthilata Xameneyî ne. Ligor zagona bingehîn ya rejîma Îslamî, jin nikare bibe serokkomar. Li hemberî awayê hilbijartinan dengê nerazîbûnê li derve û hundir bilind bû. Heta beşek ji kesên ku di nava desthilatê bixwe de bûn jî pêşeroja xwe xerab didîtin û xwe ji hilbijartinan kişandin. Bi taybetî piştî ku Yekîtiya Ewrûpa rexneyên xwe yên di derbarê nedemokratiya hilbijartinan de ragihandin, Xameneyî bi lez ji Civata Çavdêriya Yasaya Bingehîn xwest ku biryara xwe biguherin jibo tevlêbûna hilbijartinan rê bidin du kesên reformxwaz jî ku nêzîkî Xatemî ne. Ji wê demê ve û heta niha Îranê hewl daye ku hejmara beşdarkirina di hilbijartinan de zêdetir bike.

Yek ji taybetmendiyên hilbijartina serokkomariya Îranê ya vê carê jî dengên Kurda ne. Radeya dengên Kurdan di rewşa siyasî ya welat de faktoreke girîng e. Di hilbijartinên berê de girîngî nedidan dengê Kurdan. Lê vêcarê hemû aliyên desthilatê, bi armanca komkirina dengên Kurdan dixebitin. Wek nimûne, Rafsancanî ku di hemû hilbijartinên berê de kêmtirîn deng li Kurdistanê bidest xistiye, vêcarê bi rengekî hîlekar propaganda xwe ya hilbijartinan li Kurdistanê bi wêneyê xwe yê ligel Mesûd Barzanî dike. Her wiha ew liser navê nûnerê Yekîtî Nîştîman li Tehran dide zanîn ku Mam Celal dengê xwe dide wî û piştgiriya wî dike. Li aliyekî din, reformxwaz jî dixwazin jibo pêkanîna armancên xwe yên siyasî, dengê 5 milyon Kurd jibo xwe wergirin. Beşdarbûna Kurdan di hilbijartinan de ligora ku tê texmînkirin di nizimtirîn astê de ye. Jiber ku daxwazên Kurdan li Rojhilatê Kurdistan, di çarçoveya teng ya Komara Îslamî de hilnayên.

Sernivîskara Kovara Rasan û Rûîya Telûî ku di heman demê de parêzvana mafên jinên Kurd e di vê derbarê de dibêje "em wekî Kurd li Îranê, doza mafên wekhev yên siyasî, aborî û civakî dikin. Em doza geşkirina rewşa aborî û bi awayekî fermî xwendin û nivîsandina bi zimanê Kurdî dikin. Em dixwazin, deverên xwe di nava sîstemeke federal de bixwe bi rêve bibin. Lê belê ev daxwazên me li Îranê ji aliyê reformxwazan ve jî nayên qebûl kirin".

Kurtenûçe

## Mehabadî li kolanan bûn

**PK** - Roja 14.06.2005an di dema sûndxwarina Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî de, li Rojhilatê Kurdistanê xelkê Mehabadê daketin kolanan û dest bi derbirîna kêfxweşîya xwe kirin.

Di demeke kin de hejmareke mezin ji xelkê bajarê Mehabadê derketin kolanan û beşdarî şahiya pîrozbahiyê bûn. Girseya gel û kêfxweşiya wan bala hêzên întîzamî yê Îranê kişand ser xwe û wan êriş birin ser xelkê bajêr. Ji bo belavkirina girseya gel, hêzên ewlekariya Îranê, darê zorê bi kar anîn.

Li gora ku hat ragihandin, xelkê bajarê Mehabadê ji roja 12ê Gulanê ve xwe ji bo vê şahiyê amade dikirin û di dema sûndxwarina Mesûd Barzanî de, rijîyan ser kolanan û dilsoziya xwe ji bo Başûrê Kurdistanê pêşkêşkirin.

## Rêxistinên mafên mirovan, doza berdana girtiyan li Îranê kirin

Rêxistinên mafên mirovan yên navnetewî, ji Îranê daxwaz kirin ku ew yekser temamê girtiyên siyasî berde.

**PK (Navenda Nûçan)**
Nûnerên rêxistinan, ligel xwediya Xelata Aştîyê ya Nobelê Şêrîn Ebadî belavokek belav kirin û bang li hikûmeta Îranê kirin ku ew girtiyên siyasî serbest berde.

Di belavokê de hat gotin ku ji sala 2000î û vir ve çewisandina liser çapemeniya reformxwaz zêde bûye û gelek rojnamevan hatine girtin. Her wiha zêdetirî 100 çapxanan jî hatine girtin.

Di belavokê de tê gotin ku di nava girtiyên zîndanan de du miroven bi navê Ekber Gencî û Nasir Zarafşan jî hene û daxwaza wan ya tedawîbûnê nayê pejirandin jiber ku wan hikûmet rexne kiriye.

Tê dûbarekirin ku rojnamevan Ekber Gencî bi tenê jiber rexnekirina rayedarên dewletê, hatiye girtin.

Di belavoka Federasyona Mafên Mirovan ya Navnetewî, Rêxistina Çavdêriya Mafên Mirovan, Rêxistina Efûyê ya Navnetewî û Rêxistina Rojnamevanên Sînornenas de tê gotin ku Riza Elîcanî, Takî Rahmanî û Xoca Saber jî bi neheqî hatine girtin û ew girtiyên wîjdanî ne.



www.krsiar.org



**gotin**

Ahmed Zekî Okçûoglû

# Gelo, Tirk birastî jî dixwazin PKK ji holê bê rakirin?..

Beriya ku bersiva vê pirsê bidim, ez dixwazim çend gotinan liser hevdîtina Bush û Erdogan bibêjim.

We çawa xwend nizanim, lê min di rojnameyên Tirkan de nivîsên ku liser hevdîtina Erdogan û Bush hatin weşandin weha xwend...

Serokwezîrê Komara Tirkiyê Erdogan di dema hevdîtinê de carek din ji Bush xwestiye ku Yekîtiya Dewletan li hêzên PKK yên li başûrê Kurdistanê bixe û wan ji wê derê derxîne. Bush jî bi axaftineke gelekî bi şermezar ji Erdogan re weha gotiye; "Lime biborin. Bi PKK re şerkirin ne karekî hêsan e. Ew bi tenê karê artêşa Tirkan e. Em li ku, artêşa we li ku."

Piştî vê bersivê Erdogan jî weke her carê pir hêrs bûye û gotiye, "Ev bû çend car hûn me dixapinin. Ji bo xatirê te emê careke din demeke kin bidin we. Êdî em nema dixwazin van gotinan ji we bibihîzin. Madem ku tu dibêjî em nikarin li PKKê bidin wê çaxê ha ji we re lîsteya giregirên PKKê. Divê hûn gavekê berî ya din wan bigirin û teslîmî me bikin." Liser vê gotinê Bush jî careke din ji Erdogan lêborîn xwestiye û weki yekî tawanbar ji ciyê xwe rabûye û çûye ber Erdogan û lista PKKiyan ji destê wî girtiye û berepaş vegeriyaye ciyê xwe.

Ligor her carê pîvana zirtîniya Tirkan vê carê piçekî ketibe jî, wan hîna dest ji xuyê xwe bernedaye.

Em bên ser pirsa xwe...

Gelo Tirk birastî jî dixwazin ku PKK ji holê bê rakirin?

Na!.. Êdi herkes têkiliya Komara Tirkiyê û Evdila Öcalan kêm zêde dizane.

Evdila Öcalan çawa PKK bi pereyê îstîxbarata Tirkan ava kir?.. Ew çawa çû Sûriyê?.. Dema ku ew li Sûriyê bû, têkîliya wî û îstixbarata Tirkan û Sûriyan çawa meşiya?.. Li Îtaliyayê, piştî têkiliya ligel îstîxbarata Tirkan çawa derket û hat Komara Tirkiyê?.. Li grava Îmraliyê bi talîmatên sererkaniya Tirkan çawa karê rêxistina xwe dimeşîne?... Di Îmraliyê de çawa û çima carek din biryara şer hat stendin?..

Piştî anina Evdila Öcalan jibo "Tirkiyê" heke xwestibana, heta niha Tirkan PKK ji zû ve ji holê rakiribûn. Lê ev yek bi zanebûn nekirin.

Digel van rastiyan tevan jî Emerikî û Ewrûpî bi ser Tirkan de naçin û liber zirtîniya Tirkan serê xwe datînin.

Serê xwe datînin jiber ku ew jî beşdarên vê kirinê ne. Ne îro, ji roja damezrandina PKKê û vir ve her tişt dibin agahdariya wan de dimeşe.... Weki doh îro jî, ji bo pêşîlêgirtina pirsgirêka Kurdistana navend (Bakur) hewcedarê PKKê ne. Bî gotinek din, ne Tirk, ne Emerika, ne jî Yekîtiya Ewropa dixwaze PKK tasfiye bibe.

Niha jî em bên ser listeya PKKiyan...

Tirk diçin kîjan welatî, hema vê listê derdixin didin wan. Lê bi qasî ku em jê agahdar dibin navên ku di vê lîstê de cîh digirin bi piranî ji yên ku li dijî Evdila Öcalan derketine û ji PKKê qut bûne pêk tê.

Di eslê xwe de ew ne lipey PKKiyan e, liser navê wan dixwaze, muhalifên Evdila Öcalan tasfiye bikin.

Jiber sedama ku li jor min anî ser zimanê xwe, rojavayî jî heya ku ji wan tê piştgiriya Tirkan dikin.

# Kurdên Sûriyê doza mafên xwe li ba Rêxistina Neteweyên Yekbûyî (UNO) parastin



Jiyan Bedirxan

Working Group on Minorities (WGM) li Cenevrê (30.05.2005) dest bi civîna xwe ya 11. kir. Civînê pênc rojan dom kir. Nûnerên nêzîkî 30 welatan amade bûbûn. Ji bo doza mafên gelên xwe bi WGM û nûnerên dewletên xwe re vekolin, bêtirî 50 endamên NGO û Akadêmîkî jî hatibûn. Beşdarên civînê nêzîkî 200 kesî bûn.

WGM komiteyeke, ku ji 5 kesane, ew jî ji Sub-commision of Human Rights hatine hilbijartin. Her endamekî wê ji erdzemînekê (kita) ye. Îsal jibo serokatiyê Prof. Jose Bengoa hat hilbijartin. WGM jibo mafên hindikayiyan konseptan û raporan sazdike û ji Sub- Commission of Human Rights re dişîne.

Îsal cara yekemîn bû ku Komîteyek ji Abduselamê Neyo, Arifê Cabo, Jiyanê Bedirxan û Riyadê Hemê bi navê Kurdên Sûriyê li hember hikûmeta Sûriyê beşdarî civînê bûn. Lê mixabin bi navê Kurdên perçeyên Kurdistanê yên din tu kes ne amade bûn.

Di destpêkê de nûnerên hindikayiyan gotinên xwe xwendin. Di vî beşî de ji Kurdên beşdar Marmoste Arif Cabo gotina xwe xwend. Arif Cabo di gotara xwe de bala beşdarvanan kişand ser kêşeya Kurdên Sûriyê, yên ku di sala 1962an de nasnameyên wan ji wan hatine kişandin. Wî di axaftina xwe de behsa "Zinara Erebî" jî(Kembera Erebî) kir. Zinara Erebî di sala 1973an de ji aliyê desthilata Sûriyê ve hat pêk anîn. Zeviyên Kurdan ji wan standin û dane Erebên çolê yên ku ji bajarê Reqê û Helebê anîbûn. Mamoste Arif liser serhildana Qamişlo ya ku li dijî hovîtiya şovenîstên Ereban pêkhat, rawestiya.

Piştî Arif Cabo, min gotara xwe xwend. Ez di gotara xwe de bi giranî liser qedexekirina mafên Kurdên Sûriyê rawestiyam.

**Xwestekên komîteya Kurdî bi kurtî ev bûn:**

1. Divê Kurd di destûra Sûriyê de wekî netewe werin naskirin û mafên wan yên polîtîk û çandî werin dayîn. 2. Divê rê liber partî û komelên Kurdan bê vekirin, 3. Lazime hikûmeta Sûriyê şerê xwe yê li dijî ziman û çanda Kurdî rawestîne. 4. Divê hemû girtiyên polîtîk werin berdan. 6. Pêwîste komîteyek serbixwe ji bo lêkolîn û dadgehkirina kujerên pakrewanên serhildana Qamişlo were damezirandin.

Hemû miletên ku li dijî dewleta xwe gili dikin, dikarin ligel dewletê beşdarî vê civînê bibin. Sûriyê di sê rojên pêşîn de amade nebûbû, ji ber ku wêneya wê di civaka navnetewî de nebaş bû. Di roja çaran de serokê Komîteya Sûriyê li ba Yekîtiya Neteweyan amade bû û bersîva pirsên nûnerên Kurdan da.

Serokê Komîteya Sûriyê di destpêka gotina xwe de weha got: "Evên ku hatine vêderê xwestekên wan li dijî bitûniya erdê Sûriyê ne û ew hema dixwazin wêneya Sûriyê di civaka navnetewî de reş bikin." Wî liser kuştina Şêx Meşûqê Xeznewî jî axaft û got ku, "Polîsên Sûriyê 5 kes girtine. Wê pirs li wan bê kirin. Kuştina wî kirinek nepolîtîk e, adî ye." Wî bi berdewamî got ku ligora rojnameya Al Hayat ê, ku bi xwe re anîbû, kurê Şêx Meşûq gotibû ku "Destê hikûmeta Sûriyê di kuştina bavê min de tune ye." Nûnerê Sûriyê axaftina xwe berdewam kir û got, "Di Sûriyê de tu discrimination tune ye û hemû kesên ku li Sûriyê dijîn wekhev in."

Bersîva komîteya Kurdî jî ev bû: "Hikûmeta Sûriyê navên gundên me guhertiye. Xwendekarên me ji zankoyan davêjin, muzîka Kurdî qedexe ye, zimanê Kurdî qedexe ye. Dewleta Suriyê dixwaze hebûna miletê Kurd winda bike. Amnesty International jî îro raporek derxistiye û kuştina Şêx Meşûq dike stûyê hikûmeta Sûriyê."

Komîteya Kurd di roja dawî de pêşniyar kir ku di bin siya Yekîtiya Netewan de liser maf û rewşên hindikayiyên li Rojhilata Navîn komîteyek bê damezirandin. Endamê wê hemû hikûmet û hindikayiyên dewletên Erebî, Tirkiyê, Iran û Afganistanê bin. Lê di cîh de nûnerê Sûriyê, Tirkiyê, Îran û Misirê li dijî wê rabûn.



# Hevalcêwiyê partiya Seddam kongra xwe li dar xist



**Hesen Brîm**

Wekî tê zanîn dewleta Sûriyê, çil û sê sale di bin desthilatdariya Partiya Baas (vejîn) ya Sosyalîst ya Erebî de ye. Û dîsa wekî tê zanîn partiya Baas li ser îdeologiya "sosyalîzma netewî (sosyalîzma nasyonal) hatiye avakirin û vê îdologiya xwe bi destê leşkeran pêk tîne.

Partiya Baas, li gor îdeologiya xwe li Sûriyê siyaseta tunebûna Kurdan dimeşîne. Ji bo pêkanîna vê polîtîkayê polîtîkaya partiya Baas li ser çar xalan hatiye dameziran-din: Asîmîlekirin (erebkirin), birçîhiştin, sergomkirin, nezanhiştin.

Ev polîtîka di roja desthilatdarbûna Baasê û vir ve bê rawestan tê meşandin. Baasiyan wekî Kemalîstan ji bo erebkirina Kurdan û wendakirina pirsa kurdî bi destê Mihemmed Teleb Hilal despêka projeyekê hate lidarxistin.

Piştî vê projê ji bo têkiliya Kurdistana Sûriyê, bi Kurdistana mezin re bê birîn, di sala 1973an de Hizam el-Erebî (Kembera Erebî) hate çêkirin. Dirêjahiya Kemberê zêdeyê 300 kîlometir e, firehbûn jî 10-15 kîlometir bû. Di şûna wan de koloniyên Ereb hatin avakirin. Nasnameya kurdî û ziman û çand û tevgera siyasî ya kurdî hate qedexekirin. Di dema desthilatdariya Baasê de her dem di girtîgehan de Kurdên welatparêz girtî bûn.

Beriya Baasê nasnameya 120.000 Kurdan hatibû girtin. Baas siyaseta îptalkirina nasnameyên Kurdan domand. Vê gavê bêhtirî 300.000 Kurd bê nasname ne, wekî biyaniyan li Sûriyê dijîn.

Partiya Baas li Rojhilata Navîn, di du dewletan de desthilatdar bû: Iraq û Sûriye. Piştî şerê Iraqê partiya Baas ya Iraqê ji desthilatdariyê ket. Niha dora hevalcîwiya wî ya Sûriyê ye.

Partiya Baas ya Sûriyê di polîtîka xwe ya derve de sedî sed têk çûye. Amerîka hebûna Baas ya liser hukmê dewleta Sûriyê nema qebûl dike û jiber vê yekê jî biryar û qanûna serfirazkirina Sûriyê û Lubnanê saz kir. Jibo vê pirsê gelek têkilî di navbera welatên Ewrûpî û Yekîtiya Ewrûpayê de hatin lidarxistin. Li aliyê din, Îsraîl bi rejîma Sûriyê re prosesa aştiyê nema berdewam dike. Rola Siûdiya Erebî, Misrê û Tirkiyê ya jibo durustkirina têkiliyên di navbera Sûriyê, Amerîka û Îsraîl de têk çû. Û herweha deriyên mezin yên polîtîka navnetewî ji rêjîma Sûriyê re hatin girtin. Jiber ku ji siyasetmedarên mezin yên navnetewî re xuya bû, ku rêjîma Sûriyê bi çekên xwe û bi pereyên xwe piştgirtiya terorîstan dike û terorîzma dewletê li dijî miletên hundirê Sûriyê bi taybetî li dijî gelê Kurd bikar tîne.

Di vê rewşê de di dewleta Sûriyê de kongreya 10. ya Partiya Baasê li paytexta Sûriyê li Şamê (06-09 Hezîran 2005) hat girêdan. Ji bo hemû hêzên hundir û derdora Sûriyê ev kongre mijara meraqê bû. Pirsa girîng ya vê kongrê, ne kongre bixwe bû. Pirs ew bû ku wê hukmê Baas heta kengî bidome. Ji bo hemû siyasetmedaran xuyaye ku raman û îdeologiya Baas, ya "sosyalîzma netewi" li bazara polîtîka cîhanê, piştî dawiya şerê sar û serketina demokrasiyê, nema tê qebûlkirin. Dirûşmeya ku Baas ji roja bûyîna xwe û vir de bilind dike, qet ji qonaxa êtîka nasyonalîzmê nayê xwar.

Bi giştî, kongra Baas û rêjîma Sûriyê bersivên xwe bi rengekî gelek zelal dan, ku ew li Rojhilata Navîn, di avakirina sîstema demokrasiyê û aştiya liser bingeha pêkanîna mafê mirovan de nabin hevkar. Di kongrê de li ser navê partiyê bi nivîskî û bi navgîniya berdevka kongrê Buseyna Şaban li ser mijar û biryarên kongrê gelek tişt hatin gotin. Bi kurtî ev tişt hatin ser zimên:

Sûriye li dijî "Projeya Rojhilata Navîn ya mezin" e û "dikare li dijî hêzên ku dixwazin îradeya Sûriyê ya serbixwe bidest xwe ve bînin berxwedanê bike..."

Di daxuyanîyê de weha tê gotin; "Berdewamkirina têkilîyan (bi dewletên Îslam û bi taybetî jî bi Tirkîyê û Îranê re) û parastina Rojhilata Navîn..."

(Bêguman ji vê biryarê re du sedem hene: Ya yekemîn, pirsa parastina van rêjîman û ya duwemîn jî pirsa Kurd û Kurdistanê ye.)

Xala 8. di destûra Sûriyê de, weha ye " Partiya Baas hêza birêvebire ji bo dewlet û civaka Sûriyê".

(Baasiyan soza guhartina vê xalê dabûn cîhanê, lê ew nehat guhertin. Heta ev xal di destûrê de bimîne, wê qanûna damezirandin û avakirina partiyan û avakirina demokrasiyê û parastina mafên mirovan cîh negire. Jiber ku mafên siyasî ligor vê xalê tenê ji bo partiya Baas hene.)

Di derbarê Qanûna Partiyan de, ya ku kongrê soza wê dabû, di daxuyaniyê de weha tê gotin: "...Divê partî li ser bingehên netewî neyên avakirin...." (Ev biryara kongrê bi taybetî li dijî hebûna tevgera siyasî ya gelê Kurd e. Lê bi vî awayî û li gor vê biryarê, divê Partiya Baas xwe tune bike, jiber ku li ser bingeheke netewî ya erebî hatiye avakirin.)

Buseyna Şaban, di roja sisiyan de peyamek ji Kurdan re şand. "... li ser erdê Sûriyê tu alên din, ji ala Sûriyê pê ve nabe bê bilindkirin. Eger bê hildan, ew li ser yekbûna Sûriyê xetere û emê bi hemû hêzên xwe -û eger bê xwestin bi hêzên çekdarî jî- li dijî wê kar bikin." (Li gor van gotinan divê tevgera Kurd û civaka Kurd li Kurdistana Sûriyê hêviyên xwe bi Partiya Baas girênede.)

Yek ji biryarên kongrê ev e: "Pêwîste ku problema jimartina li Hesekê ya sala 1962an bê hilanîn û pêşdebirina aborî li Rojhilatê Sûriyê çêbibe."

(Lê divê em bidin xuyakirin ku pirsa Kurd li Kurdistana Sûriyê, ne tenê pirsa nasnameyan e. Ev pirs, pirsa gelê Kurde ku hîn jî li ser xaka xwe bê maf jiyana xwe berdewam dike û ev di hundirê Sûriyê de mezintirîn pirsa siyasî ye.)

Hemû kesên ku hêviyên mezin li ser kongra hevalcêwiyê Partiya Saddam girêdabûn, hêviyên wan têk çûn. Kongrê careke din da xuyakirin ku totalîter û zordar nikarin demokrasiyê ava bikin. Bi gotinek din, "Mêşên reş nikarin hunguv çêbikin."



## Kurtedîroka Partiya Baas ya Sûriyê

**04-07.04.1947**
Kongra damezrandina Baas hate lidarxistin. Du biryarên kongrê yên giring ev in:
*1.* Ideologiya partiyê "Sosyalizma Erebî ye". *2.* Her kesê ku di hundirê sînorên dewletên Ereban de dijî, Ereb e. Eger ew ne Ereb be jî, divê di civaka netewa Ereb de bê pişavtin (asîmilekirin)

**07.07.1947**
Hilbijartin pêk hat. Ji partiya Baas (Efleq û Bitar) kesek neket parlamanê.

**15.11.1949**
Ji bo perlamenê hilbijartin hat lidarxistin. Tenê kesek ji partiya Baas hat hilbijartin.

**05.02.1958**
Yekîtî di navbera Misrê û Sûriyê de pêk hat û ev bû destpêka problêmên di navbera rayedarên Baas û Abdulnasir de.

**28.09.1961**
Yekitiya Misr û Sûriyê têk çû. Hinek ji rayedarên Baas di hikûmeta nuh de cîh girtin.

**Çelê Pêşîn ya 1961**
Ji bo perlamena Sûriyê hilbijartin pêk hat. Ji Baas 8 kes bûn endamên perlemanê. Hejmara endamên perlamanê 142 kes bûn.

**8.03.1963**
Cuntaya serbazên ji Partiya Baas, înqilabek kirin û rêvebirî xistin dest xwe û ev bi navê "Şoreşa Baas" hate binavkirin. Di vê demê de bingeha rejîmeke totalîtar hate avakirin. Di rojên destpêke de karên polîtîkî ji parteyetî ji bo grûpên din hate qedexekirin û di bin gotina parastina prensîpên şoreşê de di ser karên mediyayê bandûr hate danîn.

**23.02.1966**
Hafiz Al-Asad bû wezîrê bergirtinê.

**Îlon 1968**
Kongira partiya Baas ya çaran pêk hat û di hundirê partiyê de du kom çê bû: 1. Komeke Siyasiyan. Serokatiya vê komê Selah Cidid dikir. 2. Komeke Leşkeran bi seroketiya H. Esed. Xwesteka wan avakirina sistemeke eskerî bû. Grûpa eskeran biserket û gelek ji endamên fraksiyona din ji rêxistina partiyê û leşkerî hate bidûrxistin.

**16.11.1970**
Di bin navê "Tevgera Rastibûnê" de H. Al-Asad him xwe ji dijminên xwe xilas kir, him jî serokatiya dewletê, serokayetiya hêzên çekdarî û serokatiya partiyê xist destê xwe, û heya mirina xwe (10. 06. 2000) desthilatdariya wî berdewam kir. Lê di çend salên dawiya jiyana xwe de, kurê xwe Beşar ji bo cihê xwe hazir kir.

**10.07.2000**
Referandûma hilbijartina Beşar Esed ji bo serokatiya dewleta Sûriyê hat li darxistin.

**17.07.2000**
Beşar Esed sonda serokatiya Sûriyê vexwar û gotina yekemîn a serokatiyê li ser tribûna perlemana Sûriyê de. Di axavtina xwe de soz da ku di politika xwe ya derve û hundir de "pêşdebûn û nuhbûnan" çê bike.

www.arsiv.com

# Yên pistgiriya Amerîkayê dikin, hinekî din jî cesaret!

Ev demeke dirêje girîngtirîn pirsa Tirkiyê çiye?

Ger em li xalên rojevên serdanên Serokwezîrên xwe yên ji bo Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê binêrin emê bersîva vê pirsê jê derxînin:

Di van demên dawî de, ka em piçekî din jî teng bikin, ji dagirkirina Iraqê û vir de di hemû serdanên Amerîka de, kîjan mijar di serê rêzê de cîh digire?

"Mijara derxistina mîlîtanên PKKê ji çeperên wan yên li çiyayên Bakurê Iraqê."

Tirkiyê welatekî xerîb e.

Serokwezîrên Tirkiyê li hundir bi her awahî dixwazin bidin nîşandan ku ev bûyer ne pir girînge; lê li derve jî bi çavê girîngtirîn pirsa Tirkiyê lê dinerin.

Ji ber çi? Ji ber ku li gora nêrîna bicîhbûyî, PKK ji bo Tirkiyê tehdîdek mezin tê nîşandan.

Ji bo PKKê dibêjin rêxistinek terorî ye, lê berpirsekî Amerikayê birehetî dikare vê gotinê bike: "Hûn ji me dixwazin ku em li dijî çiyayê Qendîlê operasyonê lidarbixin. Ji bîr nekin ku hûn jî di operasyona xwe ya li vî çiyayî de biserneketibûn."

Çi xerîbe ku ez heta niha li tu derê lê rast nehatime ku berpirsekî dewletê bersîva van pirsan daye. Maneya wê ewe ku mijara PKK ji mijara rêxistinek terorîst zêdetir e.

Belkî ji ber vê yekê ye, ji roja ku Erdogan bûye serokwezîr û heta niha, di hemû hevdîtinên li gel Serokê Amerikayê de, ev babet bûye mijara bingehîn. Di hevdîtina dawî de jî wiha bû.

Heta ev mijar li Tirkiyê wek sedema dijminatiya Amerîkayê ya bingehîn tê pêşkêşkirin. Tê gotin ku, "Ger Amerîka di mijara PKKê de gavekê bavêje, wê dijminatiya Amerîka li Tirkiyê, di nava şevekê de kêm bibe."

Di eslê xwe de ev gotin dibin delîl ku li Tirkiyê raya gîştî, ji aliyê dewletê ve çawa tê xwestin wiha tê birêvebirin.

Întibayek wusa tê dayîn ku tu dibêjî qey dijminatiya Amerîka di bin kontrola dewletê de ye û mimkune ku bi jesteke Amerîka di şevekê de meyla rayagîştî bê guhertin.

Em gelekî baş pê dizanin ku li welatê me medya li ser rayagîştî xwediyê bandoreke mezine û ji sinorê gotina dewletê dernakeve, ji ber vê yêkê jî em dikarin bêjin ku ev mimkun e.

Em ji kîjan alî ve lê binêrin jî, madem ku ev mijar di hevdîtinên bi serokên Amerikê re ji aliyê Serokwezîrên Tirkiyê ve wek girîngtirîn pirs tê pêşkêşkirin, ev tê wê maneyê ku ev ji bo Tirkiyê pirsek



**Koray Düzgören**

gelekî girîng e.

Lê di vê pirsa girîng de, di navbera Amerîka û Tirkiyê de fikrên nakok hene. Em êdî vana gelekî baş dizanin. Piştî serdana dawiyê ev cudahî bi awayekî vekirîtir tê axaftin.

Rayedarên Amerîka dixwazin ku ev pirs ji aliyê Tirkiyê ve bê çareserkirin. Ji rêvebirên Tirkiyê re dibêjin bêyî ku hûn bi çavekî polîsiye li mijarê binêrîn, divê hûn riyên cur be cur yên aştiyê biceribînin. Heta berpirsên leşkerî yên Amerîka, ji berpirsên leşkerî yên Tirkiyê re riyên çareserkirina sivîl pêşniyar dikin. Belkî vekirî nabêjin, lê sedî sed di wê baweriyê de ne ku pêwîste Tirkiyê helwesta xwe ya li beramberî pirsa Kurdî di berçavan re derbas bike. Çimkî Amerîka, beşekî girîng ji planên xwe yên Rojhilata Navîn, li ser pêwendiyên xwe yên bi Kurdên Iraqê re ava dike. Û ji bizaveke (hareket) ku bikaribe li Bakurê Iraqê di nav Kurdan de bibe sedema pêldanên girîng, direve.

Êdî herkes dizane ku Amerîka dema ku rewş li Iraqê normal bibe û dagirkirin bi dawî bê, bi xêra bingehên xwe yên li Bakurê Iraqê wê li herêmê bibe hêza jêneger. Jixwe di çarçoveya vê planê de wisa kir ku Kurdên Bakurê Iraqê wek birêvebiriyek taybetî di nava avahiya federal ya Iraqê de cîh bigirin. Di gelek warî de rê li ber Kurdan hat vekirin.

Tirkiyê di destpêkê de li dijî federalkirina Iraqê bû. Herweha di bin kîjan navî de be bila bibe, ew li dijî avahiyek ku karibe rê li ber serxwebûna Kurdan veke radiwestiya. Bi vê armancê Tirkiyê bi salan polîtîkayên "xeta sor" meşandin. Heta demekê xwest vê mijarê bike sedema şer jî.

Lê piştre hêdî hêdî li himberî rastîniya Amerîka –ne rastîniya Kurd- ev polîtîkaya xwe terk kir. Niha di nav sazûmana federal ya li Iraqê de, sazûmanek otonomiya Kurdan ku li gorî herêmên din bêtir xwedî îmtiyaze, pêkhat. Meclîsa xwe hilbijart. Vê meclîsê di civîna doh de serokê PDKê Mesut Barzanî kir Serokê Herêma Kurdistana Iraqê.

Êdî îtîrazek Tirkiyê jibo vê avahiyê nîne. Rêvebiriya Kurd tehdît nahesibîne. Ya rast jî ev bû. Tirkiyê êdî wê bi Barzanî re bi sîfetê Serokê Herêma Kurdistanê hevdîtinan bike. Wek tê dîtin qebûlnekirina peyva Kurdistanê, bi kêrî karekî nehat.

Niha Tirkiyê eynî rikê di mijara PKKê de dike. Di vê mijarê de jî Amerîka ne bi fikirên Tirkiyê re ye û her bi ya xwe dike. Di vê niqtê de divê ji wan kesên ku di pêwendiyên Tirkiyê û Amerîka de başkirinê diparêzin, bê pirskirin: Madem ku hûn bi Amerîka re bi danîna pêwendiyên baş re ne; di mijara Iraqê de, di mijara Bakurê Iraqê de cîh bi cîh we got ku Amerîka xwedî heq e; niha jî bi cesaret derkevin û bêjin ku ev pirsa PKKê jî pirsa Tirkiyê bi xwe ye... Bila serokwezîrên Tirk û berpirsiyarên din li himber serokên Amerîka û rayedarên sivîlleşkerî ji hustuxwariya bêsedem rizgar bibin.

Ji dêvla ku Tirkiyê bi van pirsan re mijûl bibe, gelo nikare bibe dewletek ku mijarên gerdûnî û jîyandar tîne ser zimên û bi vî awayî zorê li Amerîkayê bike?.

**Yeni Şafak 13 Hezîran 2005**

# Ger herkes Tirk be tengasî çi ye?

Doza Egitim-Senê, piştî biryara ku ji aliyê çil û pênc endamên Lijna Gîştî ya Hiqûqa Dadgeha Bilind ve bi yekdengî hat wergirtin, hindik maye ku bi "girtinê" bi dawî bibe. Ji ber ku êdî riyên hiqûqa hundirîn qediyane, berpirsên sendîkayê serî li Dadgeha Mafê Mirovan ya Ewrûpa didin...

Ew xwediyê sed û pêncî û çar endam û nod û neh şûbeyan e. "Sucê" mezintirîn sendîkaya Tirkiyê ewe ku di rêznameya (destûrname) wê de wiha hatiye nivîsîn: "Li ser riya heq û azadiyên bingehîn yên hemû ferdên civakê, ew diparêze ku herkes perwerdeyek demokratîk, laîk, ilmî û bêpere bibîne, bi zimanê xwe yê zikmakî xwendinê bike û çanda xwe pêş de bibe". Ev îfade beşekî xwezayî yê peymana ILO û Peymana Mafê Mirovan ya Ewrûpa (PMME) ye ku Tirkiyê bixwe jî îmze kiriye. Ev rêzik li gora lijna ku di serê sîstema me ya hiqûqê de cîh digire, xeter e, û weke "azadiyek ku dikare bê sînorkirin" hat terîf kirin. Çimkî li gora wan, îfadeya ku behsa wê dibe, dikeve xala 10an ya PMME û wiha ye: "Azadiya raman û îfadeya ku jibo herkesî hatiye naskirin, dikare jiber hinek sedemên pêkanîna ewlekariya netewî, yekseriya erd an sazûmana gelemperî (nîzama gîştî) bê sînorkirin." Ji ber ku ev yek "azadiya raman û îfadê" bû, di mijara xwendina bi zimanê dayikê de tunebûna çalakiyeke pratîk ya Egitim-Senê wek sedemek di lehê wê de nehat hesibandin. Li gora Lijna Gîştî ya Hiqûqa Dadgeha Bilind "xwendina bi zimanê zikmakî" di encamê de mijarek ewlekariya netewî bû ku karîbû yekseriya erdê têxe xeterê.

Lê bê ku lijne têkeve mijara bê ev xwendin çawa û çima encameke di radeya ewlekariya netewî de derdixe holê, bingeha sedema xwe danîbû ser hinek xalên Zagona bingehîn. Bi gotineke din lijneyê, ligel ku xwediyê nirxandinek sosyolojîk û siyasî ye; hewl da ku mijarê bi temamî weke binpêkirineke hiqûqî bide nîşandan. Lê muhakemeya ku hat kirin, bû nîşana wê rastiyê ku hiqûq li vî welatî bûye hacet (wesaît) û ew vê yekê di dema karkirinê de diyar dike. Mantiqê Lijnê xwe dispêre nirxandina sê xalên Zagona bingehîn: Xala 3 (Zimanê zikmakî yê Dewleta Tirk, Tirkî ye), xala 36, (Her kesê ku bi pêwendiyên



**Etyen Mahçupyan**

hemwelatiyê, bi Tirkiyê ve girêdayî ye, Tirk e), û xala 42 benda 6. (Di dezgehên perwerdeyî û xwendinê de ji xeynî zimanê Tirkî, tu zimanekî din ji hemwelatiyên Tirk re nikare wek zimanê zikmakî bê xwendin û fêrkirin). Bi kurtayî; madem ku zimanê dewletê Tirkî ye û hemwelatiyên vî welatî jî "Tirk" in, ji van însanan re ji bilî Tirkî tu ziman wek "zimanê zikmakî" nikare bê xwendindan... Bêguman li vir, tiştê ku pêşin bê hişê mirov, wê însanên welatê me yên nemusilman bin; jiber ku ew bi zimanê zikmakî xwendinê dikin. Wê demê zimanê "hinek Tirkan" ne Tirkî ye... An pêwiste bê qebûlkirin ku ev însan ne Tirk in. Ger beşê yekem rast be, em mecbûrin bifikirin ku dibe zimanê hin Tirkên din jî ne Tirkî be. Ger beşê duyem rast be, divê bê dîtin ku hemwelatîbûn ji bo Tirkîtiyê ne şertê bingehîn e. Çimkî eşkereye ku hemû nemisilmanên li vî welatî bi pêwendiyên hemwelatiyê bi dewletê ve girêdayî ne. Wekî ku tê famkirin "Tirk" bûn tenê bi pêwendiyên hemwelatîbûnê ne mimkin e û hin taybetiyên din divên. Mixabin lijnê ev nuans rohnî nekirî ye...

Lê ya herî balkêş, di rêznameya Egitim-Senê de behskirina "bi zimanê zikmakî xwendina ferdan" e. Ango behsa nasnameyek taybetî mayê kirin... Ji aliyê din ve madem ku li gora lijnê herkesê ku li Tirkiyê dijî Tirk e; hemû "ferd" jî mecbûrin ku Tirk bin. Wê gavê bi zimanê xwe xwendina "ferdan" ji bilî xwendina Tirkan bi Tirkî tiştekî din îfade nake. Di vê rewşê de lijne li dijî çi derketiye? Gelo li dijî "ferd"bûna Tirkan e?

**Zaman 13 Hezîran 2005**




Dengê Kurdên Anatoliyayê Bîrnebûn, hejmara xwe ya havînê derxist



## Jinekolog, mêrekolog, dînekolog. Prof. Dr. Fatê Were Civatê



***Xaltîka Fatê, min bi salan di nav partî û rêxistinên Kurdî de karkir, lê min tutişt biser nexist. Min kumê Xelo li serê Celo kir dîsa fêde nekir. Ez berî çend mehan di komcivîna eşîrekê de beşdar bûm û bi xêra hinekan ez bûm çawîş. Îcar min go fersende û ezê ji xwe re li başûrê Kurdistanê karekî baş bikim. Piştî lêkolînek berfireh, min dît ku li başûr febrîka kondoman nîne. Ji xwe Kurdekan nizanin bê kondom çine û ji febrîkê zêdetir zarokan çêdikin. Bi xwedê fêde û karek mezin di firotina Kondoman de heye. Ez dibêjim ezê febrîka kondoman li Hewlêrê vekim û Kurdekan hinekî medenî bikim, tu dibê çi gelo?***

**Şêxbat**

**Nadoyê kondomfiroş / Bakur**

Hayho, hayho, hayho! Lao Nado, malxirab, min jî dixwest ez li Hewlêrê febrîka hebên Viagra vekim û Kurdekan har bikim jibo Kurdekan bi şev û roj bazdin ser hev û tuxmê xwe zêde bikin. Ev saleke ez di dorê deme lê dora îhalê nehat min. Îcar lawkê mino ma te kengî îhala kondoman stend gidîî!! Hey bêwîjdano, lao dewleta Tirko jî digot „hejmara Kurdan pir e, emê kondoman linav wan bela bikin jibo tuxmê wan biqele“ û li Kurdistanê dest bi belakirina kondoman kirin. Îcar Nadokê mino, qey tu jî wek dewleta Tirko dixwazî tuxmê Kurdan biqelînî û wan bixesînî hêê! Jixwe bi xêra mêrik piçek aqil di serê Kurdekan de maye, çavê te lêye tu wan şevekorî biki bêbexto! Serê xwe bilasebeb meêşîne û Kurdekan aciz meke haa! Bi serê te kondom-mondom xwe liber fişekên Kurdekan nagirin. Ha jixwe hebe, heger kondom qul bû û teqya, fişekin bi tofelaqî li te nekevin ez qurban!

*

***Xaltiya Fatê, gene ben, Xançepekli Mihê! Yao bîz sormazsax sen sormisan haa! Xaltîkimizdir dedix, bîzîm taximdendir dedix, nankorlix yapma! Welhasilîkelam meseleye geliyem. Dûymişem bizim ga Osman siyasetten elini ayaxini çexmiştir ve bûgunden sonra babalix gorevini yerine getirecexmiş. Kîmisî diyî Osê misyonini bitirdi ve otirdi. Kîmisî diyî Osê babalixtan sonra yûfka yurexli oldi ve qirmizî qanî gordixinde bayilip duşi. Kîmîsî de diyî Osê gelecexin kuçuk Ocalanini yetiştiri ki Kurdler seroksiz qalmasin diye. Wele bi serê te, bizîm Xançepekli pêxwaslerîn qafasî gêjomêjo olmiş. Hele Xaltiya Fatê ye bir danişax dedix, aceb bûnin altinde ne vardir ne yoxtir diye! De haydê, cevabini beklirix haa!***

**Xançepekli Mihê / Amed**

Oxlim Mihê, hey nankor oxlî nankor! Oxlim îşîniz gucunuz provokatorlix ve fesadlix yapmaxtir. Bu fesadlixiniz yuzunden dişarî çixamiyem, çiqtiximde de maske taxiyem kî kîmse tanimasin da poxipoxine gîtmiyem diye. Oxlim siz bizim Osman den ne îstisiniz yao!? Ga Osman dediler adam general oldî, nemêr Osman dediler adam baba oldî. Kerxaneci dediler adam namûsiyle-helaliyle evlendî. Qirmîzî qanî gorip bayilî dîyîler, ê oxlim oldirdiklerî Kurd gençlerinin qaninî gore gore biraxin de bîrez bayilsin ma dinya bozilî nankorler! Ma sîzin gîbî saxe-sole jîlêt mî atsin loo! Wele bi serê te, şûni-bûni bîlmem, ama adam dôxrî bîr qerar verdî, helal olsin! Nermik-germik kuçuk Ocalanî buyutecex, evîrecex çevîrecex, baxarsin gelecegin Konfederalîzm seroki olir, kîm bîlir oxlim! Zavallî amcasî o murada ermedî barî kendîsî ersîn ma dinya bozilmî! Anadinmî oxlim, Mihê!!

*fate@peyama-kurd.com*

## Bersivên hejmara berê

**Çeperast**

1. Ciwamêr / alem 2. Or / maker / aza 3. Nareb / al 4. Îrûbreb / îg 5. Anî / îom / amo 6. Avakar / rewa 7. Sa / aloz / dara 8. Êdî / evînî /ar 9. Enîb / nebat 10. Erk / red / ev 11. Wya / ozan / alî 12. Rariz / nok / av

**Serejêr**

1. Conî / asê / ewr 2. Ira / avaderya 3. Rîna / înkar 4. Amerîka 5. Mabû / alebroz 6. Êk / bîrov / ez 7. Repro / zîndan 8. Emr / ne / no 9. Ab / edîbe 10. Lal / awa / ava 11. Ez / îmarat / la 12. Mango / ar / hîv



**XAÇERÊZ**

**SEREJÊR** 1. Ruh, rewan, tîn / vexwarinek bi alkol, ava tirî / cejn, şahî 2. Dermanekî biriqandinê(paşûpê) / hedin, sebir 3. Binaskirin dan, pêşkêşî (paşûpê) / car, lêxistin 4. Bixwere birin, hilgirtin / kûsiyê nav avê, lawirek 5. Bi Ingilîzî „bi xatirê te“ / kurtenivîsa otomobîlê / sertîpên erê,ba,ra 6. Nan jê çêdibe / pîrozkirina filîmekî, roja pêşîn / gotina qebûlkirinê 7. Fêkiyek / kesê ji başûr 8. Qîr, zîr, hîr / milletek / bêav, ziwa (paşûpê) 9. Bi Erebî „kurê min“ / tiştên hûrkirî, arvan 10. Pêxember, qencê xwedê / merkezî, dinav de 11. Sertîpên garan, ra / paytextê Lîtwanyayê / bi Ingilîzî tîm, kom 12. Cama televizyonê / notayek / ji dê û bavekî, brader

**ÇEPERAST** 1. Mêrkuj, mirdar / gayê ciwan, golikê nêr 2. Teref, hêl, navekî mêran / ji gwîz û bastêqê cêdibe / wezîfe, kar 3. Liser nexwesan tê xwendin (pasûpê) / keleh, qesir, fal, remildank (pasûpê) 4. Ciwanga, gayê xort /vexwarinek bi alkol 5. Sembola nîkelê / hêsan, rihet / rojek 6. Dermanek kîmyewî / navbera gewrî û zik, sîne 7. Qebûlnekirin, nakirin / tiştên veşartî, pîroz / li Swîsreyê navê çemekî 8. Hewa, bûyerek xwezayî (paşûpê) / roj, şewq / ava nepaqij, ava cilan 9. Mey, vexwarin / ezbet, malbat 10. Rastûrast, rastgo / astengî, rêlibergirtin (paşûpê) 11. Serdana pez, şîrdotin / hebûnek xwezayî 12. Îdare, aborî, meşandin / ewleyî, asayîş, bawerî (paşûpê).

## Remildank



**Beran** (21.03-20.04)
Hûn vê heftê kêfşa ne. Enerjiya we zêde ye. Bi hêrs nebin, hinek terz û adetên xwe biguherin.



**Gamêş** (21.04-20.05)
Hûn berpirsiyariya xwe zanin. Berî go hûn li ser projeyekê serê xwe bêşînin, baş bifikirin.



**Cêwî** (21.05-21.06)
Di warê aborî de pêşketinên baş dixuyin. Radestî xwestekên xwe nebin, bi hemd bilivin.



**Kevjal** (22.06-22.07)
Têkiliyên xwe û dost û xwediyên xwe xiranekin. Nûçeyên dûriyê hene, rêwîtî dixuye.



**Şêr** (23.07-22.08)
His û zizbûna we zêde dibe. Bala xwe bidin kar û mala xwe. Xwingerm nebin, berfireh bin.



**Simbil** (23.08-22.09)
Hûn afirmend in, lê lingên xwe zêde dirêj nekin. Çavê derûdorê li ser we ye. Haydarê xwe bin.



**Mêzên** (23.09-22.10)
Hûn ji acizî û tengasiyê xilas dibin. Kirinên xwe li bêjingê xin, xwe bipîvin, xwe zelal bikin.



**Dûpişk** (23.10-21.11)
Pirsgirêkên xwe ji herkesî re nebêjin. Dost hene, dijmin hene. Berî herkesî li xwe bifikirin.



**Kevan** (22.11-21.12)
Li ser projeyên xwe rawestin. Hinek nûçe karin we têxin heyecanê. Erênî bin, bê hêvî nemînin.



**Kovî** (22.12-19.01)
Pirsgirêkên navmalbatî mezin nekin. Di bin bandora hissên xwe de nemînin, ruhtenik nebin.



**Satil** (20.01-18.02)
Hinek bûyer bandorê li we dikin. Xwestekên we zêde dibin. Radestî bûyeran nebin, bi aram bin.



**Masî** (19.02-20.03)
Di aborê de nîşanên erênî dixuyin. Hûn di bin bandora teknolojî û nûjeniyê de dimînin

Amadekar:
**Hêvîdar Zana**



## Pistî jenosîda gelan, jenosîda dîrokê!.

# Bila dîrok di bin avê d

Wê Dewleta Tirk di meha Cotmehê de dest bi çêkirina Bendava Ilisu bike û wê beşek ji dîroka me ya qedîm, ya ku xwe digihîne 10 hezar salî, binav bibe.

Kes nizane, ev bajarê dîrokî kengî û ji aliyê kê ve hatiye avakirin. Lê belê ji şikeft û kevneşopên din diyar dibe ku mirovahî beriya sedsalan li Heskîfê bi cî bûye. Hesenkêf bi mîrata xwe ya dîrokî û çandî di şaristaniya Kurdistanê û herêmê de xwediyê cihekî giring e. Heskîf, li kêleka Aşûrî û Kurdan bûye mal û paytexta gelek medeniyetan. Ligora hinek çavkaniyên dîrokî Heskîf xwediyê dîrokeke kevnare ku xwe digihîne 10 hezar salî. Di van 10 hezar salan de gelek medeniyet û kultur hatine, jiyane û ligora xwe mîratên giranbuha li dû xwe hiştine. Bîzansî, Ebbasî, Merwanî, Sasanî, Aşûrî/Suryanî, Artûkî, Eyyûbî û Kurd yên herî bi navûdeng in. Ligora Ansîklopediya Islamê di sedsala pêşî ya klasîkî de navê bajêr Cepha (Cefa) ye û ew Navenda Metraniya Suryaniyan e. Heskîf ketiye bin desthilatdariya Ebbasî, Hemdanî, Merwanî û Artûkiyan û ji Artûkiyan re paytextî jî kiriye. Jiber şikeftên xwe yên bi navûdeng ku ji bo parastinê cihên baş bûn, wê her demê bala hukumdaran kişandiye ser xwe.

Kurdên Eyyûbî di sala 1232ên Mîladî de Hesenkêf ji destê Artûkiyan derxistin. Ew di wê demê de bûn armanca êrîşa Moxolan. Bi sedema talana Moxolan, herêm serûbinî hev bû û hilweşiya. Piştî derxistina Moxolan, di destpêka sedsala 14an de Kurdên Eyyûbî Hesenkêf careke din ava kirin. Îro liser piraniya berhemên Heskîfê yên dîrokî mohra Kurdên Eyyûbî tê dîtin. Di dem û dewranekê de, Melîk Xelefê Kurd dibe hukumdarê Hesenkêf. Ew weke "Xelefê Çavsor" tê binavkirin û bi şer û mêraniya xwe nav daye. Dema ku hukumdarê Dewleta Akkoyunlu yê bi navê Hesenê Dirêj tê herêmê, ew fermanê dide komikên Tirkmenan ku Kurdistanê dagir bikin. Komikên wan li dora Hesenkêf dicivin, kelehê dorpêç dikin û dest bi şer dikin. Piştî demekê Tirkmen fêm dikin ku ew bi şer nikarin biserkevin û dest bi dek û dolaban dikin. Ew diçin cem biraziyê Xelef û doza kuştina apê wî lê dikin. Ger ew apê xwe Xelef bikuje wê wî bikin hukumdarê herêmê. Biraziyê Xelef wî di himamê de dikuje, lê Tirkmen soza xwe bi cî naynin û ew bixwe hukumdariya Hesenkêf dikin.

Ev bajarê qedîm, di sala 1524an de ketiye destê Osmaniyan. Di demên dawî yên Osmaniyan de Hesenkêf girêdayî bajarê Midyadê bû. Di dema Komara Tirkiyê de, di sala 1990î de Hesenkêf bû qeza û bi wîlayeta Batmanê ve hat girêdan. Ev bajarê kevnar bi mizgeft, qesir, tirb, hemam û avahiyên xwe yên antîk, wekî muzeyeke servekirî tê qebûlkirin.

Wê ev muzeya servekirî ku tijî mîrata dîrokî ye, jiber avakirina Sentrala Hîdroelektrîk û Bendava Ilisuyê binav bibe.

Projeya Bendava Ilisuyê beşek ji Projeya GAPê ye û wê liser ava Dîclê li herêma Hesenkêfê were pêkanîn. Piştî Sentral û Bendava Atatürk, ev ya herî mezin e. Eger ku dest bi çêkirina Bendavê bibe wê di nava
senkêf bi ter
bimîne.

Tirkiyê d







# e nemîne

nd salan de He-
mî di bin avê de

sala 1996an de

jibo çêkirina Bendava Ilisu dest bi lêgerîna şirîkên navnetewî kir. Di wê demê de li Ewrûpa şîrketên Swîsrî yên wekî Sulzer Hydro û ABB (şîrketeke Swêdî-Swîsrî ye), şîrketa Balfour Bettie ji Îngiltereyê, Impregilo ji Îtalyayê, Skanska ji Swêdê, Nurol, Kiska û Tekfen jî ji Tirkiyê peymana çêkirina bendavê îmze kirin. Di aliyê aborî de wê ev proje ji aliyê Bankeya Yekîtî ya Swîsreyê (Union Bank of Switzerland-UBS) ve bihata piştgirîkirin. Swîsreyê dît ku avakirina bendavê di aliyê siyasî de projeyeke ne hêsane û dest ji piştgiriya aborî berda. Lê belê Brîtanyayê li beramberî nerazîbûna opozîsyonê jî xwedî li projeyê derket. Lê belê dema ku encamên lêkolînan diyar bûn û hat dîtin ku proje ji ber bêtedbîriyê dibe sedema wendabûna dîrokeke kevnar, hikûmeta Ingilîz ket tengasiyê. Di encama nerazîbûna rêxistinên parastina hawîrdorê û mafên mirovan de, şîrketa Balfour Betty (Brîtanya) daxuyaniyek da û diyar kir ku ew destê xwe ji projeya avakirina bendavê dikşîne.

Wê Bendava Ilisû û Sentrala Hîdroelektrîk di salê de 3,8 Milyar KWH ceyran biafirîne, lê wê temenê wê ne hewqasî dirêj be. Ligora pisporan wê ev sentral bikaribe herî zêde 50 salî kar bike. Ango piştî 50 salî êdî wê sentral û bendav bêkar bimînin. Wê dîrokeke kevnar bibe qurbana bendaveke ku temenê wê bi tenê dikare xwe bigihîne 50 salî. Ligel wendakirina dîrokê, wê çemê Diclê jî ziyaneke mezin bibîne. Gemara sentralê, hesin û gemara avakirinê wê biherike Diclê.

Avakirina Bendava Ilisuyê jî wekî projeyên GAPê yên din, bêyî ku lêkolîneke bi rêkûpêk di derbarê bandorên neyênî yên sentral û bendavê de çêbibe dest pê kir. Rayedarên dewletê di daxuyaniyên xwe de didin zanîn ku wan hinek lêkolîn çêkirine, lê belê li gora hinek pîvanên navnetewî yên ku Tirkiyê bixwe jî mohr kirine wê texrîbatên mezin çêbibin. Dewleta ku di sala 1978an de Hesenkêf wekî warekî ku divê bê parastin îlan kiribû, bixwe li dijî biryara xwe derket û warê dîrokî kir qurbana hinek berjewendiyên siyasî û aborî. Herçiqasî gelek şîrketên navnetewî xwe ji konsorsiyûmê kişandibin jî, Dewleta Tirk heta niha nexwestiye guhertinan di projeya Bendava Ilisu de çêbike. Ji aliyê gelek saziyên navnetewî ve projeyên ku bibin bedîla Bendava Ilisu û nehêlin ku Hesenkêf wenda bibe jî hatine pêşniyar kirin, lê Dewleta Tirk guh nedaye kesî. Ew baş dizanin ku hebûna miletekî, bi dîroka wî ve girêdayî ye. Jiber vê yekê heta ji destê wan tê dixwazin şopa ku bavûkalên me di dîrokê de hiştine wenda bikin. Ew dixwazin bi çêkirina Bendava Ilisû 2 çûkan bi kevirekî bikujin. Wê li aliyekî bihêlin ku nêzîkî 100 hezar mirov dest ji cî û warê xwe berde û derbeder bibe û li aliyê din jî wê beşekî ji dîroka me ya kevnar tune bikin. Dewlet vê projeyê, ne bi tenê jibo berjewendiyên aborî birêve. Îcar berî ku neviyên Osmaniyan dest bi vê talana dîrokî bikin, divê Kurd tevayê sazî û dezgehên navnetewî yên dîrokhez rakin ser piyan û qefle bi qefle herin nobeta Hesenkêfê bigrin. Her kevirekî ku li wir binav bibe, wê beşekî ji hebûna me jî bi xwe re bibe. Berê xwe bidin Heskîfê! Dibe ku sibe dereng be.





**Berî ku neviyên Osmaniyan dest bi vê talana dîrokî bikin, divê Kurd tevayê sazî û dezgehên navnetewî yên dîrokhez rakin ser piyan û qeşe bi qeşe herin nobeta Hesenkêfê bigrin. Her kevirekî ku li wir binav bibe, wê beşekî ji hebûna me jî bi xwe re bibe. Berê xwe bidin Heskîfê! Dibe ku sibe dereng be.**





**Navenda Zelal:**
**Trink-Zel (Köln)**
**Tel.:0221 376 24 05**

**Bayiyên Zelal**

AKCAN GmbH
*Hamburg*
*Tel.: 040 723 402 96*

LIZA GmbH
*Berlin*
*Tel.: 030 390 380 30*

ESD Softdrink Gmb
*Mannheim*
*Tel.: 0621 318 76 70*

TRINK-ZEL II
*Düsseldorf*
*Tel.: 0211 49 62 150*

CAN GETRÄNKE
*Essen*
*Tel.: 0201 289 74 17-18*

TRINK-SEM
*Dortmund*
*Tel.: 0231 981 86 23*

HARRAN GmbH
*Fellbach*
*Tel.: 0711 592 08 64*

CHAPLIN GETRÄNKE
*Bremen*
*Tel.: 0421 691 96 78*

EURO-FRESH-FOOD GbR
*Erfurt*
*Tel.: 0361 26 27 516*

TRINK-ZELI
*Köln*
*Tel.: 0221 977 63 11*

NERGIZ
*Tel.: 02562 22 168*

# Jin û hinek rastî

**Kadim Kan**



Dê û bav rûniştibûn û li televizyonê dinêrîn.

Pîrekê bawîşk anî û got; Ez îro pir westiyame, ezê herim û razêm. Qedehên çay û çaydan danî ser tepsiyê û derbasî mitbexê bû. Nizanîbû ka sibê çi xwarinê bi xwe re bibe ciyê kar ,Hema çend babolk-sandivîç ji bo xwe û mêrê xwe çêkir. Fêkiyê jiber mayî jiser masê komkir û avêt ciyê ziblê.

Fikirî, ka wê jibo sibê êvarî çi xwarinê çêke û ji sarincê hinek tişt derdist, xwêdank û şekirdanka ku li ser masê bû danî ciyê wê. Xwarina ku wê zarok serê sibê bixwin danî sarincê.

Di dû re,çû cem makîna cilşûştinê, cil jê derxist û aliqand. Rojname û lîstokên zaroka komkir. Pirtûkek ketibû bin masê, hilanî û bir li ciyê wê danî. Hinek av da gulên ber pencerê.

Li deftera xwe ya adresa gerî û dît. Kertek jibo rojbûna meta xwe ya extiyar zû bi zû nivîsand. Zanîbû ku eger jibîr bike wê deh cara bixe bîra wê.

Çavê wê bi kirasê mêrê wê ket û biryar da ku bitewîne û deyne ciyê wê. Çû, rûyê xwe şûşt krêma şevê têde da, diranê xwe şûşt û porê xwe şe kir.

Gava ku mêrê wê çû avrêjê (tualetê) lê mêzekir û got; Min digo qey tu razayî?

- Ez li ser rê me.

Peyde çû oda zaroka cil û gorê wan ê qirejî komkir. Deriyê derve kontrol kir, cilê ku wê sibê li xwe ke amade kir. Seeta ku wê wan şiyar bike da ser seet şeşa. Lihêfa xwe û mêrê xwe vekir û balîfek biçûk xist bin balîfa mêrê xwe da ku dengê xirîniya wî hinekî kêm be!

Mêrê wê ji aliyê din bi dengekî bilind û aciz got, eehh di televîzyonê de jî tu tiştekî baş nîne, hema ez jî bêm û razêm, çû û raza!! Kin û kurt, got û kir

Wextekî din ciyekî din

Weciniqî û çavê xwe vekir. Jixwe pirsî gelo seet çend e? Çû zarok şiyar kir. Bi lez xwarin da ber wan. Wexta ji cem keçika biçûk vegeriya zaroka xwarin xwaribûn. Cilê xwe lixwe kirin û çûn xwendegehê. Firax komkir û dest bi karê malê kir.

Keçika biçûk bi qîrîn şiyar bû. Çû ew aş kir.

Peyde cilê qirêj komkirî xist teştê . Av germ kir û dest bi şûştinê kir.

Keça wê dîsa giriya. Bilez çû cem keça xwe û şîr dayê.

Cil aliqand, dîsa çû cem keçika biçûk lê mêzekir. Keçik, bi vijikê ketibû û binê xwe lewitandibû. Cilê wê gewirand. Çû paçê wê şûşt. Hat û destê xwe da eniya keça xwe.

Di berxwe de got:

-Xwedê bike ne nexweş be.

Livîna qat kir û bir li kulînê danî, peyde dest bi paqijkirina erdê kir, çû dîsa li keça xwe mêzekir.

Li derve baranê destpêkir. Çû balkonê cil komkir

Zarok ji xwendegehê vegeriyan, ji serî heta binî şil bûbûn, kincên wan gewirand. Firavîn jibo wan çêkir, piştre firax şûşt.

Keça biçûk dîsa giriya .

Hewl da ku wê bi xew ve bike. Zaroka pir qelebalix dikirin bi wan re şer kir.

Fikirî, ka jibo şîva êvarê çi çêke. Elektrîk çû. Lampa gazê pêxist. Dest bi xwarina êvarê kir.

Keça biçûk şiyar bû, xwêdan dabû, kincên wê gewirand.

Bav hat malê. Bi zarokên mezin re hinek mijûl bû, dû re çû li keçika biçûk mêzekir, keçik şiyar bûbû û kêfa wê li cîh bû. Wê da ber hembêza xwe û hat li ser sifrê rûnişt. Wexta dît ku xwarin çiye, li pîreka xwe mêzekir û bi dengekî bi kerb got:

-Keçê tu heta êvarî li malî, hema te xwarinek xweş çêkira.

Pîrekê got:

- Bi wê kelûmel-melzeme- ev xwarin çêdibe. Li hevdu tûj mêze kirin.

Pîrekê firaq komkir û dest bi şûştinê kir. Dû re çay keland, bir cem mêrê xwe û li cem wî rûnişt, da ku li televizyonê temaşe bikin. Hinek rûnişt, dû re bawişk hatin wê û got:

- Ez îro pir westiyame ezê .....

Kurtenûçe

**Zagros TV dest bi weşana xwe kir**




Televizyona Zagros (wêne ji Peyamnêr) ku weke kanalek herêmî weşana xwe dikir, dest bi weşana xwe ya satelîtê kir.

Zagros ji Kurdistanê weşana xwe dike û liser van frankahan gerdikeve: Eutelsat 1EU, F4 12.625 V

**Zarokên Sîweregê, hunerê xwe pêşkêşî dayikên xwe kirin**



**PK-Sîwereg**

Xwendevanên dibistana navîn yên Sîweregê, amûrên ku jiyana dayikên wan hêsantir bike afirandin û di pêşangehekê de pêşkêş kirin.

Zarokên Sîweregê, ji lîstokên xwe yên kevin, melkesa ku ji dûr ve rêş dike, robot û gelek amûrên din afirandin.

Ji bo danasîna van amûrên nû li Sîweregê pêşangehek hat vekirin û 90 proje bi hev re ketin pêşbaziyê.

Zarokekî, ereboka xwe ya ku ji dûr ve dihat birêvebirin, ji bo dayîka xwe kir melkesa ku ji dûr ve tê bi kar anîn. Wê dayik li cihekî raweste û mala xwe melkes bike.

Zarokê bi navê Ahmet Sabuncuoglu, amûrekî ku nanê sêlê demeke dirêj germ dihêle afirand.

Ji bo girtina dizên ku di dema dawî de li deverê zêde bûne jî tiştekî nû hat çêkirin. Ev amûr, dema ku deriyê malê vedibe, dihêle ku teyba muzîkê dest bi xebatê bike û şêniyê malê ji hatina mêvanê nû agahdar dike.

Robotê ku ji dûr ve tê birêvebirin, beşdar li xwe matmayî hiştin.

# Hunera Rojhelatî ji Sûriyê

**Zinar Şîno**



Êş û janên jina Kurd di têgeh û dan û sitandinên realîtîk de berçav di ke, jina Kurd di tev perspektîvan de dide naskirin, ew bala xwe dide ciwanî û bejn û bala jinan, jiber ku ew bingeha evîn û bexşîn û nemiriyê ye. Bi vî awayî hunera şêwekara Kurd Cîhan Îbrahîm dihê naskirin.

Li roja Şembiya borî 21.05.05an de li Magdeburg (Einewelt Haus, Schelling str. 3-4) di pêşangehek hevbeş de, ya bi navê Hunera Rojhelatî ji Sûriyê 5 şêwekarên jin ji Sûriyê ku 3 ji wan (Cîhan Ibrahîm, Cenkîman Omer, Hîva Rosulo) ji Kurdistana Rojava ne, beşdarî kirin. Bi programek rêk û pêk seremoniya vekirina pêşangehê destpêkir û piştî peyvên civaka biyanî li herêma Sachsen-Anhalt (Michael Marquardt) û rawêşkariya înterkulturel ji aliyê Nguyen Tien Duc hatin xwendin, pêşangeh hat vekirin ligel awazên saza Xêredîn Muhemed ku tevilî reng û ciwaniya tabloyên hîvî û şadîyê xemlek xweştir di holê de belav kiribû.

Cenkîman Omer jibo hunerê dibêje "dema ez li kevala xwe vedigerim, ez li zarokîniya xwe vedigerim, bi 10 keval û porterêtek, ji rengên sar û germ ji "Oil" hebûn û bextewariyê digeriya. Her kevalek ramanek bû, xweziyek bû. Cîhan bi 7 kevalan hola pêşangehê xemilandibû, ciwanî û balkişandina jinê di kevalên wê da pir bi aşkera dihat xuyakirin.

Hîva jî bi 7 kevalan hebûna hunera xwe di pêşangehê de selimand, ne tenê kevalên xwe reng û sembol û Kurdîniya xwe dida naskirin, belku kevalên xwe bi nav jî kiribûn, mîna bûk, jina Kurd, kevok, xweza ..htd. Keval encama hestên hundirînin yên ku ligel rastiyê (realetêt) pevdiçin. Ev hestên objektîv di rastiyê de dibine objekt. Hîva weha hunerê dide naskirin. Hêjayî gotinêye ku bi bufêtek vekirî ji xwarin û vexwarinê roja yekê ji pêşangehê bi dawî hat û wê ta 21.06.05 berdewam bike.

*shinoshino@web.de*

Kilmxeberî

## Kêneka ke 16 eskeran tecawiz kerdib, merd

**Merdin**- Navçê Merdîn Ömerlî de par 16 memuranî dewlet gureyo pîs (tecawiz) kerdib yew kênaya kurd. Namê na kêna R.S bi û 16 serrî bî. Nê 16 kesî dadigeh de amenî mehkima kerdiş.

Hefte ku viyert na kêna merd, la sebebî mergî aye ne belli yo.

## Sîne de bênatê şarî kurdistan û hêzanî dewleta îran de şer veciya



**Sîne**- 13ê Hezîran de bajarî kurdistana rojhelat Sîne de hêzanî dewleta îran waşt ke yew xortî kurd bi dara ziwar bigerî û te de bêrî. La şarî bajar verba no kerdinê esekeran amê. Nê ser bênatê eskeran û şarî Sîne de piyerdayiş veciya. Eskeran 12 xortî girotî, te de berdî.

Şarî Sîne eşkera kerd ke eger nê xortî serbest miyerî verradayişî, zaf biyayeyî gird vêcî.

## Sinorî iraq de resmî Mesûd Barzanî verba resmî Hatemî ame dardkerdi

**Hecî Omeran**- Sinorî îran û kurdistan berî Hecî Omeran de resmî Mesûd Barzanî verba resmî hatemî ame dardkerdiş.

Perbîn ra Çoman de zi qeymaqam û şarî navçê bi yew merasîma ala kurdistan û resmî Mesûd Barzanî berî Hecî Omeran de kerd dard.

## Cinî kurd wazenî ke qanûnî îran bibêdilî



**Tehran**- 12î Hezîran de cîniyanî kurd verî zaningehî tehran de pa cîniyanî îrana yew mîtîng viraşt. Cînî kurd wazenî ke dewleta îslamî Yasaya esas ( Anayasa) bibedilno. Çimkî Yasaya esas ê îran de verba cîniyan zaf maddê êst.

# Mistefa Hicrî: Vîcnayişî serek komriyê îran boykot bikeni.



Sekreterî PDK-îran Mistefa Hîcrî gerayişî xo yê ewropa qedna û agêra kurdistan. Mistefa Hîcrî hendê 4 aşm ewropa de mend. Ey no bênate de zaf dewletanî ewropa de semînerî dayî û polîtîkaciyanî ewropa ya ame pîyehet.

Sekreterî PDK-îran Mistefa Hîcrî hefte ku viyert agêra kurdistan û gerayişî xo ser, biyayeyanî aktuel ser yew roportaj da radyo ya „Dengê kurdistan".

Mistefa Hîcrî no roportaj de derheqî vîcnayişanî îran de vînayê xo îna ard ziwan:

Îran de serek komariye û parlemento di çiyî sembolîkî. Ê wazenî îna dinya ra vacî k e îran yew dewleta modern a; serekî sazî û dezgeyanî ma bi vîcnayiş yenî hukim ser. La heqîqat de qet yew qimetî nê dezgeyan çîno. No rid ra ma wazenî şarî kurdistan ni vîcnayiş boykot bikero".

## Hewler de Festîvalê fîlmanî teror



**Hewler**- Penî aşmê Hezîran de serbajarî kurdistan Hewler de yew festîvalê fîlmanî teror yena hedre kerdiş.

Mesûlî şîrketa Evînî Fîlm Cano Roj beyanî no derheq de agahdarî da ronameyan. Goreyî agahdariyê Cano Rojbeyanî sere de 40 rejîsorî xort torî na festîval benî û cuwa pey Basra û Bexdat de zi îna festîval yenî hedre kerdiş. Dewletanî bînan re zi sînemakar biyerî na festîval. Na festîval de hêna zaf fîlm ke derheqî teror de yê, ê fîlm biyerî nîşandayiş.

# Kurdî ewropa kiştişî şexî Xiznewî protesto kenî



**Kopenhagen**- Hefte kû viyert rexistanî kurdanî danîmarka kiştişî Şexî Xiznewî protesto kerd. HEVKARI, KOMKAR, IKD Û XOYBÛNÊ piya yew vilavok kerd hedre û na vilavok da serekî Parlamentoyî danîmarqa, parlamenteran, serekî partîyanî danîmarqa, serek wezîrî danîmarqa, wezaratê tebêrî danîmarqa, Amnesy International, Komelê Heqî Merdiman ê Danîmarqa, Bûroyî Yewbiyayî Ewropa (EU), Bûroyî

### Yewbiyayê Miletan (UNO)

PKE-Platform kufltina flexî Xiznewî protesto kerd

Per bîn ra PKE-Platform bi yew vilavoka kiştişî Şexî Xiznewî protesto kerd û gazî kurdan kerd ke dest bidî yew bînan û verba terorî dewletanî îşgalciyan vinderî

Se ke yeno zûnayiş muhaberatî suriye hêver Şexî Xiznewî rema û hefte ku viyert zi o kişt û leşê ey Qamişlo de eşt kiştê rayerî.

# Çolîg de karkeran gure caverda

**Çolîg**- Karkerî belediya Çolîg de kuçeyan kenî pak, 4 aşmo nêwkenî meaşê xo bigerî. No rid ra karkeran sey protesto gure caverda.

Çolîg de îhaleyî gurê pakerdiş şîrketa SIM-PET gureto. 100 karker na şîrket de xebitiyeno, la nê karkeran 4 aşmo ke meaşê xo nêgirota. 15î Hezîran de karkerî çat rayerî hepisxaneyo verin de amê piyeser û sey protesto gure caverda.

Ardimcî serekî belediya Mehmet Afacan amê karkeran de qisêkerd, la karkeran ya : Ma heta meaşê xo nêgiri, ma dest xebatê nêkenî. Ma nêşkenî pereyanî manav, bakal ûyb. bidi.



## Mahsûn Kirmizigul merg ra xelisiya



**Istanbul**- 14î Hezîran de dengbejî kurd Mahsûn Kirmizigul pa embazanî xo ya Beşîktaşê/Îstanbûl de top kaykerdiyen, o û yew kaykerdoxo bin ginay piyer. Mahsûn bê hiş mend, embazanî ey o berd nêweşxane.

Doktoran darbê ey pişt û o şawit keye.

www.arsiv.org

# Peşmergê Barzanî bi serekî kurdistana



**Seyîdxan Kurij**

**Mesûd Barzanî temamî heyatî xo da tekoşînî azadiya kurdistan. Ey Şrsat nêdî wendişî xo temam kero, la ey malimo gird Mistefa barzanî ra şîretî xo girot. Mesûd Barzanî wendiş ra û futboll ra zaf heskeno. Ey bi cehdî xo ya xo hol perwede kerd no bi sebeb ke o biyayanî mintiqa û dinya hol fam bikero. Mesûd Barzanî warî stratejî û taktîkanî siyasî û eskerî de hostaye xi îspat kerda. Oşîreto mîlî ke ey pî xo re giroto, bu sebeb ke o her tim menfaatanî mili paweno û qederî miletê kurd ser qerararnî raştan geno.**

12î hezîran nêmroja ver Parlamentoyî Kurdistan kombiyayişî xo virşaşt û serekî Partiya Demokrat a Kurdistan (PDK) Mesûd Barzanî sey serekî Kurdistana Federe vîcna.

Mesûd Barzanî 14î aşm de sondî serektiye wend û dest bi wazîfe kerd.

Se ke yeno zanayiş PDK, YNK û ê partiyanî bîn serektiyê Mesûd Barzanî ser piye kerdib. Parlementoyî Kurdistan bi yew veng M.Barzanî sey serekî kurdistan vîcna.

4î hezîran de Parlamentoyî Kurdistan bi a û Qanûnî Serektiye kurdistan qebûl kerd.

Nika kurd pawenî ke yew roj lez her di îdareyî kurdistan bibî yew û yew hukumato ortax biyero ruenayiş.

## Mesûd Barzanî kam o?

*"Ez binî firsneyî ala kurdistan de Mahabad de dadî xo ra biya û ez hedreya ke semedî na a la hizmet bikerî û bimirî"*

Mesûd Barzanî eynî roja ke PDK ameya sazkerdiş, roja 16î Tebax 1946 de Mehabad de dadî xo ra bû. O wext babî ey Mistefa Barzanî bi rutbeyî generalê fermandarî hêzanî çekdar ê Cumhuriyetî Kurd ê Mehabad bi.

Wext ke Cumhûriyetî Mehabad riciya Mistefa Barzanî yew mudê koyanî Îran de mend, la cuwa pey amê Barzan. Mesûd Barzanî pa pî xo ya ame Barzan. Hukumatî Iraq waşt Barzanî pa embazanî ey ya teslîm bigeri. Nayê ser Barzanî pa 500 peşmergeyanî xo ya leşkeranî iraq, îran û tirkiye ya piyerdayiş kerd û yew şiyayişô derga pey xo resna Dewletanî Yewbiyayê Sosyalîst ê sovyet. Mesûdo qicik bi dadî xo ya şi Musul, pîrîkî xo het û 12 serî îta de mend.

1958 de General Kasim iraq de darbe viraşt û cumhuriyet îlan kerd. Cuwa pey Barzanî pa embazanî xo ya Sovyet ra agêra, ame iraq. Mesûdo qicik weXt ke pî xo diy 12 serre bi, o 12 serrî bê babî ciwiya. Barzanî cînî û qicî xo berdî Bexdat, la yew mûde cuwa pey înan keyeyî xo berd Barzan. Banî înan amebî ricnayiş, înan xo re newe ra banî xo viraştî.

Yew mude cuwa pey generalanî ke cumhuriyet saz kerdib,înan sozî xo canêardî. Çimkî înan hêver soz dabi kurdan ke heqanî înan ê mîlî bisinasnî. Nayê ser Mistefa Barzanî xo ûnt koyanî kurdistan. Elûl 1961 de şoreşî kurdistano ke bi namê şoreşî îlon yeno sinasnayiş dest ci kerd.

Mesûd Barzanî pa dadî û birayanî xo ya Barzan de ciwiyenî. Ey zaf waştên ke şuero miyanî şoreş, bibo peşmerge. Mesûdo 16 serre no waşteyî xo bi qasûdê apî xo resna babî xo Mistefa Barzanî. Serekî şoreş no waştê Mesûd qebûl kerd, no qede Mesûd Barzanî bi peşmerge.

Mesûd Barzanî zaf lez bi hol yew peşmergey. O şew û roj Barzanî yo pîl het de bi. O kor e ko, qil re qil, derê –derxuelen ra gêra, piyerdayişanî verba cehşan û leşkeranî iraq de vernî de ca girot. Yew wexto nêzdî de o bi serpeşmerge, ey cephe de xerb îdare kerdî. Na cehatê xo ser Mesûd Barznî yew mude cuwa pey komîteyî navendi ê PDK de ca girot. Wext ke PDK semedî karanî îstîhbarata bi nameyî „Parastin" yew rexistin saz kerd, Mesûd Barzanî bi serekî Parastin.

Benatê PDK û partiya Baas de 11 Adar 1970 de piyaameyiş viraziya. Mesûd Barzanî pa birayî xo ê pîl Îdrîs Barzanî ya delegasyonanî kurdan de ca girot. O şi Bexdat û hukumatî iraqa mişevirye viraşt.

Hukumatî iraq hanc sozî xo ca nêardî, no rid ra 1974ê de hêna şer dest ci kerd. Mesûd Barzanî sey yew endamî serektiyê ni şer de ca girot. 1975 de Cezayîr de Îran û Îraq amê piye, Îranê û Amerîka ardimî xo birna û kurdan re duşminê kerd. Naye ser PDK mecbur şer da vindarnayiş. Serekî şoreş pa peşmergeyan û keyanî xo ya şî îran, bî multecî. Yew mude cuwa pey îran de hêna îdarecî PDK amê piyehet û qerarî xo newe re organîze kerdiş girot. Îta de Mesûd Barzanî rolo sereke girot. O bi mesûlî newe ra reorganîze kerdişî PDK.

Wext ke Barzanî yo pîl nêweş kot û amerîka de neweşxane de rakot, Mesûd hîrê serrî ey het mend, ey re hizmet kerd. Mesu^d Barzanî nê rojanî xo sey rojanî fîraz hesibneno.

Rehmet şiyayişî nemir Barzanî ya pey Mesûd Adar 1979 de kongreya 9. de sey serekî PDK ame vîcnayiş û heta ewro zi serekî partî yo.

Wext ke 1987 de 8 partiyî kurdistan ame piyehet û cepheyî kurdistan saz kerd, Mesûd Barzanî bi mesulî cephê ê kurdistan. 1990 de iraq kuveyt îşqal kerd, 1991 de Amerika saddam kuveyt ra vet. Wisarî 1991 de şarî kurdistan sere darit we. Mesûd Barzanî no sere wedartiş de serekî leşkerî ê cepheyî kurdistan bi. Wext ke Baas hêna bi helîkopteranî xo û qazanî kimyevî eriş berd warî kurdistan ser û 3 milyon însan veciya koyanî ser, Mesûd Barzanî sey serekî leşkerî vernî peşmergan de bi û o cephe de şi top ser, va : „ Ez îta ya tepiy a yew gam nêerzena". Naye ser peşmergeyan cesaret girot û nêverda leşkerî Baas ûca ya wet leşkerî Baas biyerî.

Mesûd Barzanî temamî heyatî xo da tekoşînî azadiya kurdistan. Ey firsat nêdî wendişî xo temam kero, la ey malimo gird Mistefa Bbarzanî ra şîretî xo girot. Mesûd Barzanî wendiş ra û futboll ra zaf heskeno. Ey bi cehdî xo ya xo hol perwede kerd no bi sebeb ke o biyayanî mintiqa û dinya hol fam bikero. Mesûd Barzanî warî stratejî û taktîkanî siyasî û eskerî de hostaye xi îspat kerda. O şîreto mîlî ke ey pî xo re giroto, bu sebeb ke o her tim menfaatanî mili paweno û qederî miletê kurd ser qerararnî raştan geno.

Mesûd barzanî bi dirustê xo yeno sinasnayiş. Dostî kurdan zi, dişmenî kurdan zi zanî ke ey wext ke soz da , o sozî xo ser vindeno. O waharî prebsîpano û qet û qet prensîpanî xo nêgeno binî lingan.

Nê seranî peyinan de meselayî Kerkûk de, meselayî heqî federasyon de o sey diyesî verba dişmenanî kurdan vindert û rî kurdan kerd sipye. Wext ke tirkiye û amerika waşt ke leşkerî tirkan şuerî iraq, Mesûd Barzanî sey dês înan ver vindert û ling wa erd va; „ Ma hedreyi piyer piya şehîd bi, la ma nêvedenî kes welatî ma işqal bikero".

Mesûd barzanî bi şexsiyetî xo, bi tekoşîna xo serektiye kurdistan kerda heq û kurd bawerî ke o bi layiqî no wazife biyaro ca.

■■■

www.kurdskurd.com

### هونەرمەندی شێوەکاری کورد مامۆستا جەمال بەختیار

# تاوانی ٤ی مایسی شاری هەولێری لە تابلۆیەکدا نەخشاندوە

**ساسان دەروێش – هۆڵەندا**

هونەرمەندی گەورەی شێوەکاری کورد(مامۆستا جەمال بەختیار) وەک کاری هەمیشەیی و نەتەوەیی و کەسێکی نزیک و پێشمەرگەیەک لە ناو ڕووداوەکانی کوردستان ژیاوە و بەهەستە ناسک و هونەرمەندیەکەی لە هەرکوێ بووبێ، بە فرچەکەی و ڕەنگەکانی نێودەستی ئەو زوڵم وزۆرەی داگیرکەران و سەرکەوتنەکانی هێز و بازووی پێشمەرگەکانی کوردستانی کردۆتە تابلۆی هونەرییەکانی، کە بە سەیرکردنی کۆمەڵێک خوێندنەوەی تێدابەدی دەکەی وەکو دیکۆمێنتێک، کە هەموو تابلۆکانی لە سەر ئاستی کوردستان و دەرەوە دە نگدانەوەی گەورە یان هەبووە لە میدیاکانی جیهاندا، ئەم جارەش هونەرمەندی گەورەی کورد مامۆستا جەمال بەختیار وەک من ئاگادارین سەرەڕای نەخۆشی و نائارامی تەندروستی، بە تابلۆیەکی ڕەنگین، تاوانبارانی کارەساتی ٤ی مایسی "شاری هەولێری ڕسواکرد و هاوبەشی و بە شداری لە خەمێکی تری ڕۆڵەکانی کوردستاندا کرد، کە ئەمەش خۆی لە خۆیدا خۆتەرخانکردنە بۆ بە دەنگەوەهاتنی میللەتەکەی و هونەرە بەرزەکەی بە دریژای شۆڕشی ئە یلولی مەزن و گوڵانی پێشکەوتنخواز تەرخان کردووە بۆ نیشاندانی ڕووی ڕاستەقینەی خەباتی نەتەوەییمان بەڕووی داگیرکەران و دوژمنانی کورد و کوردستان. کێ هەیە لە ئێمە لە ژیانیدا، حەزی لە گۆرانیەک یان پارچەمۆسیقایەک نەکردبێ، یان تابلۆیەکی ڕەنگین سەرنجی ڕانەکێشابێ و بەرەو دەریای ئەندێشە و بیرکردنەوە نەیبردبێ هەتا نەخوێندەوارێکیش لە ژێر ئەم کارتێکردنەدایە بەڵام لەوانەیە ئەگەر لێی بپرسی هونەر چیە؟ یان قوتابخانەکانی کامانەن؟ نەوەک هەر توانای وەڵامدانەوەی نەبێ بەڵکو هەروەڵامێکی دروستیش بۆ ئەم پرسیارانە بە قسەیەکی ووشک و بێ سوود بزانێ. لە کوردەواری دا کەم مارٍ هەیە وێنەیەکی تیا هەڵ نەواسرابێ، خاوەن مارٍ ئەگەر دەربارەی هونەرشتێکی ئەوتۆش نەزانێ بە هەستی ڕووت، دەزانێ مارٍە کەی ژوورەکانی بە بوونی تابلۆیەکەوە قەشەنگتر دەبێ، گەشبینی زیاتر تیادە بێ، هەتا ئەگەر تابلۆکەش گوزارشت لە کارەساتێک یان درامایەکیش بکات، کەواتە تابلۆ، گەر بە ووردی هەڵسەنگێنرێ، بەڵگەنامەیە بە تایبەتیش ئەو تابلۆیانەی ڕەنگدانەوەی خۆشی و ناخۆشی میللەتێکبن، باس لە سەرکەوتنەکانی دەکەن، لە کارەساتەکانی لە هێما بەرزەکانی لە پێشەوا و سەرکردە نەمرەکانی، مایەی خۆشحاڵی و شانازییە کە تابلۆکانی هونەرمەندی دووەم وڵاتی پایە بەرز و خۆشەویست مامۆستاجەمال بەختیار لەو هونەرمەندە کورد پەروەردە ڕەسەنانەیە کە بە تابلۆکانی بە تەنهاپێمان دەڵێ ناسنامەی نەتەوایەتی هەر کوردێکی ڕەسەن بە دوورکەوتنەوە لە کوردستان ون نابێ و لە ناو ناچێ، پێمان دەڵێ کورد نەتەوەیە، کورد ئاشتی پەروەردە و مەزنترین جەنگاوەرە بۆ بەدەستهێنانی ئاشتی، بە تابلۆ میژووەکانی بۆ دەگێڕێتەوە، لە ناو ڕەنگەکانی تابلەکانیدا، میژوویەکی نووسراو بە ڕەنگ دەخوێنێتەوە، میژووی خەباتی کورد، دیمەنی ڕەنگینی کوردستان، سەرکردەمەزنەکانی، داستانە پڕ لە شانازییەکانی، مامۆستا جەمال بە بختیار لە دەستپێکی شۆڕشی ئەیلولی مەزنەوە تا نسکۆ، بێ دابڕان هونە رمەند و پێشمەرگەبوو، بژیە لە ڕۆژانی سەختی خەباتی نەتەوە کەماندا هونەرە زیندووەکەی لە دەرگای مارٍ بە مارٍی گوند و لادێکانی کوردستانی ئەدا بە کێشانی وێنەی جوان جوانی کوردستان وئافرەت و پیاوی کورد و هەڵوێستی شۆڕشگێڕانەی نەتەوەکەی، هونەرمەند مامۆستا جەمال بەختیار سااڵنێکی دووەر لە دەرەوەی کوردستان و لە ئەمریکاژیان بە سەر دەبات، سەر باری تێرتەمەنی لە بەخشینی هونەری و ئەفراندن" نەکەوتووە هەمیشە تابلۆکانی مەرگەسات و کارەساتە کانی کوردستان وخۆڕاگری و مقاومەمەتی گە لی کورد دەگێڕنەوە، تا ئێستا زۆرترین تابلۆکانی کراونەتە پۆستەڕاتی چاپکراو و لە شوێنە گشتییەکاندا هەڵدەواسرێن. کە ئەمە کارێکی پیرۆزە پێویستە ئێمە لە ڕێی هە موو نوسینەکانمانەوە ئەو کە لە پیاوانەی خۆمانمان لە یاد نەچێ و بۆ هەمیشە هەڵوێستیان بە لووتکەوە ڕاگرین.

بۆ ئەوەی خوێنەران و هونەر دۆستانیش لە نزیکەوە زیاتر ئەم هونەر مە ندەی کورد بناسن کورتەیەک لە ژیانی ئەو بلیمەتە م بۆ ئامادەکردوون .

- هونەرمەند جەمال بەختیار، نازناوی بەختیارە و لە ساڵی ١٩٣٥ لە شاری سلێمانی لە دایک بووە و لە تەمەنی ٣ ساڵیەوە باوکی بەوەزیفەی پۆلیسی گوێزراوەتەوە شاری هەڵەبجە و لە تەمەنی ٧ ساڵیەوە لە قوتابخانەی سەرەتایی دەستی بە خوێندن کردووە لە ژێر چاودێری پورزای میهرەبان و دڵسۆزی مامۆستا گۆرانی شاعیری بەناوبانگ پەروەردە بووە و لە تەمەنی ١٢ ساڵیەوە لە پۆلی پێنجەمی سەرەتاییەوە دەستی کردووە بە وێنەکێشانی منااڵنە و مامۆستاکانی هانیان داوە بۆ ئەم هونەرە گەورەیە.

-لە ساڵی ١٩٤٢ پەیمانگای هونەرە جوانەکانی بەغدادی تەواوکردوە، بە داخەوە بەردەوام نەبووە لە خوێندن وتێکەڵ بە سیاسەت دەبێ و دەبێ بە ئەندامی پارتی ڕزگاری.

- لە کوردستان لە ساڵانی پەنجاکاندا، لە سلێمانی پێشانگایەکی لە هۆڵی قوتابخانەی فەیسەلی شوێنی بازاڕی عەسری ئێستا لەگەڵ هاوڕێی هونەرمەندی "خالید سەعید" کردۆتەوە جارێکی تر لە شاری بەغدادلە بارەگای پارتی دیموکراتی کوردستان لە ساڵی ١٩٥٩ پێشانگایەکی کردۆتەوە.



جەمال بەختیار لە ژێر چاودێری شاعیری بەناوبانگ، مامۆستا گۆران پەروەردە بووە

- بە نامەیەکی تایبەتی جەنابی خوالێخۆش بوو (شێخ لەتیفی شێخ مەحمود) و مامۆستای تێکۆشەرونیشتیمان پەروەر ئیسماعیل شاوەیس کە هەردووکیان لێپرسراوی پارتی ڕزگاری بوون، بە نامەی تایبەتی لە ساڵی ١٩٤٦ نارد وویانە بۆلای سەرکردەی نەمر جەنەرااڵ بارزانی مستەفا لە کوردستانی ڕۆژهەاڵت و لە شاری مەهاباد بە خزمەت بارزانی نەمر گەیشتووە و لەڕێگای ئەویشەوە پێشەوا قازی محەمەدی دیووە، وێنەیەکی سەاڵحەدینی ئەیوبی و پێشەوای نەمر قازی محەمەدی پێکەوە دروست کردووە و بردوویەتی بۆ بارزانی و لەگەڵ خۆیا بۆ ڕۆژی ئایندە چوونەتە اڵی پێشەوا قازی محەمەد و فەرموویەتی: ئەمە دەستکردی ئەو اوەیە کە خەڵکی سلێمانییە و پێشکەشی بەڕێزتانی کردووە، پێشەوای نەمر ڕووی کردۆتە جەنابی سەرۆک بارزانی نەمر و فەرموویەتی: ئەم گەنجە خاوەنی بەهرەیەکی هونەریی یە زۆر بەختیارە ئینشاااڵ ساڵی ئایندە ئەینێرین بۆ ئاکادیمیەی هونەرە جوانەکان لە باکۆ، ئیتر لەو کاتەوە نازناوی بەختیاری لە خۆی ناوە واتە جەمال بەختیار.

- لە دەستپێکی شۆڕشی ئەیلولی مەزنەوە لە ساڵی ١٩٦١ بۆ ١٩٧٥ وەکو هونەرمەندێکی بەهەڵوێست و شۆڕشگێڕ و پێشمەرگە چەندان تابلۆ و وێنە و پۆستەری جۆرا و جۆر و دیمەنی گۆڤارو بڵاوکراوەی نەخشاندوە و بە دەست و پەنجەی ڕەنگینی.

- لە ساڵی ١٩٧٦ لە ئێرانەوە لە ژێر پاڵە پەستۆی ڕامیاری دا لەگەڵ خێزانەکەیدا کە بریتین لە پێنج کوڕ و پێنج کچ و دایکیان لە ڕێگای هاوکاری و یارمەتی ڕێکخراوی "لوتران" ەوە گەیشتنە ئەمریکا و بوونە پەناهەندە لە" ولایەتی نورت داکۆتا جێگیربوون و لە کۆلێژی هونەرە جوانەکانی ئەوێ وەر گیراوە ، لە شاری ناشڤیل دوای تاقی کردنەوە، کراوە بە مامۆستای هونەری شێوەکاری لە دانیشگای (S.V.T) تا ماوەی سێ ساڵ. لە ساڵی ١٩٨٤ تووشی نە خۆشی دڵ بووە و لەبەر ئەوە خانە نشین کراوە و ئیستاش هەر لە ئەمریکادەژی.

- لە ساڵی ١٩٨٤ لە ئەمریکا لە هۆڵی بارەگای ئاشتی خوازان لە واشنتۆن دی سی بە هاوکاری شەهید هەڵۆ محێدین ڕەحیم لێپرسراوی لقی حەوتی پارتی دیموکراتی کوردستان پێشانگایەکی کردۆتەوە و لە ساڵی ١٩٨٧ لە دانیشگای میشیگان لە شاری دیترویت پێشانگایەکی تری کردۆتەوە و هەروەها پێشانگایەکی تری لە دانیشگای (S.V.T) لە ناشفیل کردۆتەوە، کە جێگەی سەرنجی هونەرمەندانی ئەمریکا و جیهانی بووە.

- لە ساڵی ١٩٩٦ کۆنگرەی نیشتیمانی کورد لە ئەمریکا کۆنفرانسێکی بەست، لە شاری لۆس ئەنجلوس بۆ پشتگیری کۆنفرانسەکە و کۆکردنەوەی یارمەتی و پێتاک بۆ پرۆژە خێرخوازەکانی جەمال بە ختیار تابلۆیەکی بە ناوی (سەرچناری سلێمانی) پێشکەش بە کۆنفرانسەکە کرد و بە پارەیەکی زۆر فرۆشرا و داهاتەکەی بۆ کۆنگرەی نیشتیمانی کورد بوو، هەر لە و ماوەیەدا چەند بەرهەمێکی دیکەی هونەرمەند لە ئەمریکا بە پارەی زۆر فرۆشراون.

- بە شداری کۆنگرەی ١١ و ١٢ی پارتی دیموکراتی کوردستانی کردووە لە شاری هەولێر.

- بەشداری کۆنگرەی ٩٠ ساڵەی لە دایکبوونی بارزانی نەمری کردوە لە هاوینە هەواری پیرمام لە ١٤ تا ١٧ – ٩/ ١٩٩٣. - بە بۆنەی هاتنە سەرکاری سەرۆک "بیل کلنتۆن"ە وە، جەمال بەختیار تابلۆیەکی پێشکەش کرد کە بەڕێز و سوپاسەوە وەرگیرا.

. تابلۆیەکی دەربارەی خەم و مەینەتیەکانی کوردی پێشکەشی سەرۆکی کۆچ کردووی فەرەنسی جاک شیراک کردووە لەبەر دڵسۆزی و هاوخەمی بۆ گەلی کورد.

- لە بەرواری ١٣/ ١٠/١٩٩٩ دا کە هەشتەمین ڕۆژی کۆنگرەی ١٢ی پارتی دیموکراتی کوردستان بوو، سەرۆک مەسعود بارزانی مەدالیای بارزانی لە سەر ژمارەیەک لە تێکۆشەرانی دێرین و قارەمانی شایستەدا دابەش کرد کە بریتی بوون لە ٣٥ خەباتگێڕی دێرین بە مەدالیای بارزانی خەاڵتکران، یە کێکیش لە و هەڵانە هونەرمەندی گەورەی کورد مامۆستا جەمال بەختیار بوو، ئەو شانازیە گە ورە یە ی پێ بە خشرا وە ک پێشمە ر گەیەک و هونەرمەندێک کە تاج ڕادەیەک دڵسۆزە بە کورد و کوردستان وهونەرە بەرزەکەی.

- تابلۆی ڕێڕەوێشتنە گەورە و بەناوبانگەکەی بارزانی و هەڵاڵنی لە ساڵی ١٩٤٧ دوای نەمانی کۆماری کوردستان بەرەو یەکێتی سۆڤیەت، داستانێکی گەورەی بەرگری و کۆڵنەدان و خۆڕاگری بوو کە بەشێکە لە میژووی بەر خودان و جوامێڕی و سەرکەشی کوردان، نەک هەر لە میژووی گە لی کوردا کار و ڕووداێکی دەگمەن و مەزن و بێ وێنەیە، بە ڵکو لە ئاستی جیهانیش دا دەگمەن و بێ وێنەیە، ئەم تابلۆ بایەخدار و گرنگە، زادەی نیو سەدە تێڕامان و چوار ساڵ کارکردنی هونەرمەند جەمال بەختیارە، لە کۆنگرەی ١٢ی پارتی دیموکراتی کوردستان پێشکەشی سەرۆک مەسعود بارزانی کردووە.

- لە پۆستەرە بەنرخەکانی؛ بۆرددومانی شاری هەڵەبجە و قە ڵادزێ لە ١٩٧٤/٤/٢٤ و هێرش کردنە سەر کۆمپانیا و کێڵگەی نەوتی جەمبورلە کە ڕکوک لە ١٩٦٥/٧/٢١ بە فەرماندەی شەهید محەمەد دەرویش نادر و چەندین تابلۆی بەنرخی تر ... هتد.

- لە کۆتایدا سەرکەوتن و تەمەن درێژی بۆ مامۆستاجەمال بەختیار دەخوازین و خەرمانی بەرەکەت بێ بۆ نەتەوەی کورد. ■■■

## وەڵامێک ڕاشکاو بۆ هەناو خان!

**نەمیر عەبدوڵا**

باسکردنی کێشەی گەنج، بە هەردوو ڕەگەزەکەوەی، کارێکی ئاسان نییە. چەندەها وتار و نووسینی جۆراوجۆر و جیاوازی دەوێت تا بتوانرێت هەندێک لەو گیر و گرفتانەی کە ڕووبەڕووی لاوانی کورد لە هەندەران دەبنەوە، بخرێتەڕوو. ئەوەی لێرەدا جێگەی مەبەستمە، ئەو نووسینەی"هەناو کەمال"ە کە لە ژمارەی"٤٠"ی هەفتەنامەی "پەیامی کورد"دا بڵاوکرایەوە و، بووە مایەی تێڕامانی من و زۆر گەنجی تر کە توانی ئەم نووسینە بخوێنێتەوە. بە بڕوونی بەڕێزی زۆربەی لاوەکانمان لە هەندەران خەریکی دیسکۆ و شەرە چەقۆ و کاری ناپەسەندی دیکەی وەک هونەرمەند کۆشتنن!! بەاڵم "هەناو" خان ئامارە بەوە ناکات کە، تاوانباری گەورەی ئەو بوارە ئێوەی کچە کوردی هەندەرانن کە، هەر یەکەتان لە ئاستی لاوێکی بێکەس و دڵ پڕ لە هەزارەها گرفتی ڕۆژانەی، لوتی خۆتان ئەبەنە حەوتەمین تەبەقی ئاسمان! ئایا ڕۆژێک بیرت لە ژیانی ئەو گەنجانە کردۆتەوە کە، خۆیان"ژنی مااڵ و پیاوی دەرەوەن"، واتە ئیشی ماڵیش، کە لە کولتوو ری ئێمەدا هی ژنە، ئەبێ بۆ خۆی بیکات. ئایا بیرت لەوە کردۆتەوە، ئەو گەنجانە هەر یەکێکیان خێزانێک لە کوردستان بەخێو دەکات؟ ئایا کام گەنجی کوردستان بە ئومێدی خوێندن هاتۆتە هەندەران، جگە لە کوری"خوا پێداوەکان" و ئەوانەی بە پاڵپشتی ئەم یان ئەوەوە هاتوونەتە ئەوروپا، تا گلەیی ئەوەیان لێ بکەیت بۆ ناخوێنن؟! ئایا تۆ وەک کچێکی گەنجی کورد، ئەو هەموو کچە گەنجەی هاوتەمەنی خۆت، بە تاوانبار نازانیت، کە هەر یەکەیان نەیانتوانیوە لاوێک لەو گێژاوە دەربهێنن و فێری ئەوەی بکەن چۆن بژی؟ بەاڵم لەگەڵ هەموو ئەوەی کە تۆ وەک"چەقۆ ڕەشین و ئەهلی دیسکۆ و هونەرمەند کوژ" ناوت بردووین، لە چاو ئەو ڕیژە زۆرە گەنجە بێکەس و تاک و تەنیایەی، ژمارەیەکی یەکجار کەم خەریکی ئەو جۆرە بەزمانن، لە کۆتاییشدا ئەاڵێم، ئەگەر چاوێک بە الپەڕەکانی هەندێ لاوی میللەتانی تردا کە لە هەندەران دەژین، بگێڕیت، ئەوسا، هەزار ڕەحمەت بۆ ئیمەی لاوی کورد ڕەوانە دەکەیت! ■■■

### لە کۆنفرانسێکدا لە بارەگای UN لە جنێڤ

# شاندی کوردەکانی خۆرئاوای کوردستان، دەنگی حەقخوازانەی کوردیان بەرزکردەوە



شاندی کوردەکانی خۆرئاوای کوردستان: عەبدولسەلام نەیۆ، عارف جابۆ، ژیان بەدرخان و ریادێ حەمێ

ڕۆژی دووشەم ڕێکەوتی ٢٠٠٥/٥/٣٠ لە شاری جنێڤی سویسرا، Workin Group on Minoritis (WGM) دەستی بەکۆبوونەوەی یازدەهەمی خۆی کرد، نزیکەی سی وڵات تیادا بەشداڕ بوون و بۆ ماوەی پێنج ڕۆژ بەردەوام بوو، پەنجا ڕێکخراوی NGO و کەسایەتی ئەکادیمی تایبەت بەمافی مرۆڤ کە هەموویان بۆ بەرگری لەمافی گەلەکانی خۆیان هاتبوون، بەئامادەبوونی کۆمیتەی WGM و نوێنەری وڵاتانی کە بۆ لێکۆڵینەوە لەگەڵیان بانگ کرابوون. کۆبونەوەکە دووسەد کەسی لەخۆ گرتبوو. لێژنەیەک لە پێنج کەس هەڵبژێردرا ئەمساڵ بۆ جاری یەکەمە کۆمیتەیەک کە پێک هاتبوو لە عەبدولسەلام نەیۆ، عارف جابۆ، ژیان بەدرخان ،و ریادێ حەمێ بەناوی کوردی سوریا بەشداریان کرد و لە ناو کۆبوونەکە بەتیژی تەسەلی بە ئامادەبوونی نوێنەری حکومەتی سوریا باسی ئەو زوڵم و ڕەشەکوژییەی ڕژێمی بەعسی سوریان بەرامبەر بەکورد کرد. لە ساڵی ١٩٦٢ لە لایەن حکومەتی سوری، ناسنامە و مافی هاووڵاتی بوونیان لێ سەندرایەوە، ئەم کارە لەگەڵ سادەترین خاڵەکانی مافی مرۆڤ ناگونجێ.

داواکاریەکانی وەفدی خۆرئاوای کوردستان لەم خاڵانەدا دیاریکران:

١ـ ناساندنی کورد لەدەستوری وپارستنی مافە سیاسی و کولتووریەکانی

٢ـ دەرکردنی یاسایەک کەوا پارتە سیاسییەکانی خۆرئاوای کوردستان بتوانن بە ئازادی چالاکی سیاسی خۆیان بکەن

٣ـ ڕاوەستاندنی شەڕی حکومەتی سوریا دژی زمان وکولتووری کوردی

٤ـ هەڵگرتنی ڕەوشی نائاسایی وبەردانی هەموو بەندکراوەسیاسییەکان

٥ـ گەڕاندنەوەی ناسنامە بۆ کوردەکان

٦ـ دروستکردنی لێژنەیەکی سەربەخۆ بە لێکۆڵینەوەی لەگەڵ ئەنجامدەرانی قەتڵو عامەکەی قامشلو و سزادانی بەرپرسانی ئەوڕووداوە خوێناویە

بەپێ ئەو پڕگرامەی داندرابوو، هەر وڵاتێک، ڕۆژێکی تایبەتی بۆ تەرخان کرابوو تا لەگەڵ نەیارانی ڕوبەڕوو ببنەوە، کەچی کاربەدەستانی سوریا بۆ ماوەی سێ ڕۆژ خۆیان لە ڕووبەڕوو بونەوەی وەفدی خۆرئاوای کوردستان دەدزیەوە تا ڕۆژی چوارەم، بەرپرسی حکومەتی سوری بە ناچاری لە ناو هۆڵی کۆنگرەکە ڕووبەڕووی کورد بوونەوە. دیارە شاندی کوردستان پێشتر خۆیان باش بۆ ئەو جۆرە ڕووبەڕوو بوونانە ئامادەکردبوو، پشت ئەستور بە کۆمەڵێک بەڵگە و دۆکۆمێنت، وای لە نوێنەری حکومەتی سوری کرد کەوا گۆشەگیربێ لە نیوان ئامادەبوان و کۆمیتەی مافی مرۆڤدا و هەست بە شەرمەزاری گەورە بکا و پاساو بۆکارە دڕندانەکانیان بهێنێتەوە. حکومەتی سوری دەیویست وای نیشان بدا کە ئەوان ویستوویانە ڕەوتی دیموکراتی بەرەوپێش بەرن بەڵام بە هۆی کێشەی ئیسرائیلەوە نەیانتوانیوە.

مەخابن ئامادەنەبوونی نوێنەرانی خۆرهەڵاتی کوردستان و باکوری کوردستان و ئامادەنەبوونی نەنوێنەری حکومەتی هەرێمی کوردستانی عێراق لەم گفتوگۆیەدا، کاریگەریی خراپی هەبوو، چونکە ڕێگە خۆشکەرێک بوو بۆ ئەوی نوێنەری بەرەی تورکمانی بەتوندی هێرش بکاتە حکومەتی هەرێمی کوردستان ، کە گوایە دەیانەوێ دەست بەسەر کەرکوک دابگرن لە ڕێگای هێنانی کوردان لە کوردستانی سوریا و تورکیا و کورد تورکمانەکان دەچەوسێننەوە لە کەرکوک. ئافرەتێک کە لە کەنەداوە ئامادەی کۆنفرانسەکە ببوو پرۆپاگەندەی ئەوەی دەکرد کە گوایە حکومەتی هەرێمی کوردستان ئاشوریەکان دەچەوسێنێتەوە و بەهاووڵاتی پلەدووییان لەقەڵەم دەدات و گوندنشینانی ئاشوری هیچیان بۆ نەکراوە بە بەراورد لەگەڵ گوندکانی کوردان کە هەموجۆرە ئاسانکاریەکیان بۆدەکرێ.

هەروەها لە گۆنگرەی ناوبراودا وڵاتانی میسر و ئێران وتورکیا وسوریا دژی بەستانی کۆنگرەیەکی نێودەوڵەتی بوون تایبەت بە کەمەنەتەوەکانی ڕۆژهەڵاتی ناوەڕاست. بەڵام بریار درا کە وا لە داهاتودا، کۆنگرەی نێودەوڵەتی بۆ ئەو ئامانجە ببەسترێ، بەڵام هیچ وڵاتێک ئامادەیی خۆی دەرنەبڕی بۆ میواندارێکردنی ئەو کۆنگرەیە. شاندی خۆرئاوای کوردستان خۆزگەی خواست کەوا حکومەتی هەرێمی کوردستان ئەو میوانداریە لە ئەستۆ بگرێ کە تاکە دامەزراوی شەرعیەیە لە هەر چوار پارچەی کوردستان بۆ بەرپەرچدانەوەی ئەو ناڕاستییانەی بەرامبەر بە حکومەتی هەرێمی کوردستان دەکرێ و نیشاندانی مەزڵومیەتی کورد لە هەرسێ پارچەکەی دیکەی کوردستان. ■■■

### پڕۆژەیەک لە نێوان مندالاّنی کورد و ئیتالیا:

# کوردستان لە ڕوانگەی منداڵانەوە




**ئیتالیا ـ گوڵاڵە زمنکەنە** ـ پێشانگەی کوردستان لە ڕوانگەی منداڵانەوە، پڕۆژەیەک بوو لە نێوان منداڵانی کورد و ئیتالیدا بە هاوکاری و یارمەتیدانی شارەوانی ڤینیسیا لە ساڵی٢٠٠٣. ئەو وێنانەی کە ئەم پێشانگەیە گرتبووە خۆی، لەلایەن منداڵانی چوار شاری کوردستانی باشوور"سلێمانی، چەمچەماڵ، هەولێر، دهۆک" و منداڵانی کورد کە لە ئیتالیان و منداڵانی ئیتالییەوە کێشرابوون. من وەک یارمەتیدەرێکی زمان بۆ منداڵانی کورد لە قوتابخانەکان، چەند وانەیەکم سەبارەت بە کولتوور و مێژووی کورد و کوردستان و چۆنییەتی ژیان بردنەسەری منداڵانی کورد لە کۆمەڵگەی کوردەواریدا، لە چەندین قوتابخانەدا بە وێنەوە پێشکەشکردوە. دوای بە دوای ئەوەش داوامان لە منداڵان کرد کە لەسەر ئەو گێڕانەوەیە، وێنەی کوردستان بکێشن. پاشان ئەو وێنانەی کە لە کوردستانەوە ڕەوانە کرابوون لەگەڵ ئەم وێنانەدا، کۆکرانەوە و لە سەنتەری کولتوری شاری ڤینیسیا بە ئامادەبوونی بەرپرسی شارەوانی ڤینیسیا و سەرۆکی کومونیتای کورد لە ئیتالیا، نمایش کران. ئەم پێشانگەیە یەک هەفتە بەردەوام بوو و قوتابخانەکان بە گروپ دەهاتن بۆ تەماشاکردنی و ئێمەش کاری ڕوونکرنەوەی وێنەکانمان گرتبووە ئەستۆ لەگەڵ باسکردن لە چۆنییەتی پێکهاتنی ئەو پێشانگەیە. هەمان پێشانگە لە چەندین شار و شارۆچکەی تری ئیتالیا نمایش کرا و دووجاریش بەشداری کرد لە فیستڤاڵی منداڵانی"هەفتەیەک بۆ منداڵانی وڵاتانی دەریای ناوەڕاست" لە خواروی ئیتالیا لە شاری "ئۆستونی" لە ساڵی٢٠٠٣ و لە ساڵی٢٠٠٤یشدا. بۆ دووەم جار، لە مانگی٤ ساڵی٢٠٠٤دا، ئەو وێنانەی کە لەلایەن منداڵانی ئیتالییەوە کێشرابوون، برانەوە بۆ شاری کەرکوکی بووکی کوردستان و بە هاوکاریکردنی منداڵانی پارێزگای کەرکوک لە سەنتەری"کازیوە"ی منداڵان، بۆ ماوەی سێ ڕۆژ لە پێشانگەیەکدا لە ژێر ناونیشانی"کوردستان لە ڕوانگەی منداڵانی ئیتالییەوە" نمایش کران و پەیمانیش وابوو کە بە یارمەتی ڕێکخراوەکان ئەم پێشانگەیە بچێتە شارەکانی تری کوردستان، تا منداڵانی تری کورد بەم چالاکییە ئاشنابن. لە ڕۆژی٢٠/٥/٢٠٠٥دا، لە شارۆچکەی سپینیە لە ڤینیسیا کۆنفرانسێک بۆ مامۆستایان و قوتابیانی لایەنەکانی پەروەردە، لە ژێر ناوی"منداڵان شەڕیان ناوێت" گرێدرا و ئێمەش بەشداربووین بە چەند وتارێک لەسەر ژیانی منداڵانی کورد لە کاتی شەڕ و ئەو ئاکامانەی کە لێی دەکەوێتەوە. هەر لە پەراوێزی ئەو کۆنفرانسەدا، هەمان پێشانگە بۆ ماوەی هەفتەیەک پێشکەش کرا. ■■■

## کەلوورەکانی هەفتە



**کاوڕ** ٣.٢١ تا ٤.٢٠



لەناکاو ئەو چالاکییەی هەتە لەو کارەی کە پێت سپێردراوە، لە دەست دەدیت، بەڵام ئەگەری ئەوە هەیە دەرفەتی باشترت بۆ بڕەخسێت. ڕۆژی بەختەوەریت چوار شەممە، ژمارەی بەختت٣

**گا** ٤.٢١ تا ٥.٢٠



گۆرانیکی سەیر دێت بەسەرتدا و ئەوەی زۆر گرنگە بایەخی لای تۆ نامێنێت، ڕۆژی بەختەوەریت شەممە، ژمارەی بەختت٨.

**دوانە(جمک)** ٥.٢١ تا ٦.٢١



ئەم هەفتەیە باری دەروونیت دەگۆڕدرێت و حەز دەکەیت دەورووبەرەکەت کۆنترۆڵ بکەیت و هەموو شتێ بە هەوەسی خۆت بێت. ڕۆژی بەختەوەریت دووشەممە، ژمارەی بەختت١

**قرژاڵ** ٦.٢٢ تا ٧.٢٢



کاتێک تووشی کێشە دەبیت حەز بە گۆشەگیری دەکەیت، بەڵام بزانە هۆی سەرەکی ئەو کێشەیە خۆتیت. ڕۆژی بەختەوەری پێنج شەممە، ژمارەی بەختت٥.

**شێر** ٧.٢٣ تا ٨.٢٢



خۆت بپارێزە لە دەست بڵاوی چونکە باری ئابووریت خەریکە بەرەو هەڵدێر دەڕوات. ڕۆژی بەختەوەریت سێ شەممە، ژمارەی بەختت٤.

**فەریک** ٨.٢٣ تا ٩.٢٢



کار گرنگە بەڵام ئەوەندە نا کە خێزانت لە بیر بەرێتەوە، هەوڵ بدە بە خۆتدا بچیتەوە. ڕۆژی بەختەوەریت هەینی، ژمارەی بەختت٨.

**تەرازو** ٩.٢٣ تا ١٠.٢٢



خۆت لە گفتوگۆی بێ سوود لادە، چونکە لەوانەیە ببێتە هۆی لە دەست دانی هاوڕێیەکت. ڕۆژی بەختەوەیت چوار شەممە، ژمارەی بەختت٦.

**دوو پشک** ١٠.٢٣ تا ١١.٢١



هەندێ شت ئەگەر زیانی بۆت نەبێت ئەوە پەسەندی بکەیت باشترە بۆت. ڕۆژی بەختت یەک شەممە، ژمارەی بەختت٣.

**کەوان** ١١.٢٢ تا ١٢.٢١



هەوڵی گۆڕانکاری لە شێوەی کارکردندا بدە چونکە باشترە بۆت. ڕۆژی بەختەوەریت سێ شەممە، ژمارەی بەختت٧.

**گیسک** ١٢.٢٢ تا ١.١٩



کاتێک بۆ خۆت دیاری بکە کە تیایدا پشوو بدەیت و لە گێژاوی ژیان دوور کەوێتەوە. ڕۆژی بەختەوەریت هەینی، ژمارەی بەختت٤.

**سەتڵ** ١.٢٠ تا ٢.١٨



بایەخ بە هەندێک لە هاوڕێکانت بدە چونکە بەرژەوەندی تۆیان دەوێت. ڕۆژی بەختەوەریت دووشەممە، ژمارەی بەختت٩

**نەهەنگ** ٢.١٩ تا ٣.٢٠



زۆر باوەڕت بە خۆت هەیە و وەک تاوسێک خۆت با دەدەیت، چاکتر وایە ئاگات لە خۆت بێت. ڕۆژی بەختەوەریت شەممە، ژمارەی بەختت٢.




## ئالای عێراق نیشانەی شەرم و سەرشۆرییە!

ماوەیەکە باس و خواسی گۆڕینی ئالای عێراقی لە ئارادایە ، ئەو ئالایەی ١٨٢ هەزار کوردی لە سایەدا ئەنفال کرا و هەڵەبجەی لە سایەدا کیمیاباران کراو ٥٠٠٠ شەهیدی لێ کەوتەوە و بادینان و گەرمیانی لە سایەدا شەهیدکرا ، ئەو ئالایەی شەرەفی میللەتێکی لە سایەدا هەتک کرا و بووەتە مایەی سەرشۆڕی و زەلیلی سەرتاپای میللەتێک، ئەو ئالایەی نیوەی دایکانی کورد و عێراقیەکانی لە سێبەردا رەشپۆش بوو ، ئەو ئالایەی هەرچی تاوانەکانی سەردەمە لە ژێر سێبەریدا بە ئەنجام گەیەنرا !! کەچی هەر ئەو ئالایەیش بوو لە پاڵیا یەکەمین سەرۆکی یەکەمین کۆماری عێراقی دوای سەدامی خوێنڕێژ و دوای سەردەمی خوێناوییترین رژێمی شۆڤێنی لە مێژووی مرۆڤایەتیدا سوێندی سەرەک کۆماری خوارد، ئەو ئالایەی یەکەمین پەرلەمانی عێراقی دوای رووخانی رژێمی بەعسی گۆڕبەگۆڕ یەکەمین کۆبوونەوەی لەسایەدا کرد، ئەو ئالایەی لە سێبەریدا یەکەمین دەستوری کاتی سەردەمی دیموکراتی دوای کەوتنی رژێمی دیکتاتۆری عیراقی تیا هۆنرایەوە، ئەو ئالایەی بووەتە نیشانەی سەرشۆڕی و شەرمەزاری نەک هەربۆ کورد بەڵکە بۆ هەموو گەلانی عێراق بە هەموو کەمەنەتەوەکانیەوە ..

ئەمڕۆ داوا دەکرێ ئەو ئالایە بگۆڕدرێ بە ئالایەکی تر ، ئەی ئەو کاتەی سەددام وەکوو جرج لەکونەکەی پەلکێش کرا لەگەڵیدا ئەو ئالایەش نەسووتێنرا؟ ئەی ئەوکاتەی بەغدا کەوتە دەست هێزەکانی هاوپەیمان ئەو ئالایە بۆ نەسووتێنرا؟ بەڵام ئالێرەدا پێویستە بپرسین : ئایا تەنها بەگۆڕینی ئەو ئالایە هەموو کێشە و گرفتە سیاسیەکانی عێراق ئەبڕێتەوە؟ ئایا بە گۆڕینی ئەو ئالایە سەروەری ئەگەڕێتەوە بۆ وڵاتێک هیچ مانایەکی بۆ مافەکانی مرۆڤ تیا نەمابوو و ئیدی هیچ مانایەکی تیا بۆ سەروەری نەماوەتەوە؟

گۆڕینی ئالای عێراق شتێکی ئاسان ئەبێت ئەگەر پێش ئەوە هەموو هەڵگرانی بیری شۆڤێنی بەعس لە پۆستە حکومیە گەورەکاندا نەمێنن، نەک پرۆسەی گۆڕینی ئالاکەش هەڵگرانی بیری شۆڤێنی بەعس پێی هەستن ، کەواتەی ئەوەی رووئەدات ئەوەیە ئالاکە ئەگۆڕدرێ بەڵام بیری بۆگەنی بەعس وەکوو خۆی ئەمێنێتەوە ، داخوا ئەبێت کامیان پێش کامیان کەوێت؟ گۆڕینی ئالاکە یان پاکردنەوەی ئاسەواری بیری بۆگەنی بەعس ؟ یان داخوا دەستووری هەمیشەیی دەبێت لە سایەی چ ئالایەکدا بنووسرێتەوە و کێ بینووسێتەوە؟ ئەوەی باسی لێوە دەکەین پرۆسەیەکی گەلێ گرێدار و ئاڵۆزە ، چونکە ئەرکەکان گەلێ زۆرن، هەر لە گۆڕینی ئالاکەوە بیگرە تا لەناوبردنی بیری بۆگەنی بەعس لەناو عەقڵەکان و پاکردنەوەی دامودەزگاکانی حکومەت لە بیر و پەیرەو و پرۆگرامی شۆڤێنی بەعسی گۆڕبەگۆڕ، هەتا دەگاتە کێشەی کەرکوک و گەڕانەوەی ناوچە کوردستانیەکان بۆ ناو باوەشی کوردستان و تا دەگاتە ئاساییکردنەوەی بارودۆخی ناو شاری کەکوک و گێڕانەوەی راگوێزراوەکان و چارەسەرکردنی هەموو کێشە هەڵواسراوەکانی پاش رووخانی رژێمی بەعس..

ئایا تەنها بە گۆڕینی ئەو ئالایە هەمو ئەوانە دێتەدی ، یان دەبێت هەموو ئەوانە جێبەجێ بین ئینجا بیر بکرێتەوە لە گۆڕینی ئالا؟ ■■■

### بۆچی ڕێژیمی تورکیا هێندە پێ دادەگرێ لەسەر:

# تێوەگلانی هێزی سەربازیی ئامریکا و عێراق و هێزی پێشمەرگەی کوردستان لە شەڕ بەدژی کەریلاکانی کۆنگرەی گەل (پ ک ک) ی پێشوو؟

زاهید شاعیری - سویس

هیچ گومانێک لەوەدانییە کە دەوڵەتانی داگیرکەری کوردستان هەمیشەو لەهەموو کاتێکدا دژی هەر چەشنە بزوتنەوەو ڕاپەڕینێکی حەق خوازانەی گەلی کورد بوون هەروەها دەشبن، جا ئەو بزوتنەوەیە بەهەرشێوەیەک بووبێ چ فەرهەنگی و چ ڕامیاری و چ چەکدارانە یا لە هەر پارچەیەکی کوردستان بێ، بە دژی هەر چوار دەوڵەتە داگیرکەرەکی دەزانن و بۆ سەرکوتکردنی لە هەموو ناکۆکیەکانی نێوان خۆیان چاوپۆشی دەکەن و دەبنە یەک هەڵوێست، هەر وەکوو مێژوو سەلماندوویەتی بەبێ هیچ بزوتنەوە و ڕاپەڕینێکیش دژایەتی تەواویان لەگەڵ هەرتاکێکی کوردو ناوی کورد و کوردستانیش هەیە، بۆیە دژایەتیکردنی دەوڵەتی تورک لەگەڵ چەکدارەکانی کۆنگرەی گەل و سەرجەم پارتو لایەنە ڕامیاریی و چەکدارەکانی گەلی کورد شتێکی زۆر ئاساییە، پێمانیە پێویست بەباس لەسەرکردن بکات. ئەوەی بە پێویستی دەزانم باسی بکەم، کە بەلای من و زۆربەی شارەزایانی نەخشە و پلانە گلاوەکلانی دوژمنانی داخ لەدڵی گەلەکەمانەوە گرنگە جوابی پرسیارەکەی سەرەوەیە (سووربوونی تورک کە عێراق و کورد و ئامریکا بێنێتە ناو مەیدانی شەڕی کورد شۆڕشگێڕەکانی ژێر دەستی خۆی)، دیارە ئەوەدەسکەوتانە بەهیوایە لە بۆچوونەسەری ئەوپیلانەیدا وەدەستیان بێنێ زۆرن، کە یەکڕاست دێمە سەر ئەوخاڵەی پەیوەندی ڕاستەوخۆی هەیە بە بارودۆخی کوردستانی باشوور و ئەو دەسکەوت و ئەزموونە بەنرخانەی لەو بەشەی کوردەستان وەدەستت گەلەکەمان کەوتوون کە بەرهەمی ڕەنجی دیان ساڵەی خەبات کارانی کورد و خۆێنی سەدان هەزار شەهیدی کوردستانە بەبێ لەبەرچاوگرتنی سنورە دەسکردەکانی داگیرکەران، هەروەکوو چۆن دڵ و ویژدانی کورد لە هەرچوار پارچەی کوردستان و هەرقوجبێکی ئەم دنیایە شانازی پێوەدەکات. لە هەمان کاتدا بەبڕشترین و جەرگبڕترین چەکە کە بەڕاستی جیا لەوەی یەکێک لە دڕندەترین دوژمنانی گەلەکەمانی (ڕێژیمی سەدامی) بەتەواوی بەچڕک داهێناو، بێگومان سێ دەوڵەتە داگیرکەرەکە کەی کوردستانیش بە تەواوی پیاڵەی ئەو ژەهرەیان نۆشیوە،بەرلەوەی گیانی زاڵمانەیەن لە لەش دەرچێ لەهەوڵی دوزینەوەی هتوانێکدان کە دەرمانی دەردەکەیان لە تێکدان و شیواندنی کوردستانی باشووردا وە دەست بێنن. بەڕێزان نە بەپێویستی دەزانم نە دەشتوانم بە ژمارەی یەک یەکی دەسکەوت و ئەزموونە بە نرخەکانی گەلەکەمان، کاتی هیچ خوێنەرێک بگرم، بەڵام ئامازە بە خاڵێکی گرنگ کە پەیوەندی ڕاستەوخۆشی هەیە بەم باسەوەوە، یەکێک لە وەڵامە سەرەکییەکانی پرسیارەکەی سەردێڕی بابەتەکەیە، ئەویش باری ئەمنی و ئاسایش لەو بەشەی کوردستانە کە کورد ئیدارەی دەکات سەرەڕای ئەوەی بۆتە هۆی پاراستنی گیانی هاووەڵاتیان و بەرزترین لوتکەی شانازی، کە هەموو کورد نەفەسی لەسەرهەڵدەکێشێ، بەشێوەیەکی بەرچاو لەناو دنیادا دەنگی داوەتەوە، بۆتە هۆی سەرسوڕمانی بیروڕای گشتی دنیا، ئەو پلانەی کە هەمیشە نەیارانی کورد بەدژی ئەم گەلە بەکاری دێنا بۆ بەدناوکردنی بەتەواوی وەدڕۆدەخاتەوە ( کە کورد گەلێکی دڕندەو شەڕانیو...) بەدرێژایی مێژوو، ئیدارەکردنی ئوستانێک (محافزێکیان) یان پێ ڕەوا نەدیوە تەنانەت حاشا لە مەوجوودیەتیشی کراوە، بۆ سەلماندنی ئەو ڕاستییە یا بەلگە بۆ ئەو پێشکەوتنە بەرچاوەی کوردستان کە بۆتە چەقلی چاوی دوژمنان ئەوندە بەسە کە (جۆرج بوش سەرۆکی ولایەتە یەکگتوەکانی ئامریکا کە وەکوو گەورە سیاسەتمەداری سەردەمیش دێتەئەژماردن، لە مێژگردێکدا کە بۆ نوێنەرانی کەمەنەتەوەکانی دانیشتووی گورجستان لە هەمان وڵات پێک هاتبوو، لە وەڵامی پرسیاری هەواڵنێرێکی چیچانیەوە کە بەم جۆرە بەرەوڕوی سەرۆک بوش دەکرێ: دۆڵی (پانکیست)کە بەشێکی خاکی گورجستانە تۆزریستان هێرش دەکەنەسەر ئەو ناوچەیە ئێوە چ چارەیەک بۆ ئەم ناوچەیە دەبینن؟ لەوەڵامی ئەو پرسیارە کورد و هەرێمی کوردستان وەکوو نمونەیەکی سەرکەوتوو لەو بوارەدا دێنێتەوە، پێشنەهاد دەکات کە خەڵکی ئەو ناوچەیەش لەو ئەزمونەی گەلی کورد دەرس وەربگرن واتە هاریکاری و دااڵدەی تروریستان نەدەن، ئەو پرسیارە و چەندین پرسیاری هاوشێوە کە بۆ چارەسەری کێشە و گرفتە ئەمنیەکان و بەربەرەکانی لەگەڵ دیاردەی دزێوی تروریست گەلی کوردی بەنمونە باسدەکات، ئەزمونەکانی ئەو گەلەی بەباشترین مەکتەب دەنرخێنێ)، لەدوای ڕاپەڕینەشکودارەکەی ١٩٩١ کە بەشێکی کوردستانی لە ژێر کەڵبەی سەگی هاری سەردام دەرهێنا، دوژمنانی کوردستان، ڕێژیمەکانی ئێران و تورک و تەنانەت سوریەش هەمیشە هەوڵی شێواندنی ئەو بەشەی کوردستانیان داوە. قەت ساتێک لە ئاژاوە نانەوە غافڵ نەبون، لەلای هەموو کەسیش ڕوونە کە هیچ ئاگرێکی شەڕی براکوژیش بێ دەستەچیلەی ئەوان هەڵنایساوە، نمونەی هەرە بەرچاویان جوندول ئیسلامی دەست پەروەردەی یا باشترواید بڵێم داردەستی ئاخوندە داخ لەدڵەکانی ئێران بوو کە بەوجودی نامبارەکیان ئەو کەلێنە گەورەیە لە ئیستانی ئاسایشی ناوچەیەکی بەرچاوی کوردستانی باشوور کەوتبوو، لەگەڵ سەدان بەڵگەی حاشاهەڵنەگری هاوشێوە، بەبێ هیچ مەبەستێکی تایبەت تەنیا لەبەر وێک چونی پیلانەکە ئامازە بە نمونەیەکی کەش دەکەم کە بەخۆشیەوە لەگەڵ شکەست بەروڕووبو، ئەویش هەوڵە زۆرەکانی کۆماری ئیسلامی بوو بۆ هەڵایسانی ئاگری دووبەرەکی و شەڕی براکوژی لە نێوان حیزبی دێمکراتی کوردستانی ئێران و حیزبە دەسەڵاتدارەکانی کوردستانی ئازادا کە بە ناردنی تروریستوو پیاوکوژەکانی بۆ ناوخاکی کوردستانی باشوور، تەنانەت لە ناوەڕاستی ئەو خاکەدا دەستدرێژی نیزامی کردنەسەر بنکەکانی ئەو حیزبە، هەر چەند بەداخەوە لەو پیلانانەدا زیانی زۆری گیانی و مالی لە (حزبی دیموکراتی کوردستانی ئێران) و چەند پارت و لایەنی دیکەی سیاسی کوردی بەرهەڵستکاری ڕێژیمی دژە بەشەری ئێران کەوت، بەڵام هیچ کاتێک خەونە ڕەشوو ئاواتە گلاوەکەی دوژمنان نەهاتەدی و بەڵکوو بە پێچەوانە بە زیاتر هەست کردن بە قین لەزگی دوژمنان پەیوەندی دوستانەو برایانەی نێوان ئەو برا لێک دابڕاوانەی قایم و پتەوتر بووە. بێ گومان ڕێژیمی تورکیاش پیلانێکی لەو شێوەیەی بە دەستەوەیە کە بە تیرێک چەند نیشانەی گرنگ بپێکێ، ئەگینا کاربەدەستانی تورک دڵنیان بە هێرشکردنە سەر بنکەکانی گەریلاکانی کۆنگرەی گەل، ناتوانێ بە یەکجاری ئەو سازمانە بتوێنێتەوە و کۆتایی بە خەباتی حەق خوازانەی نەتەوەیەکی گەورەی وەک کورد یا لانی کەم کوردستانی باکور بێنێ، ڕەنگە تەنیا بتوانێ بنکەکانیان لەژێردەست دەرهێنێ و بە هێرش کردنەسەریان دوای خەساراتێکی گیانیی و مالی خەباتەکەیان لە چیاکانەوە پێ بکێشێتە ناو شارەکانەوە، کە بێگومان لەو جێبەجێبوونەی شوێنی خەباتەکە خۆی زیاتر زەرەد دەکات، هەروەکوو لەڕابردودا ئەو ئەزمونەتاڵەی تاقی کردووەتەوە، بەڵام ئەگەر بەهاوپەیمانی ئامریکا و عێراق و هێزی پێشمەرگەی باشووری کوردستان بێ، سەرەڕای ئەوەی پەیوەندی لەگەڵ ئامریکا کە چەند ساڵە بەڕوو کزی دەچێت وەدەست دێنێتەوە، بە هوی ئەو هاوپەیمانەی لەگەڵ دەوڵەتە لەرزۆکەکەی عێراقیشدا دروستی دەکات مەیدانی بۆ دەستتێوەردان لە کاروباری ناوخۆی عێراقی بۆ بەر بڵاوتر دەبێتەوە. دڵنیایە دوای لێک بڵاوبونی بنکە سەربازیەکانی کۆنگرەی گەل شەڕێکی لەشێوەی تەقاندنەوە و خەرابکاری لەناو شارەکاندا دەست پێدەکان، تۆزی ئەو دوژمنایەتیەی دەوڵەتی تورک بۆی چاندون زیاتر هانیان دەدات، بێگومان بەدەردی دایکە پیرەکانمان دەڵێنن خوابەوێ ڕۆژێ نەکات زمانم لاڵ،زمان لاڵ ئەو ڕۆژەبێت لەبەر ئەوەی دار هۆرەکەی لەخۆیەتی دوژمنانی کورد و کوردستان لە ئاواتە پوچەڵەکەیان نزیکتر دەبنەوە. باری ئەمن و ئاسایشی ئەو هەرێمە ئازادەی کوردستانیش دەشێوێنن. دورنیە کاربەدەستانی عەرەبی حکومەتی ئیستای عێراقیش پێشوازی لەو پیلانە گلاوە بکەن. بەڵگەیەک کە دەکرێ لەو بارەیەوە پشتی پێ ببەسترێ، ئەو هەوڵانەی ئەم دوایانەی یا دەکرێ بڵێین یەکەم هەوڵی جەعفەری سەرۆک وەزیرانی عێراقە بەتایبەت لە سەفەرەکەی دا بۆ تورکیا و تەنکیدی لەبوونی بەرژەوەندیی هاوبەش لە نێوان دوو وڵاتداکردەوە، ئامادەی دەوڵەتەکەی بۆ هاوکاری تەواو لە مەڕ چارەسەری کێشەی کۆنگرەی گەل دەربڕی. بەڵام دوای ئەو هەموو بژچوونانەشم گەشبینم بەوەی کە کاربەدەستانی باشووری کوردستان بەتایبەت دوو پارتە سەرەکیەکەی کورد، هیچ کاتێک فریوی دوژمنانی کورد و کوردستان ناخۆن. چارێکی تر ڕێگە نادەن کوردێک خوێنی کوردێک بڕێژی، بە پوچەڵکردنەوەی ئەو پیلانەی تورکیا شانازییەکی بەقەد چیای قەندیل بەشانازییە یەک لەدوای یەکەکانی ئەو چەند ساڵەی دوایی کە بۆ گەلەکەمانیان دەخولقێنن زیاد دەکەن و، مستێکی تۆندی چەکوچەکەی کاوە لە دەمی زوحاکەکانی زەمانە دەدەن. هیوادارم کۆنگرەی گەلیش ئەو هەلومەرجەی ئەورۆی کوردستان دەرک بکات بە هەڵوێستی بەجێ هەوڵ بدات تا دوژمنانی گەلەکەمان جۆرێک سەریان وەبەرد بکەوێ کە جارێکی کە بیر لەو نەخشە و پیلانانە نەکەنەوە. ■■■

٢٠٠٥/٥/٢٢
Shaheri2004@yahoo.com

ئاژانسی تۆریستی
NEW PLAN
ئێمە ئامادەی خزمەت کردنی هاوڵاتیانی کوردی عێراقین
کوردستان لە ڕێگای تارانەوە
قیزای ئێران لە ماوەی دوو هەفتەدا
خەڵات
لەگەڵ هەر بلیتێکی دووسەرەی تاران، مەودای خواردن لە شیکترین ڕێستوران لە تاران بە مۆزیکی زیندوو
بلیت بۆ سەرتاسەری جیهان
حەجی "عمرە"
گەشتی توریستی بۆ سەرتاسەری جیهان
تاران لە٣٢٠€وە
Thomas-Mann Str, 24
53111 Bonn
Germany
Tel.: 0049 (228) 180 24 34
Fax: 0049 (228) 180 24 38
E.Mail: info@newplan-travel.de
www.newplan-travel.de

بەکوردی بدوێ، بەکوردی بخوێنە،
بەکوردی بنووسە، بەکوردی بیربکەرەوە!

پەیامی کورد ئامادەی بڵاوکردنەوەی ریکلامەی بازرگانی و بڕوسکەی پیرۆزبایی و پرسەنامەیە بەنرخێکی گونجاو

دیداری هەڵگەوت زاهیر لەگەڵ:

# هونەرمەندی گۆرانیبێژ "ئەیوب عەلی"

پەیامی کورد لە نزیکەوە، هونەرمەندی گۆرانیبێژ "ئەیوب عەلی" دواند و لە میانەی کۆمەڵە پرسیارێکی جۆراوجۆرەوە لە ژوان لایەنی پەیوەست بە هونەرەکەی، تیشکی خستە سەر ئەو لایەنانە و ئەم چاوپێکەوتنەی خوارەوەی لێ کەوتەوە.

**هەڵگەوت: سەرەتای دەستکردن بەکاری هونەری بۆ کەی دەگەڕێتەوە ؟**

**ئەیوب:** سەرەتای هونەریی من دەگەڕێتەوە بۆ ڕۆژانی خوێندنم کە لە زانکۆی سەلاحەدین لە کۆلیجی ئەندازیاری ئەمخوێند بە هاوکاری هاوڕیی بەڕێزم هونەرمەند کاک بڵند قەرەداخی، بووم بە ئەندام لە تیپی مۆسیقای زانکۆ، سەرەتای تۆمارکردنی گۆرانیم و وێنەگرتنی بۆ تەلەڤزیۆن دەگەڕێتەوە بۆ ساڵی ١٩٩٧، هونەرمەند کاک زانا مەحمود هەژار بە چەند ئاوازێک هاوکاری کردم، بەڵام پێش ئەوەی کوردستان بەجێ بهێڵم چەند گۆرانیەکەم بەبەرهەم هێنا، واتە چەند بەرهەمێکی کەمم هەبوو ئەوە بوو لە ساڵی ٢٠٠٣ یەکەم ئەلبومی گۆرانی بەناوی (دڵم مەشکێنە) بڵاوکردەوە، پاشان بەرهەمی ٢٠٠٤ بەناوی (خەمێکی بێ کۆتایی) ئێستا بەردەوامم لە خزمەتدام بەڵام باوەڕم بەزۆری بەرهەم نیە بەڵکو بەکەمی و پوختی بەرهەم، واتە مەرج نییە هەموو ساڵێک بەرهەمت هەبێت ئەگەر بەرهەمەکە هونەرییەکە لەوەی ئێستاکە بەرزتر نەبێت.

**هەڵگەوت:** دەنگی ئەیوبی هونەرمەند چ ستایلێکی لە خۆگرتووە؟ چۆن دەڕوانیتە ستایل لە گۆرانی کوردیدا؟ و تا چ ئەندازەیەک گۆرانی بێژان هەوڵیان لەگەڵ داوە؟

ئەیوب: لەسەرەتای دەست پێکردنمدا بە هونەری گۆرانی وتن بە شێوەیەک گۆرانیم دەوت کە چەند ستایلێکی لەخۆگرتبوو، چونکە چەند هونەرمەندێک ئاوازیان بۆ دا ئەنام کە هەریەکەیان بە ستایلێک کاریان دەکرد، من لەو قۆناغەدا بەقۆناغی خۆدۆزینەوە دەڕۆیشتم. ئێستا من بە ستایلێک گۆرانی دەڵێم کە بە ئەرەبیسک ناو دەبرێت کە ئەم ستایلە تارادەیەک تازەیە لە هونەری گۆرانی کوردیدا.

**هەڵگەوت: ئەمڕۆ گۆرانی کوردی چۆن دەبینی و کارە هونەریەکان چۆن هەڵدەسەنگێتی؟**

**ئەیوب:** بە بڕچوونی من گۆرانی کوردی ئەمڕۆ بەرەو پێش چونێکی باشی بەخۆیەوە بینیوە، لەڕووی وتنکەیەوە ستایلی تازە کولێتی تۆمارکردنی هۆنراوە، کلیپ کردن وە چەندین لایەنی دیکەش من زۆر گەش بینم کە بەرەو پێش چوونی زۆر باشتریش بەخۆیەوە دەبینێت لە ماوەیەکی کەمدا بەرهەمی هونەری زۆر جوان و بەپێز دەبینم لە ئەمڕۆی گۆرانی کوردیدا هیوام ئەوەیە هەر لە گەشەو سەرکەوتندا بێت.

**هەڵگەوت: زیادبوونی ڕێژەیەکی زۆر لە گۆرانی بێژان چۆن سەیردەکەیت؟ ئایا بەهەموویان دەوترێت هونەرمەند؟**

**ئەیوب:** یاریدەی زۆربوونی گۆرانی بێژ دیاریدەیەکی جیهانیە بەڵام بەرهەمەکە خۆی بڕیاری ئەمە دەدات کە ئایا بەو کەسە ئەوترێت گۆرانی بێژ یاخود نا.

**هەڵگەوت: لە پێشوودا هۆنراوە دەکرایە گۆرانی، ئێستا لە هەندێ کاری هونەری دەبینی تێکست تایبەت دەنووسرێ بۆ گۆرانی ئێوە چی دەڵێن؟**

**ئەیوب:** بەڕاستی هۆنراوە و هۆنراوەی گۆرانی بەلای منەوە جیاوازە لە یەکتری من زۆربەی جار کە هۆنراوەی ئاوازێکم بەدڵ نەبووە هەوڵم داوە لەسەر هەمان ڕیتم هۆنراوەیەکی دیکە بنووسمەوە بۆ ئاوازەکە تارادەیەکێش سەرکەوتوو بووە، ئەگەر گۆرانی بێژ بتوانێ هۆنراوەی گۆرانیەکانی خۆی بینووسێت بەستێکی ڕاستەقینە و بەشێوەیەکی زیرەکانە ئەوە بێگومان بەرهەمەکە سەرکەوتوو دەبێت

**هەڵگەوت: ئەیوبی هونەرمەند ڕا و سەرەنجی چییە بۆ ئەم هونەرمەندانە:**

**ناسری ڕەزازی، مەرزییەی فەریقی، زیاد ئەسعەد، لەیلا فەریقی، عەدنان کەریم، نجمەدینی غولامی، دیاری قەرەداغی، ئالان عومەر؟**

**ئەیوب:** بەر لەوەی ڕاو و سەرەنجی خۆم بڵێم سەبارەت بە هەر هونەرمەندێک من بەشێوەیەکی گشتی لەناخی دڵمەوە هیوای سەرکەوتنی ئەخوازم، بۆ هەموو ئەو هونەرمەندانەی کە بەدڵسۆزییەوە خزمەت بەهونەر دەگەیێنن، و هونەرمەندی ڕاستەقینەی کە من زۆر بە کورتی؛ دەتوانم چەند وشەیەک دەربارەی بڵێم، ئەم هونەرمەندە ئەزیزانەی کە ناوت هێناون:

١- ناسری ڕەزازی ... دەنگێکی پڕ جۆش و خرۆش و پڕ لە هەستی کوردایەتییە بەشێوازێکی تایبەتی خۆی مەقامەکان دەچڕێت، جگە لەوەی کە هونەرمەندێکی گەورەی گەلەکەمانە، دەتوانم بڵێم شۆڕشگێرێکی کوردە و بێگومان دەنگی ناسری ڕەزازی قوتابخانەیەکە دەبێت بە داهاتووی هونەری گۆرانی کوردی.

٢- خاتوو مەرزییە فەریقی ... دەنگێکی پڕ لە سۆز و کوردایەتیە، بەبڕچوونی من توانیوێتی زۆر سەرکەوتووانە سروودە نیشتمانییەکان بچرێت.

٣- زیاد ئەسعەد ... هونەرمەندێکی زۆر بەتوانایە بەتایبەت لە بواری ئاواز و هۆنراوەدا کەشایەنی سوپاسە، جگە لەوەی جوانترین شێوەی ئەدایی گۆرانیەکانی ئەکات، شیرین کاری زۆری لەدەنگیدا دەبیسترێت.



ئەیوب عەلی: ئەگەر عەشقێک نەبووایە هەرگیز نەدەبوومە گۆرانیبێژ!!

گەورەکانی گەلەکەمان، جگە لە هونەرەکەی کە هەمووی شۆڕشێک بووە بەتایبەتی بە سروودە پڕ هەستەکانی هەمیشە کوردیت بە بەرهەم و هەڵسووکەوتی کاک نەجمەوە دیارە.

٧- دیاری قەرەداغی ... دەنگێکی پڕ لە لاوانەوەی ئازار و خەمەکانی گەل و دڵداران و عاشقان، شێوەیەکی تایبەتی خۆی هەڵبژاردووە، کە زۆر سەرکەوتوانە گۆرانی پێ دەڵێت تازەگەری لە بەرهەمەکانی دا بەدی دەکرێت.

٨- ئالان عومەر ... زۆر دڵسۆزانە هەمیشە لە هەوڵدانایە بۆ بەرهەمی نوێ و خزمەت زیاتر بە هونەری دەنگێکی بەسۆزە پڕ لە عەشقە.

**هەڵگەوت: بۆ گۆرانی کوردی نەیتوانیوە جگە لە کورد لای میللەتانی دیکە بناسرێ، ئەو بەرهەمە هونەریانەی خزمان گۆیان پێ**

**ئەمەین بۆ نموونە لە عەرەب ئوم کلسوم، وەک بیانی کریستینا ئاگوایلرا و سلین دیۆن....هتد؟**

**ئەیوب:** پارچە پارچەکردنی کوردستانی گەورە کاریگەری هەبووە لەسەر لایەنەکانی ژیانی کورد، یەکێک لەو لایەنانە هونەری گۆرانیە، کورد هەر پارچەیەکی کوردستانی خۆشەویست چەند کاریگەرییەکی دەرەکی هەیە بەسەر هونەرەکان، ڕاستە ئێمە خاوەن سەرچاوەیەکی فۆلکلۆری دەوڵەمەندین، ڕاستە هونەری تایبەتی بە خۆمانەوە هەیە بەڵام بەداخەوە بوار و دەرفەت ڕەخساوە بۆ گەیاندنی هونەرەکەمان بە وڵات جیاجیاکانی جیهان، هەرچەندە ئێستا هەوڵ هەیە لەم بوارەدا بەتایبەتی مۆسیقای فۆلکلۆر کوردی، کە لەچەند ساڵێکی داهاتوودا بەشێوەیەکی باش گەشە بکات و ببێتە هۆی ناساندنی هونەری گۆرانی کوردی بە جیهان، بەڵام بەداخەوە هێشتا ئەو هەنگاوانەی نراوە بەرەو ئەو ئامانجە بچووکن و پێویستە خێرا بگۆڕدرێن.

**هەڵگەوت: پڕۆژەی تازەتان چییە؟ و هیچ کەسێ هەیە یارمەتیت بدات وەک بواری ئابووری ئەگەر نا ئێوە چۆن کارەکانتان ئەنجام دەدەن؟**

**ئەیوب:** من لەوەتی کوردستانم جێهێشتووە، هەمیشە سەرقاڵی هونەر بووم، هەموو کات ماندووبونی خۆم بۆ خزمەت بە هونەرەکەم تەرخان کردوە، و توانیومە لە ماوەی چەند ساڵێکدا دوو ئەلبوومی گۆرانی بەرهەم بهێنم کە هەمووی لەسەر ئەرک و ماندووبونی خۆم بووە، بەتایبەت لە لایەنی دارایی کە هیچ کەس و هیچ لایەنێک هاوکاری نەکردوم، هاوڕێیەکی خۆشەویستی خۆم کە هەمیشە پاڵپشتم بووە زۆر یارمەتی داوم لە ڕووی ئابوری بۆ تۆمارکردنی بەرهەمەکانم کە ئەویش کاک ئەرکانە، ئێستا پڕۆژەی داهاتووم ئامادەیە بەڵام زۆر بەداخەوە کە توانای ئەوەم نیە تۆماریان بکەم بەهۆی دیاردەی کۆپیکردنی نایاساییەوە، من زیانێکی ئێجگار گەورەم پێکەیشتووە کە ئەم کێشەی زۆربەی گۆرانیبێژەکانی دیکەشە، نازانم تاوەکو کەی ئەم خەمانەی گۆرانیبێژانی کورد هەر وا دەمێنێتەوە؟! بەڕاستی ئێمەش پێویستمان بە هاوکاری هەیە بۆ ئەوەی بتوانین لە خزمەت بەردەوام بین. من ئامادەیم هەیە ژیانی خۆم بۆ خزمەتی هونەر تەرخان بکەم، بەڵام خۆشە ئەگەر بەرپرسان ڕێزێک یاخود شایەتێک بۆ هونەرەکەمان دابین و کێشەکەمان چارە بکەن، چارەسەرکردنی کێشەی کۆپی کردنی نایاسایی زۆربەی کێشەکەمانی ئێمە چا دەکات، هەبوونی کۆمپانیایەکی خاوەن دەسەڵات بۆ بڵاوکردنەوەی بەرهەمەکان هاوکات لە تەلەڤزیۆنەکان کەناڵە ئاسمانیەکان زۆر پێویستە بۆ ئێمە زۆر بەداخەوە دەڵێم هونەرمەندی دەرەوەی وڵات لە زۆر لاوە فەرامۆش کراون.

**هەڵگەوت: ڕەنگدانەوەی عەشق بەکارەکانتدا دیارە تا چ ئاستێک کاریگەری لەسەر ئەیوبی هونەرمەند وە بیرۆکەکەی کاردەکەیت؟**

**ئەیوب:** ئەگەر عەشقێک نەبوایە لەو باوەڕەدام هەرگیز نەدەبووم بە گۆرانیبێژ، هەرگیز نەم ئەتوانی تەنها دێرێک هۆنراوە بنووسم بۆ گۆرانیەکانم، چەند خۆشە عەشقێکی پاک هەستێکی پاک، چەند یادگاریەکی شیرین ڕۆژانە عەشق بکەیت بە گۆرانی بۆ عاشقان.

**هەڵگەوت: هونەر چییە لە ژیانتاندا بڕچی ڕێژەی هونەرت هەڵبژارد؟**

**ئەیوب:** زۆر زۆر خۆم بەبەختەوەر ئەزانم کە خوای گەورە دەنگ و هەستی هونەری پێبەخشیم من هەر لە منداڵیەوە ویستم ببم بە گۆرانیبێژ، بۆ من زۆر سەخت بوو ئەو خەونە بیهێنمەدی، بەڵام دوای بڕینی چەندین ڕێگەی سەخت، توانیم خەونەکەم بیهێنمەدی، لەلای من، هونەرەکەم وەکو دڵم وایە لەو باوەڕەدام بەبێ هونەر ناژیم، چونکە هەست و خواست و ناخۆشیەکانی ناخم لە ڕێگای گۆرانینەکانمەوە دەردەبڕم، هونەر زۆر پیرۆزەی لای من.

**هەڵگەوت: بێگومان بۆ خۆتان گرێگرتن چ دەنگێک کاریگەرە لەلاتان چ لە کورد یان چ لە نەتەوەکانی دیکە؟**

**ئەیوب:** من گوێ لە زۆربەی هونەرمەندەکانی خۆمان دەگرم هەر هونەرمەندێکی پاک و ڕەسەن هەستم ببزوێنی من گوێی لێ دەگرم چ کوردی یان بە زمانێکی دیکە بێت.

**هەڵگەوت: دوا وتەت بۆ پەیامی کورد؟**

**ئەیوب:** زۆر سوپاس بۆ پەیامی کورد، هیوای بەردەوامی بۆ پەیامی کورد دەخوازم، دەست خۆشی ماندونەبوونی لەیەکەیەکەی ئەندامانی پەیامی کورد دەکەم. ■■■

## پەروانە مەکربازەکان

ئیسماعیل خورماڵی



من وە سوبحی ئەم عیشقەوە ..
دیوانێکم لە قەڵەمی چڵەگیاکان ،
پڕم لەشەونمی عیشق و
پڕم لە شۆخی هەڵاژاو
پڕم لەعیشوەی مانگەشەو
پڕم لەختوکەو لەئاگری درەنگ شەوی
تاقانەدڵدارەکانی ئەودیو دۆزەخ.!
پڕم لە چۆمی ئەوئاوێنانەی ،
هەتاشەویش
پڕن لەمەلەو لەشڵپەی کچان !
من وە بازنەی ئەم عیشقەوە
پڕم لە نێچیر و
پڕم لەجەلادی عاشق
پڕم لە ڕێگەی عەیارو
پڕم ، پڕم
لەدرەختی هەوەس باز و
لەپەروانەی مەکر بازو
پڕم لە خەوی
بەردو
پڕم لە خەیاڵی ئاو !
پڕم لەهەناری خوا هەنار و
پڕم لە ماچ و لەلیمۆی ئێوارە سنگ !
من وە بازنەی ئەم عیشقەوە ..
بە پڕبوونی ئەم هەمووهەسارەیەوە
لەئێوارەی چاخێکی تەڕو
لەکازیوەی چاخێکی عاشق دەچم !
وەلێ یاران ..گەر خوداشبم
گەر ئەوپەڕی دەسەڵاتم لەبن دەست بێ ،
من هەر ئاشقە ڕوتەڵەکەم
مینا جاران ..

هەرلەبەردەم شەکردانیکی ئێوەدا
بۆن کردنی ڕیحانەیەکی ئێوەدا
هەر وەک گوڵی بەر خۆرەتاو ..
بەسەرشان وبەسەرسنگی ،
ئێوەدا لارلار دەبمەوە !
دوورم و لێ عەیاران
هۆکەنیشکەشەرمنەکانی نیشتیمان
من مردنم لەدوورییا گوڵ دەردەکا و
من قەڵەمم لە دوورییا
ڕۆنی عیشقێ وە دەر دەخا
بەشی ئیوە وبەشی نانی هەموو دڵەکان
دەکا !
دوورم و لێ عەیاران
هۆ کەنیشکە شەرمنەکانی نیشتیمان
هەر بەدەمی دووریشتان
من قوربانی دواین یەکتان بم
سێوتان
لەپڕگاڵی ئەم خودایە هەڵدێ و
شەونمتان بە کراسێکی ئاوییەوە ،
بەردەکانی قەراخ چەم هار دەکا و
هەر وەک و شەم ، ئاگر .. ئاگر
لەدێوانەی چڵە گیاکان دەنێ !
دوورم و لێ عەیاران
خەمتان نەبێ
هەتا ئێوەو
بۆڵی سەوزی تڕێم هەبێ
من غەزەڵم بەغەزەڵی دەریا و
کۆشم بە کۆشی جەهەنم و
کوفرم ، کوفرم
بە باسوقی شیرین دەچێ !!

# کتێبەکەی سەرۆکی هەرێم...



حەمە سەعید حەسەن

## ٢

لە ناوەڕاستی ئابی١٩٦٩دا، کە هێرشێکی فیرقەی چوار لە دەڤەری شەمکان تووشی شکان دێت، فەرماندەی فیرقەکە و سەرۆکچاش محیی هەرکی، ئاگر لە ٦٧ ژن و منداڵی هەردوو گوندی دەکان و سۆرایا کە لە ترسی تۆڵەی لەشکر هەڵاتبوون و لە ئەشکەوتێکدا خۆیان حەشاردابوو، بەردەدەن!(١) سەروەختی شەڕی نێوخۆی ڕاپەڕین، تاڵەبانی بۆ شکاندنی شکۆی پارتی، تەنانەت هانای بۆ ئەو سەرۆکجاشە کورد سوتێنەش برد! شیاوی گوتنە هەر ئەم محیی هەرکییە لە بەغدا، لە سەرەتای کانوونی یەکەمی١٩٧٠دا، بە هاوکاریی نازم گزاری بەڕێوەبەری ئاسایشی گشتی، هەوڵی تیرۆرکردنی ئیدریس بارزانیی دا."ل٦٣ب٢"

کە وەفدی بەعس لە یەکەمین ڕۆژی سالی١٩٧٠دا، دێتە ناوپردان، پارتی داوای داماڵینی چەکی هەموو چلکاوخۆران لە سەروو گشتیانەوە، جاشەکانی(LXVI)"*"یان لێ دەکات، حەمماد شەهابی سەرلەشکری بەعس کە سەرۆکی وەفدەکەش دەبێت، ئەو داخوازییە پەسەند ناکات، بەڵام عەبدولخالیق سامەرائی بە وەفدی پارتی دەڵێت: ( ئێمە حیزبێکی شۆڕشگێڕین، ئەوە بارێکی قورسە بە سەر شانمانەوە کە ئەو چلکاوخۆرانە هاوپەیمانمان بن، ئەوەی ناپاکی لە میللەتەکەی خۆی بکات، چاوەڕێی هیچ چاکەیەکی لێ ناکرێت، ئێمە ئەو جاشانەمان بە میرات لە حکوومەتەکانی پێش خۆمانەوە بۆ ماوەتەوە.)"ل٣٠ب٢" پارتی ماوەی وتوێژی نێوان خۆی و بەعس بە هەل دەزانێت و ناوچەگەلی گەرمیان، قەرەداغ، شوان، شێخ بزێنی و دوڵی جافەتی لە جاشەکانی شەست و شەش خاوێن دەکاتەوە."ل٣٦ب٢" سێ ڕۆژ دوای دەرچوونی بەیاننامەی١١ی ئاداری١٩٧٠ کەسێک لە سەر خواستی نەوشیروان مستەفا، نارنجۆکێک فڕێ دەداتە نێو ئاهەنگی قوتابخانەیەکی کچانەوە لە سلێمانی، کەسەکە دەگیرێت و لە سێدارە دەدرێت، وەڵێ نەوشیروان بۆ نەمسا هەڵدێت."ل٥١ب٢" لە کۆبوونەوەکەی ١ی ئۆکتۆبەری١٩٧٠ی سەرکردایەتی پارتیدا، کەمێنەیەک دەخوازن جاشەکانی٦٦ بە تۆمەتی ناپاکی مەزن، بە دادگە بدرێن، بارزانی پێیان دەڵێت: (گومان لەوەدا نییە کە خیانەتەکەیان زۆر گەورە بوو، بەڵام شۆڕش سەرکەوتووە و ئەوان زەبوون بوون، لێبوردنیش لە کاتی بە دەسەڵاتیدا دەبێت."ل٥٩ب٢" پاییزی١٩٧٠ عومەر دەبابە و عەلی عەسکەری بە مەسعود بارزانی دەڵێن: (ئێمە هەقی کەسی ترمان نییە، ڕازی نابین ناوی"جەلالی"مان لێ بنرێت، ئێمە هاتووین بێینەوە ناو پارتی، ئاخر جەلال و ئیبراهیم ئەحمەد هەر چی پارەیەک هەبووە، هەموویان بۆ خۆیان بردووە و جەلال لە یەکێک لە بانکەکانی کوەیتدا بە ناوی خۆیەوە داینراوە."ل٦٠ب٢" دواتر ئیبراهیم ئەحمەد و جەلال تاڵەبانیش دێنە خزمەتی بارزانی و پێی دەڵێن: ( نیشتمانپەروەری و کوردایەتی لای تۆن، ئێمە بە هەڵەدا چووبووین.)"ل٦٠ب٢" کە لە ٢٨ی کانوونی دووەمی١٩٧٠دا، وەفدێکی حکوومەت بە سەرۆکایەتی حەردان تکریتی دێتە ناوپردان و قسە لە سەر پرسی کەرکوک دەکرێت، بارزانی دەڵێت: (ئێمە بە هیچ جۆرێک دەستبەرداری کەرکوک نابین و ئەگەر تەنیا تاکە کوردێکی تێدا بمێنێت، هەر کوردستانە."ل٣٩ب٢" کە لە ٢٩ی ئەیلوولی ١٩٧١دا، بەعس هەوڵی کوشتنی بارزانی دەدات، هەندێک لە سەرکردایەتیی پارتی و شۆڕش داوا دەکەن، پێوەندیی لەگەڵ بەعس بپچڕێنرێت و شەڕ دەستپێ بکرێتەوە، بارزانی دژی ئەو بۆچوونە دەبێت و دەڵێت: (ئەگەر دەست بە شەڕ بکەینەوە با لە پێناوی کەرکوکدا بێت، نەک بە هۆی منەوە.)"ل٧٢ب٢" مێژوو سەلماندی بارزانی وەفای بۆ قسەی خۆی هەبوو، دەستی لە کوردستانییوونی کەرکوک هەڵنەگرت و لە پێناوی کەرکوکدا شەڕی دەستپێ کردەوە.

دربارەی ئەو قەسابخانەیەی بۆ بنەماڵەی فاخیر مێرگەسۆری سازکرا، مەسعود بارزانی دەنووسێت: (ڕژێم توانی ژمارەیەک لە کادیرانی پارتی و شۆڕش بکات بە پیاوی خۆی، لەوانە ئەندامی کۆمیتەی ناوەندی، قارەمانی شەڕی هەندرێن و بەرپرسی لقی سلێمانی، فاخیر مێرگە سۆری. نازم گزار ئەرکی ئەوەی خستبووە سەر شانی فاخیر، پلانێک جێبەجێ بکات کە بۆ پاکتاوکردنی سەرکردایەتی شۆڕش ڕێک خرابوو، ئەویش بە تەقاندنەوەی شوێنی کۆبوونەوەی کۆمیتەی ناوەندی، کاتێک بارزانی خۆیشی لەوێ بێت.)"ل١٠٤ و ل١٠٥ب٢" (جەمیلی بۆ فاخیر جاسووسێکی بۆ عێراق و ئێران دەکرد و نیازی ئەوەی هەبوو، لەسەر خواستی ساواک، عەبدولوەهاب ئەتروشی کە پارێزگاری هەولێر بوو، بکوژێت. حەمەد ئاغای باوکی فاخیر پتر لە١٥ بارزانیی دڵسۆزی کوشتووە.)"ل١٠٦ب٢" ئەگەرچی نووسەر هەردوو بەشەکەی کتێبەکەی بە دەیان بەڵگەی گرنگ دەوڵەمەند کردووە، وەڵێ تاقە بەڵگەیەکی بڵاو نەکردووەتەوە، کە ناپاکیی فاخیر یان جەمیل بسەلمێنێت، ناوی هیچ کام لەو یازدە بارزانییەی نەهێناوە کە گوایە باوکی فاخیر کوشتوونی. ئەگەرچی بەعس توانی هەم عەزیز ئاکرەیی کە ئەندامی مەکتەبی سیاسیی پارتی بوو، هەم عوبەیدوڵلا کە کوڕی بارزانی بوو، بکرێت، وەڵێ مەرج نییە توانای کڕینی فاخیریشی هەبووبێت.

(لە بەغدا، جەلال تاڵەبانی پێی گوتم: (کە چوویتەوە بۆ لای بارزانی پێی بڵێ: فاخیر مێرگەسۆری دەستی لەگەڵ بەعسدا تێکەڵ کردووە.)(٢) ئەمە قسەی فەرەنسۆ حەریریە و تا ڕادەیەکی باش جێی باوەڕە، چونکە:

١ـ فاخیر مێرگەسۆری لە دەڤەرە سۆرانی نشینەکاندا کەسایەتییەکی خۆشەویست و جەماوەری بوو، بەمەش هەڕەشەی لە خەونی داهاتووی تاڵەبانی دەکرد، کە نەیدەخواست لە ئایندەدا کەسێک هەبێت لەو ناوچانە کە ئەو بە هی خۆی دەزانین، ڕکەبەری بێت.

٢ـ ئەو جۆرە زمانلێدان و بۆ هەڵبەستنانە لە تاڵەبانی دەوەشێتەوە. با بەڵگەیەک بهێنینەوە: لە٢٢ ـ ٦ ـ ١٩٧٢ تاڵەبانی لە نامەیەکدا کە بۆ ئیدریس بارزانی و مەسعود بارزانی هەناردووە، دەنووسێت: (سەربەست بامەڕنی پیاوی میرییە، ئەوان ناردوویانە بۆ ناو جیهازی پاراستنی پارتی.)"ل٣٠٢ب٢"

٣ـ تاڵەبانی دەڵێت: (بنەماڵەی بارزانی پیاوی هۆشمەند، زیرەک و بوێری وەک فاخیریان پێ قەبوول نەدەکرا.)(٣) ڕاستە فاخیر مێرگەسۆری کەسایەتییەکی گرنگی نێو شۆڕش و پارتی بوو، وەڵێ پێم وانییە، بنەماڵەی بارزانی ترسی ئەوەیان لێی هەبووبێت کە جێیان پێ لێژ بکات. ئاخر فاخیر لە ئەوپەڕی دەسەڵاتیشیدا خۆی بە پێشمەرگەی بارزانی زانیوە. ئەگەر کەسێک هەبێت لە هۆشمەندی و بوێری فاخیر تۆقیبێت، خۆدی تاڵەبانی بووە، تاڵەبانی چونکە خۆی ئەو هەستەی هەبووە؟ پێی وابووە بنەماڵەی بازانیش هەمان هەستیان هەیە، ئاخر پێشینان گوتەنی: لە دز وایە، هەموو کەس دزە. لە ڕوانگەی مەسعود بارزانییەوە(جەمیل)ی برای فاخیر بۆیە کوژرا، چونکە ئێران بە مەبەستی هەڵگیرساندنەوەی شەڕ، ئەرکی تێکدانی نێوانی شۆڕش و بەعسی پێ سپاردبوو."ل١٠٥ب٢" بەڵام لە دیدی شیوعییەکانەوە، جەمیل تا ١٤ ـ ٢. ١٩٧١ کە ڕۆژی تیرۆرکردنیەتی، هەر ئەندامی حیزبی شیوعیی عێراق بووە. کە سەعید تۆڵەی لە بکوژی جەمیلی برای دەکاتەوە، بارزانی فاخیر و باوکی دەست بە سەر دەکات و دواتر تراژیدیاکە بە قەڵاچۆکردنی حەمەد ئاغا و هەموو کوڕەکانی کۆتایی دێت. شەهێڵ فاخیر مێرگەسۆری دەنووسێت: (لە تەممووزی١٩٧٢ بە دواوە، کەس ئاگای لە فاخیر، سەعید و خەڵۆ برادۆستی نامێنێت و هیشتا کەس نازانێت، کەی و چۆن کۆژران، بەڵام جەمەد ئاغا و کوڕەکانی دیکەی لە٢٢ و ٢٣ی ئاداری١٩٧٥دا، یەکسەر دوای هەرەسی شۆڕشی ئەیلوول بە فەرمانی بنەماڵەی بارزانی دەکوژرێن و لە ئەپریلی هەمان ساڵدا، تەرمەکانیان دەدۆزرێتەوە.)(٨) - من نازانم فاخیر، باوکی و براکانی، لە سۆنگەی چیەوە بە کۆمەڵ کوژران؟ بەڵام ئەوە دەزانم، ئەگەر بەڵگەی حاشاهەڵنەگر لە سەر ناپاکییان هەبووایە، بە ئاشکرا داگایی دەکران. ( لە ٢٢ی شوباتی٢٠٠٥ مەسعود بارزانی پێشوازی لە هەردوو کوڕەکەی فاخیر مێرگەسۆری: ئاراز و هەندرێن، دەکات، ڕەددی ئیتیبار بۆ باوکیان، وەک سەرکردەیەکی شەهیدی پارتی دەگێڕێتەوە و نیگەرانیی خۆی بۆ ئەو ڕووداوە ناخۆشانەی بوونە هۆی لە دەستدانی سەرکردەیەکی وەک فاخیر مێرگەسۆری دەردەبڕێت!)(٩)

(١) مەسعود بارزانی، بارزانی **دڕێژەی هەیە** و بزووتنەوەی ڕزگاریخوازی کورد، شۆڕشی ئەیلوول، بەرگی سێیەم، بەشی دووەم، ل١١ چاپخانەی وەزارەتی پەروەردە٢٠٠٤ هەولێر.(ئیدی وێڕای ئاماژەکردن بۆ لاپەڕەکە، (ب٢)ی ش دەنووسم کە مەبەستم لە بەشی دووەمی کتێبەکەیە. ح.م.ح)

(٢) شەهێڵ فاخیر مێرگەسۆری. لسان الجریمة ینطق، ترجمة: محمد عبدالله١٩٩٨ص٩١ (کتێبەکە ناوی چاپخانە و شوێنی چاپی پێوە نییە)* پێم وایە محەمەد عەبدوڵلا ناوێکی وەهمییە و بنووسی کتێبەکەش، شەهێڵ نییە، نووسەرێکی لێبیاتووە کە هەم شیوعی بووە و هەم لە نزیکەشەوە ئاگاداری شۆڕشی ئەیلوول بووە.

(٣) سەرچاوەی پێشوو. ل٩١

(٨) سەرچاوەی پێشوو. ل٨٨

(٩) سەرۆک بارزانی پێشوازی لە بەرێزان ئاراز فاخیر مێرگەسۆری و هەندرین فاخیر مێرگەسۆری دەکات، خەبات، ژمارە١٧١٧ چوارشەممە٢٣-٢-٢٠٠٥ هەولێر.

* ئەوە شەست و شەشە بە ژمارەی ڕۆمانی نووسیومە.



## درامانووسانی جیهان

مەهدی مجید جاف

## ٣٦ـ شۆن ئۆکیسی Sean O. Casey



درامانووسی بەناوبانگی ئیرلەندی، شۆن ئۆ کیسی لە سالی١٨٨٠دا، لە شاری دوبلین لەدایکبووە. دایک و باوکی ناوی"جان"ی لێدەنێن، پێش ئەم دوو کوڕی تریان بەناوی"جان" لەدەست دەدەن. لە تەمەنی شەش سالیدا دەبێت باوکی دەمرێت و ژیانیان تووشی گیر و گرفت دەبێت. دوو برا گەورەکەی دەچنە سوپای بەریتانی و ڕەوانەی ئەفغانستان دەکرێن بۆ ئەوەی لەوێ دژی دوژمنانی بەریتانی داگیرکەر شەربکەن. خوێندنی سەرەتایی لە دوبلین دەست پێ دەکات و کرداری ناجۆری قەشە وای لێ دەکات کە بە یەکجاری واز لە خوێندن بێنێت و خوێندن و نووسین لای دایکی فێربێت. بە قسەی خۆی شانۆنامە نووسین لە شکسپیر و کۆڵێن و شەڤامەکانی دوبلین فێردەبێت. لەدواپیشدا ناوی شۆن ئۆ کیسی بۆ خۆی هەڵدەبژێرێت. بیماری دایک و هەژاری، ئۆ کیسی ناچاردەکەن کاری جۆراوجۆر بکات، ماوەیەک وەک ڕۆژنامە فرۆش و شاگرد و کرێکار لە هێڵی ئاسن کار دەکات. هێدی هێدیش خۆی بۆ نووسینی تەمەنبییات ئامادە دەکات. ئاشنابوونی لەگەڵ هونەری شانۆدا لە ڕێگەی هاورێیەکیەوە دەبێت کاتێک کە خەریکی ڕێکخستنی شانۆنامەیەک دەبێت، شۆن خواست و ئارەزووی نیشان دەدات و ڕۆڵی ئەکتەرانی ئامادەنەبوو یاری دەکات. لە ساڵی١٨٨٩دا، لەلایەن چەند هونەرمەندێک و ڕۆشنفیکرێکەوە(شانۆ ئەبی) دروست دەکەن ئەم شانۆیە چالاکیەکی نوێ بە بزووتنەوەی هونەری ئیرلەندا دەدات و شۆن پەیوەندیان پێوە دەکات و دەبێتە هاوکاریان. هەر لەو ڕۆژانەدا دەبێت کە خەڵکی ئیرلەندا لە پاش هەشت سەدە دژی داگیرکەری ئینگلیز ڕادەپەڕین، شۆن بە(کۆمەڵەی برایانی کۆماریخوازی) ئیرلەندییەوە پەیوەندی دەکات و لە ساڵی١٩١٣دا، دەچێتە لەشکری نیشتمان پەروەرانی ئیرلەندی و لە دواییدا دەبێتە سەرکردەی ئەو سوپایە. هەر لەو ساڵانەدا دەست بە خوێندنەوەی شانۆنامەکانی شکسپیر دەکات و تامەزرۆی درامانووسی لە بیریدا چەگەرە دەکات. لە ڕاپەڕینی جەژنی"فصح" شۆن لەلایەن سەربازانی ئینگلیزەوە دەستگیردەکرێت و دەکەوێتە بەندیخانەوە، پاش ماوەیەک ئازاد دەکرێت و بێکار دەمێنێتەوە، هەرچۆنێک بێت لە وێستگای هێڵی ئاسن کاری دەست دەکەوێت و لەوڵاشەوە دەست بە نووسین دەکات. ڕووداوەکانی جەژنی"فصح" دەبنە ئیلهام بەخشی چەند لە شانۆنامەکانی، یەکەمین بەرهەمی چەند شانۆنامەیەکی یەک پەردەیی دەبێت کە لە شانۆی کۆشکی ئازادیدا پێشکەش دەکرێن. شانۆنامەی "لە پێستی شێردا" لە ساڵی١٩٢٣دا، لەسەر هەمان شانۆ پێشکەش بە بینەران دەکرێت و سەرکەوتنێکی مەزن بەدەست دەهێنێت و ناوی شۆن دەکەوێتە ناو ناوانەوە. لە ساڵی١٩٢٤دا، گروپی شانۆیی ئەبی شانۆنامەی بەپێز و بەناوبانگی ئۆکیسی بە ناوی"جونۆ و تاوس" لەسەر شانۆ پێشکەش دەکەن. لە ساڵی١٩٢٨دا، شانۆنامەی"جامی زیوین" کە شانۆنامەیەکی ڕەخنەیی و سەبارەت بە شەڕ و چارەنووسیەتی دەنووسێت، گروپی ئەبی ڕازی نابن بە ئامادەکردن و پێشکەشکردنی، ئۆ کیسی دڵی ناسکی دەشکێت و کۆچی یەکجاری بۆ شاری لەندەن دەکات. ئۆ کیسی هونەرمەند و شۆڕشگێڕ دووری لە خاکی نیشتمان بە دووری لە خەڵک تێناگات و هەر وەک خۆی بە ئیرلەندی دەژی و بۆ ئیرلەندای خۆشەویست دەنووسێت. لە شانۆنامەکانی تری ئۆ کیسی:

١ـ شانۆنامەی"لەناو دەرگاکانەوە".
٢ـ شانۆنامەی"تۆزی پرتەقاڵی".
٣ـ شانۆنامەی"ئەستێرە سوور دەبێت".
٤ـ شانۆنامەی"گوڵی سووری من".
٥ـ شانۆنامەی"تەپڵەکانی باوکە ڕوحانییەکە".
٦ـ شانۆنامەی"مانگ لە کایلنا دەدرەوشێتەوە".
٧ـ شانۆنامەی"لە پشت پەردەی سەوزەوە".
٨ـ شانۆنامەی"کەڵەشێری جوان و نەخشین".
٩ـ شانۆنامەی"کۆتایی سەرەتا".
١٠ـ شانۆنامەی"ڕووداوی نیوە شەو".

شۆن ئۆ کیسی کۆڵنەدەر و داهێنەر لە ساڵی١٩٦٤دا، دڵە پڕ میهرەکەی لە لێدان دەوەستێت و ماڵ ئاوایی لە هونەر و ژیان دەکات. ■■■

www.kurdishbook.com

# Serok her Pêşmergeye u Pêşmergeş her Serok Kurdistan be dilsoztirîn serok spêrdra

Nizar Caf

Emey le kudistan rûyda, le her şwênêkî dîkeda bwaye ştêkî asayî debu, lê katêk şwêneke kurdistanbêt, seroke helbijerdrawekeş kesayetiyekî wek mesud barzani bêt, awa aw rûdawe watayekî qulû taybet degrête xoy. Mesud baryani bo satêkîş destberdarî rêbazî pîrozî kurdayetî bêt ke tenha le rêbazî barzanîda berjeste bwew debêt. Herçend barzanî rojî yekşemmey rabirdû wek serokî herm helbijêrdira, lê beşêweyekî fermî wek serokêk bo netewey kurd helbijêrdira. Aw helbijardine ştêkî çawerwankirawbû belam le heman katîşda, rastiyekî mêjiwyî le bizavî rizgarîxiwazî kurdda xisterû, awîş raberîkirdinî gelî kurd be şêweyekî yasayî u dimwkiratyane, herçende gelî kurd hemîşe pilew payeyekî taybetî bo barzanî nemir danawe. Mesud baryani hergîz amade nebwe le nahemwartirîn bar u doxda, milkeçî xiwastwkanî dwjmin nebiwe. Helwêstî jiwamêraney sebaret be kêşey kerkûk negorawe u hemîşe be hêlî swrî danawe. Her behoy am helwêstewebû ke awarekanî kerkûk geranewe şwênî xoyan. herweha sûrbûnî leser pyadekirdinî systemî fîdralî le eraq, her helwêstî am bû hikûmetî eraqî naçar kird carêkî dî, hikûmet swêndxiwardin dûbare bikenewe, leber awey pêştir birgey fîdralî u dimwkratyîan lê labirdibû. Masud Barzanî le salî 1946 u lejêr sayey alay komarî kurdistanda ledayîk biwe, helbijardinî aw bo am poste giringû serkye, hiway netewey kurd bo serbexoyî zîndû dekatewe. Debêt amaje bewe bikeyn ke barzanî pêş awey wek serokî herêm helbijêrdirêt, lelayen serok u siyasetmedaranî cîhanewe wek serok mameley legelda kirawe, aw kareş bo karîzmay xwdî kesayetî masud baryanî degerêtewe. ■■■

# له بارەی نەتەوەی کوردەوە کە بەسەر وڵاتانی دراوسێدا دابەشکراون، برایانمان دڵنیا دەکەینەوە کەوا دڵ و دەروونمان لەگەڵ ئەوان و ئێش و ئازارەکانیاندایە



چ ئەوانەی ئاوارەی وڵاتانی دراوسێ بوون لە کاتی لێقەومان و کارەساتەکان، چ ئەوانەی کە سیاسەتی دڕندانە و زەبروزەنگی رژێم لە ناوخۆی کوردستان ئاوارەی کردوون، هەموویان جێگەی ڕێزی ئێمەن و ئەوانەی نەیانتوانیووە بگەڕێنەوە سەر زێدوولانەی خۆیان دەبێ ئاسانکاریان بۆ بکرێت و یارمەتی بدرێن.

. دەبێ بەرنامەیەکی تێروتەسەل دابنرێت بۆ ئاوەدانکردنەوەی گوندەکانی کوردستان ،وە گەیاندنی خزمەتگوزاری پێویست بۆیان، بۆ بووژانەوەی ئابووریان، ڕژێمی عێراق بە نیازی لێدانی زەبرێکی کاریگەری لە ئابووری کوردستان و لە بزووتنەوەکەمان، هەزاران گوندی لەگەڵ زەویدا تەختکرد و خەڵکەکەی ئاوارەکردن، لەبەر ئەوەی ئەم گوندانە خانە و لانەی پێشمەرگە و شۆڕشەکەمان بوون.

. پێشمەرگەی کوردستان، ئێوە ئازیزترین کەسانی ئێمەن، پێشمەرگە تێکۆشەرانی ڕۆژانی سەخت و ڕۆژانی هات و نەهاتن، منیش پێشمەرگەیەکم وەک ئێوە و شانازی دەکەم کە لە ریزی ئێوەدام، جێگەی ئێوە لە لوتکەدایە و لەناو دڵ و دەروونی میللەت و لە ناو مااڵی شەهیدانە، ئێستاش کە میللەتی کورد پارێزراوە هەر لە سایەی وەرە و عەزیمەتی ئێوەیە، ئێوە بە بڕیاری میللەتی خۆتان و لە ئەنجامی ئێش و ئازاری گەلەکەتان و فرمێسکی شەهیدانەوە دروست بوون، تا گەلی کوردستان مابێت ئێوەش دەمێنن، ڕۆژانێک بوو بەرگریتان لە بوونی مافی میللەتی کورد دەکرد بە خوێنی خۆتان میژووتان دەنووسییەوە، ئێستاش ئێوە هەمان ڕۆڵەی جاران و ناو پلەوپایەتان هەروەک خۆیەتی تەنیا ئەرکتان گۆڕاوە، جاران خەباتتان دەکرد بۆ ڕووخاندنی ڕژێمی دیکتاتۆری و بەدیهێنانی فیدراڵی و دیموکراسی، ئەمڕۆ خەبات دەکەن بۆ پاراستنی ئەم دەسکەوتانە و بۆ دابینکردنی ئەمن و ئاسایش بۆ عێراق و کوردستان.

. لەم سەردەمەدا تیرۆر گەورەترین مەترسیە بۆ سەر ژیانی دیموکراسی و پێشکەوتن، ئێمە لە ڕووبەڕووبوونەوەی تیرۆردا کۆڵ نادەین و یەک سات چیە غافڵ نابین، تیرۆریستان پاشەڕۆژیان لەم وڵاتەدا نییە، دەبێ بە زووییش بەرەنگاریان بینەوە لە ڕەگوڕیشەوە دەریانکێشین، بەاڵم کاری لە بن هێنانی تیرۆر تەنیا کاری یەک دەزگا و یەک دامەزراو نییە، دەبێ هاوواڵتیان و حزبەکان لەگەڵ یەکدا هاوکارین و پشتیوانی لە دامودەزگا ڕەسمییەکان بکەن.

. کێشەی کەرکوک ڕێگەی چارەسەری ڕاستەقینەی خۆی بۆ دەستنیشانکراوە ئەویش ئەوەیە کە لە یاسای کاتی ئیدارەی دەوڵەتدا هاتووە، ئێمە بە چارسەرێکی جیا لەم چارەسەرە ڕازی نابین، ئەمە ڕێککەوتنە و هەموو لایەک ئیمزامان لەسەری کردووە بووە بە یاسا و دەستوور، پێویستە بێ دواخستن جێبەجێ بکرێت و ماددەی ٥٨ مەسەلەیەکی جددیە و بە هیچ شێوەیەک پاشگەزبوونەوەی لێ قبوڵ ناکرێت، بە هەمان شێوە ناوچە دابڕاوەکانی تر دەبێ هەموویان بگەڕێنەوە سەر هەرێمی کوردستان لەبەر ئەوەی خاکی کوردستانە و جیاناکرێتەوە.

. ئەوەی لە یاسای کاتی ئیدارەی دەوڵەتی عێراق هاتووە، لایەنی هەرە کەمی مافەکانی میللەتی کوردە، مومکین نییە ئێمە بە کەمتر لەو مافانە ڕازی بین لە یاسای ناوبراودا هاتوون دەبێ ئەو مافانە وەک خۆیان بچنە ناو دەستووری هەمیشەیی عێراقەوە.

. دەستوور هەنگاوێکی گەورەی و پێویستە هەموو چین و تووێژ و لایەنەکان لە دارشتنیدا بەشدار بن، دەستوور دەبێ بە ڕێککەوتن و تەوافق بێت، بۆ ئەوەی ناسنامەی عێراقی فیدراڵی و دیموکراتی پێوە دیاربێت.

. ئێمە ڕێز لە سەرجەم وڵاتانی دراوسێ دەگرین و دەستی دۆستایەتیان بۆ درێژ دەکەین، هەروەها کاردەکەین بۆ ئەوەی باشترین پەیوەندی ڕێز لەیەک گرتن و دۆستایەتی دابمەزرێنین، ئەمە هەل و دەرفەتێکی باشە، داوا دەکەین ئەوانیش هاوکاربن بۆ عێراق و بۆ هەرێمی کوردستان، ئێمە دەست لە کاروباری ناوخۆی ئەوان وەرنادەین، ئومێدەوارین ئەوانیش دەست لە کاروباری ناوخۆی ئێمە وەرنەدەن، ئێمە سوپاسی ئەو دراوسێیانە دەکەین کە لەکاتی لێقەومان و کارەساتدا باوەشیان بۆ میللەتی ئێمە کردەوە و دەستی یارمەتیان بۆ درێژ کردین.

. لە بارەی نەتەوەی کوردەوە کە بەسەر وڵاتانی دراوسێدا دابەشکراون، برایانمان دڵنیا دەکەینەوە کە وا دڵ و دەروونمان لەگەڵ ئەوان و ئێش و ئازارەکانیاندایە هیوادارین پەنا بۆ شێوازی هاوسەردەمانە ببەن بۆ داواکردنی مافەکانیان، ئەمڕۆ باوی زەبرو زەنگ نەماوە و ئەمە بۆ کورد تەنیا زەرەر و ماڵوێرانی بەدواوەیە، بەهەمان شێوە هیوادارین ئەو وڵاتانە گوێ لە داوای براکانمان بگرن و دیالۆگیان لەگەڵدا بکەن.

هیوادارم ئەو بڕوا و متمانەی بەمن دراوە بێتە مایەی یەکڕیزی و یەک هەڵوێستی میللەتەکەمان، ڕاستیان پێ بڵێم بۆمن پێشمەرگایەتی لە هەموو پایەو پلەیەک گرنگتر و پیرۆزترە.

بەاڵم ئەمڕۆ ئێمە خەریکی دانانی دامەزراوەین، سەرۆکی هەرێمیش دامەزراوەیەکی تری لە کوردستان، شانازییەکی گەورە دەبێ بۆم کە ڕۆڵێکی متەوازیع بۆ خزمەتی ئێوە بگێڕم.

بێگومان دەبێ ئێمە زۆر بە جددییەتەوە بەرەو دامەزراندنی موئەسەساتی دەستووری و یاسایی بڕۆین و لە ئەولەویاتی کارەکانی ئێمەدا بێت، لەگەڵ لەبەرچاوگرتنی ئیلتزاماتی کۆمەاڵیەتی و شۆڕشگێڕی لەاڵیەک، پێویستی دامەزراندنی ئیدارەکی هاوچەرخ و یاسایی و دەستووری. لە اڵیەکی تردەوە.

من خۆم پەروەردەی قوتابخانەیەکم، هەر کە چاوم کراوەتەوە لەوە تێگەیشتووم بەرخودان تاکە ڕێگەیە بۆ ژیان، هەرکاتێک زنجیرێکم بینیبێ، زنجیر و کۆتی دەست وپێی تێکۆشەرێکم هاتۆتەوە بیر، هەر کاتێک پەتێکم بینیبێ، قەنارەی قارەمانێکی لە سێدارە دراوم بیرکەوتۆتەوە، هەر ڕووبارێکم بینیبێ ڕووباری ئاراسم هاتۆتەوە بیر کە پێشمەرگەی کوردستان خۆی لێداوە.

ئەو ڕۆژەی کە بووم بەپێشمەرگە و لەدوای بارزانی نەمرەوە چەکم هەڵگرت وا دەزانم گەورەترین شانازیم بەرکەوت، کە ئەم پۆستەش وەردەگرم بۆ ئەوەمە خزمەتێکی ئێوە بکەم، ئەمەش هەر دریژەپێدانی پێشمەرگایەتییە بۆ من، ئەگەر بۆ خزمەتی ئێوە نەبێ، هیچ مەبەستی ترم نییە، لەم ڕۆژانەدا دەست دەکرێت بە پێکەوەنانی حکومەتی هەرێمی کوردستان، هەندێک چار بەهۆی بیروباوەڕگۆڕینەوە و دەنگ بە ئەنجام گەیشتنی کارەکان دوا دەکەوێن، ئەمەش سروشتی ژیانی دیموکراسییەتە، ناحەزان خەون دەبینن پێیان وایە کاتی بەیەک گەیشتن دوا دەکەوێت، ئێتر ئێمە لێک ترازاوین، بەاڵم با دڵنیابن جارێکی دیکە ئەو خەونانە ناباتەوە بۆ ئێمە قەناعەت و بڕوای میللەتی ئێمە گرنگە، دڵنیاشین هەموو شتێک بەڕاوێژ و گۆڕینەوەی بۆچوون دەبێت لەگەڵ برای بەڕێزم جەنابی مام جەاڵل، وە نەبێ ئەو لە بەغدا و من لێرە ئاگامان لەیەکتر نەبێت، بە پێچەوانەوە ئێمە بەبێ یەکتر هەنگاو نانێین، هەروەها سەرکردایەتی هەردوو حزبیش دەبێ لە یەکەوە نزیک بن، هاوئاهەنگییان لەگەڵ حزبەکانی دیکەدا هەبێ، دەبێ نەشهێڵین جارێکی دیکە دەستی چەپەڵ بخرێتە ئەو نێوانە و مااڵی کورد تێکبداتەوە.

ئێمە وەک میللەتی کورد سوپاسی سەرۆکی ئەمەریکا جۆرج بۆش و ئیدارە و گەل و سوپای ئەمەریکا دەکەین کە لەگەڵ میللەتی ئێمەدا بوون بۆ ڕووخاندن و ڕزگاربوونی لە دڕندەترین ڕژێمی دیکتاتۆری، ئێمە هەرگیز ئەم بڕیارە بوێرانەیەی ئەوان لە بیرناکەین، دووپاتیشی دەکەینەوە کە هەر بەیەکەوە دەبین لە ڕووبەڕووبوونەوەی تیرۆر و لە دروستکردنی عێراقی فیدراڵ و دیموکراتی.

هەروەها سوپاسی سەرۆک وەزیرانی بەریتانیا بەڕێز تۆنی بلێر و گەلی بەریتانیا و سوپاسی وڵاتانی هاوپەیمانی دەکەین.

لێرەدا حەزدەکەم سوپاسێکی گەرمی خەڵکی تێکۆشەری هەولێریش بکەم، هەولێری دێرین و دیکتاتۆر بەزێن، هەولێر بەردەوام لە قوربانیدان و تەحەمولێکی زۆرپشی هەیە، سەرەڕای ئەمەش زۆرجار ئیجراتاتی ئەمنی و ڕێگاوبان گرتن دەبێ سەرباری گرفت و زەحمەتی بۆیان، من سوپاسییان دەکەم و داوای لێبوردنیان لێدەکەم.

لە کۆتاییدا، گەرمترین سڵاو بۆ گیانی شەهیدانی ڕێگای ڕزگاری و ئازادی عێراق و کوردستان.

بژی عێراقی فیدراڵ و دیموکرات

بژی برایەتی کورد و عەرەب

بژی برایەتی کورد و عەرەب و تورکمان و کلد و ئاشور ■■■

## بارزانی وەک سەرۆکی هەرێم سوێندی یاسایی خوارد

**هەولێر: نامق مەورامی – سلیمان یاسین** - بەڕێز مەسعود مستەفا بارزانی ڕۆژی سێشەممە ٢٠٠٥/٦/١٤، لەبەردەم پەرلەمانی کوردستاندا وەک یەکەمین سەرۆکی هەرێمی کوردستان سوێندی یاسایی خوارد.

بەم شێوەیەش، بۆ یەکەمین جار لە میژوودا، دوو سەرکردەی کورد سەرۆکایەتی هەرێمێک لە کۆماری عێراق و هەرێمی کوردستانیان گرتە دەست. هاوواڵتیانی کوردستان، لەگەڵ تەواوبوونی خوێندنەوەی دەقی سوێندەکەدا لەاڵیەن بەڕێز بارزانییەوە، ڕۆژانە سەر شەقامەکان و ئاهەنگی خۆشییان گێڕا.

مەراسیمی سوێندخواردنەکە لە کاتژمێر یەک بەکاتی کوردستان بە خوێندنەوەی قورئانی پیرۆز دەستی پێکرد و پاشان ئامادەبووان دەقیقەیەک بۆ گیانی پاکی شەهیدان بە بێدەنگیی ڕاوەستان.

بەڕێز عەدنان موفتی سەرۆکی پەرلەمانی کوردستان بە وتەیەکی کورت دەستپێکردنی دانیشتنەکەی ڕاگەیاند و پاشان بەڕێز مەسعود بارزانی بۆ خواردنی سوێندی دەستووری لەبەردەم ئەندامانی پەرلەمانی کوردستاندا بانگهێشت کرا و بە تەواوبوونی سوێندەکە، ئامادەبووانی ئەو دانیشتنە و میوانان، هۆڵی پەرلەمانیان پر لە دەنگی چەپڵە کرد.

ژمارەیەکی زۆری میوانانی کورد و عەرەب و بیانی بانگهێشتی ئەو دانیشتنە کرابوون و لەو مەراسیمەدا ئامادەبوون . جگە لە سەرکردە و نوێنەرانی حزبە کوردستانییەکان لە هەموو پارچەکانی کوردستان، سەرکردە و نوێنەری حزبە عێراقییەکان، نوێنەرانی هەریەک لە باڵیۆزخانەکانی ئەمریکا و بەریتانیا و چەند وڵاتێکی دیکە، بەڕێز جەاڵل تاڵەبانی سەرۆک کۆماری عێراق، حاجم ئەلحەسەنی سەرۆکی پەرلەمانی عێراق، عادل عەبدولمەهدی جێگری سەرۆک کۆماری عێراق و ئەحمەد چەلەبی جێگری سەرۆک وەزیرانی عێراق و ئەشرەف قازی نوێنەری ئەمینداری گشتیی نەتەوەیەکگرتووەکان و ژمارەیەکی زۆر لە کەسایەتییە سیاسییە عێراقییەکان لەو مەراسیمەدا بەشداربوون.

بەڕێز سەرۆک کۆماری عێراق و دوابەدوای ئەویش سەرۆکی پەرلەمانی عێراق و ئینجا عادل عەبدولمەهدی، بەڕێز ئەحمەد چەلەبی، نوێنەرانی ئەمریکا و بەریتانیا وتاری خۆیان پێشکەش کرد و تیکڕا خۆشحاڵیی خۆیان بەو ڕووداوە میژوویییە دەربڕی و پیرۆزبایی خۆیان ئاراستەی گەلی کوردستان کرد.

پاشان بەڕێز مەسعود بارزانی وتەیەکی پێشکەشی میوانان و ئامادەبووان کرد■■■

www.kurdistan.org

### وتاری مەسعود بارزانی سەرۆکی کوردستان

# هیوادارم ئەو بڕوا و متمانەی بەمن دراوە ببێتە مایەی یەکڕیزی و یەک هەڵوێستی میللەتەکەمان



بەناوی خوای مەزن و دلۆڤان
بڕای بەڕێز جەنابی مام جەلال سەرکۆماری عێراقی فیدراڵ
برایانی بەڕێز جێگرانی سەرکۆمار
برای بەڕێز د. حاجم ئەلحەسەنی سەرۆکی پەرلەمانی فیدراڵی عێراق
برایان، خوشکان، سەرکردەکان و نوێنەرانی حزبە هاوپەیمانەکان
بەڕێز باڵیۆزانی وڵاتانی دۆست
برای بەڕێز سەرۆکی پەرلەمانی کوردستان
ئەندامانی پەرلەمانی کوردستان
ئامادەبووانی بەڕێز

سڵاوتان لێ بێت و بەخێرهاتنێکی گەرمی هەموولایەکتان دەکەم بۆ ئامادەبوون و بەشداریتان لەم بۆنەیەدا، خۆشحاڵییەکی گەورەیە بۆ من کە وەکو پێشمەرگەیەک لەلایەن ڕۆڵەکانی میللەتەکەم لە ڕێگەی پەرلەمانی هەڵبژێردراوی خۆیانەوە، ڕاسپێردراوم بۆ وەرگرتنی ئەم ئەرکە و هەڵگرتنی ئەم بەرپرسیاریەتییە، من ئەم فەرمان و تەکلیفەی گەلی کوردستان، بە خەڵات و پاداشت دەزانم بۆ هەموو پێشمەرگە و تێکۆشەرانی گەلەکەمان، لەو ڕۆژەی بەر لە ٣٤ ساڵ کە بۆ یەکەم جار چەکی پێشمەرگایەتیم کردە شان و هەتا ئەمڕۆ، زۆر لە هەوراز و نشێوەکانی شۆڕشی کوردستان و گەلێک ژیانی تاڵ و سوێر و کوڵەمەرگی میللەتی خۆمم بینی، بەڵام بۆ یەک ڕۆژیش گومانم نەبووە کە ئەم میللەتە هەر سەردەکەوێت، خۆشحاڵم کە ئەمڕۆ لەگەڵ ئێوەدام و بەرهەمی ئەم ڕەنج و خەباتە نەپساوەیە بە چاو دەبینم، ئەوەی کە زۆر خەمبارم دەکات و گیانم ئازار دەدات ئەوەیە، زۆر لەو دۆست و هەڤاڵ و پێشمەرگانەی پێکەوە بووین و گەرمی و سارديمان بەش دەکرد، لەم کاروانە پڕ سەروەریەدا گیانیان لە دەستدا و شەهیدبوون. بەداخەوە ئەوان ئەم ڕۆژەیان نەبینی، ئەمڕۆ گیانی ئەوان بەسەرمانەوە دەسوڕێتەوە و ئەوان تەنیا بە جەستە نەماون، ئەگینا هەمیشە بە ڕوح لەگەڵ ئێمەدان و لەم شادیەشدا بەشداریمان دەکەن، دڵنیام گیانی سەرکردە نەمرەکانیشمان ئەمڕۆ بەم سەرکەوتنانە شادن. ئەم پەرلەمانە دامەزراوێکە، جێگەی متمانە و ڕێزلێگرتنی هەموو لایەکمانە، نیشانەی خواست ویستی ڕەوای میللەتەکەمانە، ئەم دامەزراوە بە دەنگی ئەوان هاتۆتە کایەوە و ڕەنگی ئەوانە، ئەمە بەرهەمی خوێنی شەهید و خەباتی پێشمەرگە و قوربانیانی ئەنفال و کیمیاپارانە، بەرهەنجامی یەکڕیزی و یەک هەڵوێستیی میللەتەکەمانە بەتایبەتی هەردوو حزبی تێکۆشەر یەکێتی نیشتمانی کوردستان و پارتی دیموکراتی کوردستان.

هەر لێرەدا گەرمترین سڵاو ئاراستەی سەرجەم گەلی کوردستان بە گشتی دەکەم، چ لەسەر خاکی کوردستان بن یان لە دەرەوەی کوردستان بن، بەتایبەتی سڵاوی گەرمم ئاراستەی پێشمەرگەی کوردستان دەکەم کە سەر بە هەر لایەنێکی سیاسی بن، پارێزەری شەرەفی کورد بوون و کوڕی ڕۆژانی سەخت بوون، هەروەها سڵاو ئاراستەی ئەندام و دۆست و هەڤاڵانی پارتی و یەکێتی و سەرجەم لایەنەکانیتر دەکەم، ئەم دەسکەوتەی ئەمڕۆ بەدیهاتووە بەرهەمی تێکۆشانی هەموویانە بەبێ جیاوازی. دەبێ هەموشیان لە پاراستن و بەرەوپێشبردنی ئەم دەسکەوتە بەشداری بکەن و بە هەموشتان دەڵێم ئێوە هەموتان بۆ خۆشەویستی منن، با هەموو لایەک بەخۆماندا بچینەوە و لاپەڕەیەکی نوێ بکەینەوە کە لاپەڕەی تەبایی و برایەتی و یەکبوون بێت، ئەوەی چووە ئیتر ناگەڕێتەوە، با هەر بڕینێک کە لە دڵدا ماوە ساڕێژی بکەین و بەسەر هەموو گرێ دەروونییەکاندا باز بدەین پێویستە لەمڕۆ بەدواوە هاوڕێشی لە کەموکرتییەکانی دوێنێ بکەین و ئاوڕی دواوە نەدەینەوە و، دەبێ بەرەو لووتکەی سەرکەوتن و ئاسۆیەکی گەشتر ڕێگە بگرین.

دەبێ لەمەولا بەرەو بەهێزکردنی بیری نەتەوایەتی و پەرەپێدانی گیانی دیموکراسی لە کۆمەڵگەی کوردستان هەنگاو بنێین، دەبێ خۆمان لە حزبایەتی تەسک و بەرچاوتەنگی و ململانێی بێ ئەنجام بە دوور بگرین و هەڵسووکەوتی ئەو ڕۆژانە دووبارە نەکەینەوە کە بریتی میللەتەکەمان دەخەنەوە ئێش و ئازار.

ئێمە وەکو کورد میللەتێکی سەربەرزین، کە خەباتەکەمان هیچ ڕۆژێک نەپساوە و هیچ کارەساتێکیش ئێمەی سارد نەکردەوە و ماندووی نەکردین، لە ڕۆژی دەستپێکردنی شۆڕشی ئەیلوولەوە دروشمەکانمان ئاشکرا و بێ پێچ و پەنا بوون کە دیموکراسی بۆ عێراق و ئۆتۆنۆمی بۆ کوردستان بووە، ئەم دروشمە زیندووە نیشانەی حیکمەت و دووربینی و هەڵسەنگاندنی واقیعیانەی سەرکردایەتی شۆڕشی کورد بوو لە بارەی بارودۆخی بزووتنەوەکەمان و ڕەوشی عێراق و ناوچەکە.

ئەمڕۆش کە ئەم دروشمە بە عێراقی فیدراڵی دیموکراسی، سەرچاوەکەی هەمان بیرکردنەوە و هەڵسەنگاندنی واقیعبینانەیە، لەبەر ئەوەی پرسی مافەکانی میللەتی کورد و پرسی دیموکراسی لە عێراق، دوو پرسی گرێدراوی یەکترن و جیاناکرێنەوە، ڕژێمە یەک لە دوایەکەکان زۆریان هەوڵدا شەڕی داسەپاوی خۆیان بەسەر کورد و بەرگری و بەرخودانی ئێمە بکەن، بە ململانێ و شەڕی نێوان دوو نەتەوەی عەرەب و کورد، لەبەر ئەوەی ئامانجەکانیان چەپەڵ و گڵاوبوون هیچی لێ شین نەبوو، بە پێچەوانەوە زۆر لە تێکۆشەرانی عەرەب هاو خەبات و هاوسەنگەری ئێمە بوون لەم بزووتنەوە دیموکراسیە و لەم کاروانی خەباتەدا، ئەوانیش لە تەنیشت ئێمەوە قوربانی و ڕەنجێکی زۆریان پێشکەشکردوو، زۆرییشیان گیانیان پێشکەشکرد.

واتە ئەمڕۆش لەگەڵ ئەم هەڤاڵ و تێکۆشەرانە لە هەمان کاروانی خەباتدایین، ئەگەر دوێنێ لە سەنگەری دژ بە دیکتاتۆریەت بووین، وا ئەمڕۆ لە گۆڕەپانی کارکردنین بۆ بەدیهێنانی فیدراڵیزم و دیموکراسی پێکەوەیین.

لە داهاتووی عێراقیشدا هیچ پیلان و نەخشەیەک بۆ کەلەبەر خستنە ئەم دوو گەلە چەوساوەیە سەرناگرێت و ئەو برایەتیەی بە ئەرک و ماندووبوون پاراستوومانە، دەبێ بە بەردی بناغەی پاشەڕۆژی گەش بزمان.

ئەمڕۆکە لە سەرانسەری عێراقدا شۆبنەواری کارەساتی دڕندایەتی ڕژێمی بەعس و ڕژێمەکانی پێش ئەویش دیار و بەرچاون، لە گۆڕستانە بە کۆمەڵکاندا ئیسکەکان بەیەکەوە نێژراون، ئەمە دەرفەتێکی زێڕینە بۆ ئەوەی سوود لە هەڵەکان و هەوڵە پووچەکانی ڕژێمەکان وەربگرین و داهاتوویەکی گەش لەسەر بناغەی برایەتی و یەکسانی لەم وڵاتە ئاوا بکەین و، بیر لە شتی تر نەکرێتەوە، گەلی عێراق بە هەموو ڕەنگ و ڕەگەزەکانییەوە دووچاری شەڕی برینەوە و جینۆساید هاتبوو، ئەمڕۆ کاتی ئاوەدان بکرێتەوە، وڵاتێک کە مافەکانی مرۆڤی تێدا پارێزراو بێت.

ئێمە وەکو کورد شانازیش بەوە دەکەین، کە بە درێژایی میژووی شۆڕشەکەمان لە کوردستانی عێراق، هیچ ڕۆژێک پەنامان بۆ تیرۆر نەبردووە و بیریشمان لێ نەکردۆتەوە، هەرچەندە ڕژێمی عێراق لە سەرەتای شۆڕشی ئەیلوولەوە بە تیرۆر لە بەرامبەری ئێمە دەستی پێکرد و هەتا ئەخیریش دەستی لێ هەڵنەگرت، هەر درێژەی پێدا تا گەیاندنی بە دڕندایەتی ترین شێوەی تیرۆر، ئەوە بوو لوتکەی کارە دڕندەکانی وەک ئەنفالەکانی ساڵی 1988 و ئەنفالی فەیلیەکان و ئەنفالی بارزانییەکان و کیمیاباران و تاوانە گەورەکەی هەڵەبجەی ئەنجامدا.

ئێستاش کاتی ئەوەیە لەسەر بنچینەی فیدراڵیزم و دیموکراسی و فرەلایەنی عێراقی نوێ دروست بکرێتەوە کە تێیدا یاسا سەروەر بێت، دەبێ عێراقی تازە لەسەر بنچینەی پێکەوەژیانی ئارەزوومەندانەی هەردوو نەتەوەی سەرەکی کورد و عەرەب دابمەزرێتەوە، هەموو هاوواڵتییەکی عێراقی سەر بە هەر ڕەگەز و ئایین و مەزهەب و تائیفەیەک بێت، هەست بکات ئەو وڵاتە وڵاتی خۆیەتی و ئەرک و مافەکانی دیارە.

ئێمە قوربانی زۆرمان داوە بۆ بەدیهێنانی ئەم ئامانجانە و هەتا دوایش هەر خەبات دەکەین دەبێ لەم وڵاتە ئەمن و ئاسایش هەبێت و سەروماڵ و حورمەتی خەڵک پارێزراوبێت و دەبێ عێراق شوێنی شایستەی خۆی لە کۆڕ و کۆمەڵگە نێودەوڵەتی و هەرێمییەکاندا وەربگرێت. ئێمە پشتگیری تەواو پێشکەش دەکەین بۆ بەدیهێنانی ئەم پاشەڕۆژە و هەر حکوومەتێکیش پابەندی ئەم ڕێبازە بێت، ئێمە پشتیوانی لێدەکەین و لەگەڵیدا دەبین.

بەرنامەی داهاتووی سەرۆکی کوردستان

لە ڕۆژانی داهاتوو حکوومەتی نوێی هەرێمی کوردستان پێکدەهێنرێت و متمانەی خۆی لە پەرلەمان وەردەگرێت، ئەم حکوومەتە تازەیە حکوومەتێکی یەکگرتووی بنکە فراوان دەبێت ئەرکەکانیش زۆر ئاڵۆزن، دەبێ هەموو لایەک هاوکاربین بۆ سەرکەوتنی ئەم حکوومەتە لە کاروبەرنامەکانیدا.

. دەبێ ژێرخانی کوردستان سەر لەنوێ بونیادبنرێتەوە و، ئەو ژێرخانەی کە ڕژێمی عێراق لە هەموو ڕوویەکەوە وێران و کاولی کردبوو.

. دەبێ کوردستان ببووژێتەوە و بە ڕێگەوبانی پێشکەوتوو، هەروەها دەبێ پڕستە و گەیاندن هاوسەردەمانە لە کوردستان دابمەزرێت.

. دەبێ خزمەتگوزارییەکانی ئاو و وزەی کارەبا بگەن بە هەموو شوێنێک و ئەو کەموکورتیانەی لەم بارەوە هەیە، دەبێ بە زووترین کات چارەسەر بکرێن.

. دەبێ قوتابخانە و بنکەی تەندروستی لە هەموو ئاواییەکی نزیک و دوور بکرێتەوە، پێویستە باشترین سیستەمی تەندروستی لە کوردستان بکەوێتە کار.

. دەبێ سیستەمی پەروەردە چاکبکرێتەوە و پاکبکرێتەوە لە شوێنەوارەکانی بەعس، پەروەردە بناغەی هەموو کارەکانی دیکەی داهاتوومانە.

. بەعس زۆر کاری کردووە بۆ شێواندنی بیرکردنەوە و ئەقڵیەتی ئێمە، دەبێ بە زووترین کات ئەم ئاسەوارە گەندەڵ و نامرۆڤانەیە بسڕێتەوە.

. زانکۆ و پەیمانگاکان و خوێندنی باڵ زۆرترین بایەخیان پێبدرێت، پێویستە زانکۆکانی کوردستان هیچ کەمتر نەبن لە زانکۆکانی ناوچەکە، دەبێ ببن بە ناوەندی تیشکدانەوەی شارستانییەت و دیموکراسی و، ڕۆڵیان لە کۆمەڵگەی کوردستاندا قووڵ و بەرچاوبێت و، پەیوەندی و تێکەڵاوێەکی فراوان لەگەڵ زانکۆ و دامەزراوە زانستییەکانی جیهان دابمەزرێنن.

. دەبێ چاکسازی لە دامودەزگاکاندا بکرێت، هەموو جۆرەکانی گەندەڵی بنەبڕ بکرێت.

. دەبێ دادپەروەری خزمەتگوزارییەکان و بە دەنگەوەچوونی داوا و خواستەکانی خەڵک هەبێت و، پێویستەکانیان بە زووییی جێبەجێ بکرێت.

ە دەبێ بەرنامەی ڕیکوپێک و تێروتەسەل دابنرێت بۆ پەرەپێدانی ئابووری هەرێمی کوردستان و چالاکییە بازرگانییەکان و پێویستە دەرفەتی کارکردن زۆر بکرێت و نابێ خەڵکی بێ کار لەم وڵاتە دەوڵەمەندەدا بمێنێت، گەلێکی خۆشگوزەران و خۆش بژێو دەتوانێ پاشەڕۆژێکی گەش بۆ خۆی بنیات بنێت.

. پێویستە میللەتی ئێمە، میللەتێکی بەرهەمهێن بێت نەک میللەتێکی بەکارهێن و مشەخۆر، مرۆڤی کورد مرۆڤێکی چالاکە و پێویستە بەهێزی بازوو و هێزی بیرکردنەوەی خۆی بژی، بۆ ئەم مەبەستەش دەبێ کارگە و فابریک لە هەموو شوێنێکی کوردستان دابمەزرێت و بایەخ بە بەرهەمهێنانی پیشەسازی بدرێت بایەخ بە کەرتی کشتوکاڵ و کەرتی گەشتوگوزار بدرێ و ببن بە دوو بواری زیندووی ئابووری و گەشەپێدانی وڵاتەکەمان.

. دەبێ ئابووری کوردستان لە سەر بناغەی بازاڕی ئازاد بونیاد بنرێتەوە و بایەخ بە کەرتی تایبەتی و پرۆژەی هاوبەش بدرێت و حکوومەت هەموو جۆرە یارمەتییەکیان پێشکەش بکات و ئاسانکاری و پاڵپشتیان بۆ مسۆگەر بکات.

. لە کوردستاندا ڕێز لە ئازادییەکان دەگیرێت، چ ئازادییەکانی تاک بن، چ ئازادی کۆمەڵ و گرووپەکان، هەموویان لە چوارچێوەی یاسادا ڕێزلێگیراو دەبن، ڕێز لە بیروبۆچوونی خەڵک دەگیرێت و باوەری ئایینی ئازادە و هیوادارم بتوانین بەهێزترین متمانە لە نێوان گەل و حکوومەتی هەرێمدا دروست بکەین، ئەم متمانە بە پێشکەوتن و سەرکەوتنی هەردوو لایان مسۆگەر دەکات.

. دەبێ بایەخێکی تەواو بە لاوان و قوتابیان بدرێت و پرۆژەی پێویستیان بۆ جێبەجێ بکرێت و ڕێز لە ئارەزوو خواستەکانیان بگرێت، هەروەها دەبێ دەرفەتی کاری شیاو و گونجاو بۆ لاوان دەستەبەر بکرێت.

. ئافرەتان ڕۆڵی شیاوی خۆیان لە هەموو بوارەکانی کۆمەڵگەدا بگێڕن و هیچ جیاوازییەکی یاسایی لەم بوارەدا نەمێنێ، دەبێ ژنان خۆشیان خەبات بکەن بۆ گۆڕینی ڕەوشی خۆیان لە کۆمەڵگەدا، ئێمەش هەموو پاڵپشتییەکیان دەکەین.

. ڕێز لە ئایینی پیرۆزی ئیسلام و داب ونەریتە نەتەوەییەکان دەگیرێت، هەروەها ڕێز لە پیاوانی ئایینی و هەموو ئەو کەسایەتییە کۆمەڵایەتییانە دەگیرێت، کە هەر کەسە و دەیەوێت لە شوێنی خۆیەوە خزمەتی کۆمەڵی کوردەواری و ئەم ڕەوشە تازەیە بکات و ڕۆڵی خۆی تێدا ببینێت.

. لێرەدا دووپاتی دەکەمەوە کە ڕێز لە ئازادی کارکردن و ئازادی نواندنی چالاکی سیاسی حزب و لایەنەکانی کوردستان دەگیرێت و بڕچوون و پێشنیازەکانیان ڕەچاو دەکرێن و لەبەرچاو دەگیرێن.

. لە کوردستاندا ڕاگەیاندن بە هەموو شوێنەکانیەوە ئازادە و سانزری لەسەر نییە.

. لە هەرێمی کوردستاندا جیاوازی نەتەوەیی نییە، هەموو هاوواڵتیان ڕەگەز و نەتەوەیان هەرچییەک بێت وەک یەکن لە ئەرک و مافەکانیاندا.

تورکمان و کلدوئاشووری برای ڕێزداری ئێمەن هەرچییەکی لەتوانا و دەسەڵاتدا هەبێت لە پێناو بەختەوەری ئەواندا دەیکەین و هەموومان لەسەر ئەم خاکە پێکەوە دەژین و چارەنووسی و خۆشی و ناخۆشیمان هاوبەشە خۆشمان بە داکۆکیکار و بەرگریکار لە مافەکانی ئەوان دەزانین.

.هەموو ئایین و مەزهەبە جیاجیاکان ڕێزیان لێ دەگرێت و لە کوردستاندا ئازادی خۆیان هەیە و بەیەک چاو سەیر دەکرێن.

. برا یەزیدیەکانمان کوردی ڕەسەنن، بێ دڕیغیش بەشداریان لە خەباتی نەتەوەکەیاندا کردووە و شوێن و جێگەیان لەناو دڵی میللەتی کورددا گرتووە و گەورەترین پلەو ڕێزیان هەیە.

. برا فەیلیەکانمان لە خەباتی دژێخایەنی میللەتی خۆیاندا گەورەترین زەبروزیانیان لەلایەن ڕژێمی بەعسەوە بەرکەوت، ئێش و ئازارێکی بێ وێنەیان چەشت دەبێ بە باشترین شێوە قەرەبوو بکرێتەوە و ڕۆڵی خۆیان لە کۆمەڵگەدا بگێڕن و خەباتی نەتەوەکەیان هاتۆتە بەرهەم، دەبێ ئەوان لە مافەکانی خۆیان بەهرەدارین.

.کەسوکاری قوربانییەکانی ئەنفالی گەرمیان و قەرەداغ و بادینان و دەشتی کۆیە و ئەنفالی بارزانییەکان و کارەساتەکانی کیمیاباران و دەرکراوەکان هەموویان جێگەی ڕێز و تەقدیرن و پێویستە ئاسەوارەی ئەو کارەساتانە لە ژیانیان بسڕینەوە و هاوکاری بکرێن.

. ئاوارەکان زەرەوزیانێکی زۆریان بەرکەوت و قوربانیەکی بێ وێنەیان دا،

PEYAMÎ kurd

Jemar 41 | Sal 1 | 17.06.2005

Rojnameyekî heftaney gştiye

## Sarokî Harêmî Kurdistan :

# Min ew ferman u taklife be Padaşit dezanim

Laparrey 2



## Benawî Xiway bexşindew mihreban Min Mese'ud Mistefa Barzanî, swêndbê be Yazdanî mezin ke mafu destkewtu yekêtîw berjewendyekanî hawilatyanî herêmî Kurdistan biparêzim u be rasitgoyî u dilsozyewe erkekanî serşanim cêbecê bikem

Nizar Caf

**Serok her Pêşmergeye u Pêşmergeş her Serok. Kurdistan be dilsoztirîn serok spêrdra**

Laparrey 3

زاهید شاعیری ـ سویس

**بۆچی ڕێژیمی تورکیا هێندە پێداداگریێ لەسەر:**

**تێوەگلانی هێزی سەربازی ئامریکا و عێراق و هێزی پێشمەرگەی کوردستان لە شەڕ بەدژی گەریلاکانی کۆنگرەی گەل (پ ک ک) ی پێشوو؟**

لاپەڕەی ٦

**لە کۆنفرانسێکدا لە بارەگای UN لە جنێف**

**شاندی کوردەکانی خۆرئاوای کوردستان، دەنگی حەقخوازانەی کوردیان بەرزکردەوە**

